



**K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**JI HÊLA NAVEROKÊ VE DAHÛRÎNA ÇÎROKÊN MELA
MEHMÛDE BAZÎDÎ**

**Evin BİLGE
10711013**

**ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. Abdurrahman ADAK**

MÊRDÎN – 2013



T.C
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ BÖLÜMÜ

Yüksek Lisans Tezi

MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ'NİN ÖYKÜLERİNİN TEMATİK
İNCELEMESİ

Evin BİLGE
10711013

DANIŞMAN
Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

MARDİN – 2013

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :.....
(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....
(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....
(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....
(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....
(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....
Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê
(Mor)

NAVEROK

KURTE	iv
ÖZET.....	vi
ABSTRACT	viii
KURTEBÊJE	x
PÊŞGOTIN	xi
DESTPÊK	1
PEXŞANA KURDÎ Û MODERNÎZM	1
1- Di Serdema Klasîk de Rewşa Pexşana Kurdî	1
a- Pêşgotina Nûbihara Ehmedê Xanî	1
2- Pexşana Kurdî ya Edebî û Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî	3
3-Di Wêjeya Cihanê de Destpêka Çîroka Modern û Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî	5
4- Di Wêjeya Nûjen de Cihê Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî	6
5-Di Çarçoweya Çîroka Gelerî û ya Romansê de Çîrokên Bazîdî.....	8
6. Di Werarbûna Çîroka Kurdî de Bandora Rojname û Kovaran	10
BEŞA YEKEMÎN	12
JIYAN Û BERHEMÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ	12
1.Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî yên ku Xebat li ser Kirine	16
1.1. Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransîzî û Rûsî-Fransîzî-Kurdî:	16
1.2. Ferhenga Kurdî-Fransîwî (Dictionnaire Kurde Francais):	17
1. 3. Ferhenga Kurdî ya bi Diyalekta Hekarî-Rewendî - Frensî:	17
2. Berhemên ku Mela Mehmûdê Bazîdî Telif Kirine	17
2.1. Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan	17
2.2. Adat û Rusûmatnameyê Tewayîfê Ekradiye.....	18
2. 3. Camî'eya Risaleyan û Hikayetan	19
2. 4. Wegera Şerefnameya Mîr Şerefhanê Bedlîsî	20
2. 5. Rêzimanê Erebi bi Zimanê Kurdî	21
2. 6. Mem û Zîn.....	22
2. 7. Yusif û Zuleyxayê	22
2. 8. Çîroka Şêxê Senan	22
2. 9. Destana Kela Dimdimê	23
2. 10. Çîroka Leyla û Mecnûn.....	23
BEŞA DUYEMÎN.....	25
DI DESTPÊKA SEDSALA NOZDEHAN DE ÇÎROKNÛSIYA ROJHILATA	
NAVÎN.....	25
1. Çîroknûsiya 'Erebî	25
2. Çîroknûsiya Farisî	27
3. Çîroknûsiya Tirkî	28
BEŞA SÊYEMÎN.....	36
DI ÇÎROKÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DE MIJARÊN CIVAKÎ	36
1.1. TÊKILIYÊN MALBATÎ	38
1.1.1. Evîn	38
1.1.2. Nêrîna Bazîdî ya li ser Tolazî û Îxanetê	42
1.1.3. Zewac	50
1.1.4. Xism û Merivantî	52
2. BÛYERÊN ABORÎ SIYASÎ Û CIVAKÎ.....	53
2. 1. Şerê Mîrekiyên Kurdan	53
2.2. Îdareya Dewletê	58
2. 3. Pêwendiya Kurd û Îraniyan.....	59

2.4. Pêwendiya Kurd û Osmaniyan.....	62
2. 5. Lehengên File (Ermenî, Nastûrî), Frengî	65
2. 6. Êzîdî	72
2. 7. Xwînî.....	74
2. 8. Şer, Talan û Şelandin	75
3. ZANÎN Ê PERWERDE.....	76
3. 1. Nezanî û Kêmaqilbûn.....	76
3. 2. Wêje	78
3. 3. Unsûrên Dînî	80
2. DI ÇÎROKÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DE MIJARÊN ŞEXSÎ	81
2.1. Hîle û Durûtî	81
2.2. Sextekarî.....	82
2.3. Fesadî, Derewkerî, Hesûdî ve Buhtan.....	83
2.4. Çavbirçîtî.....	84
2.5. NebûnaTirsa Mirinê	85
2.6. Zexelî û Timahiya Melayan	86
BEŞA ÇAREMÎN	89
JI HÊLA ZIMAN Ê WÊJYÊ VE DAHÛRÎNA ÇÎROKAN	89
ENCAM.....	95
ÇAVKANÎ.....	97

KURTE
JI HÊLA NAVEROKÊ VE DAHÛRÎNA ÇÎROKÊN
MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ
EVÎN BÎLGE

Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1860) alimekî hêja yê Kurdan e. Di dîroka wêjeya Kurdî de xwedî payeyeke bilind e. Di Serdema xwe de hem ji folklorê Kurdî û hem jî ji wêjeya Kurdî re xizmet kiriye. Nivîskarê yekemîn ê Kurdan e ku, berhemên wî hatine wergerandin ser zimanê biyanî. Di navbera salên 1856-1869'an de A. Jaba li Erziromê balyozî kirîye. Nasîna Mela Mehmûdê Bazîdî bi konsolosê Rûsyayê yê Erziromê rojhilatnas Aleksandere Jaba (1803-1894) re, di wê demê de çêbûye. Bi encama vê hevdu naskirinê re hem di jiyana Bazîdî de hem jî di dîroka edebîyata Kurdî de qonaxeke nuh dest pê kirîye. Jaba bi arşîvkirina berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî re ew ji wendabûnê xelas kirî û berhemên wekî “Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan”, “Adet û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradiye”, “Cami’eyê Risaleyan û Hikayetan”, Wegera beşekî Şerefnameya Mîr Şeref Xanê Bedlîsî, Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransizî û Rûsî-Fransizî-Kurdî, Ferhenga Kurdî-Fransizî, pirtûka Elî Teremaxî ya bi navê Rêzimanê Erebi bi Zimanê Kurdî, Mem û Zîn hwd. wergerandine li bal ve pêşgotinekê jî ji wan re nivîsiye û pişt re jî ji Akademiya Zanistî ya Petersborgê re şandiye. Herdu bi hev re xebateke hêjayî pesinandinê dikin. Berhemên Bazîdî ji bo me ji hêlên wan ên antropolojîk, sosyolojîk, çandî, hunerî, wêjeyî û dîrokî gelekî giranbiha ne.

Di tesnîfkirina çîrokên pêşîn ên nûjen de pirsgirêk heye. Ji ber ku ev cure çîrok hem bi gelemperî ji çanda gelerî tê lê, yeka yek naşibe çîrokên gelerî hem jî hêmayên nûjenî jî di xwe de dihewîne. Tesnîf kirina çîrokên pêşîn gelekî zehmet e. Ji ber taybetiyên wan ên ewilînbûnê, dikevin êwra navbera çîroka modern û gelerî. Heman çîrokên pêşîn ên gelên dinê jî bi vê pirsgirêkê re rû bi rû mane. Bi awayeke zelal destpêka çîroka rojhilatî (Erebî, Farisî û Tirkî) de jî heman rewş xuya ye. Ji ber ku ev çîrok di navbera çîroka modern û gelerî de ne rexnegir dikare wan ji herdu cureyan bihesibîne. Çîrokên M. M. Bazîdî di vê kategorîyê de ne. Ji aliyekî ve bi gelek awayan unsurên çîroka modern dihewîne, ji aliyê dinê ve jî dev ji adetên çîroka gelerî bernade. Ji çîroka gelerî ber bi çîroka nûjen de çîrokên M. M. Bazîdî pêlika ewilîn e. Senteza

adet û taybetiyên gelerî û hêmayên rojavayî dide û pêşengiyê ji çîroka Kurdî ya nûjen re dike.

Li gorî mijara tezê, çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî, ji hêla naverokî hate dahûrandin. Di bin sernîvîsa di çîrokên wî de mijarên civakî û şexsî de xal bi xal hatin analîzkirin. Ji van xalên ku dikevin bin van sernîvîsan ev in: têkiliyên malbatî, evîn, zewac û cureyên zewacê, çavliderî (tolazî) û nêrîna nivîskar ya li ser namûsê, bûyerên aborî siyasî û civakî îdareya dewletê, şer, perwerde û hîndekarî, cehalet, wêje, jiyana olî, çavbirçîtî, derewkarî, hesûdî, sextekarî ... û hwd.

ÖZET
MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ'NİN ÖYKÜLERİNİN TEMATİK İNCELEMESİ

EVİN BİLGE

Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1860) değerli bir Kürt aydınıdır. Kürt edebiyat tarihinde önemli bir yere sahiptir. Yaşadığı dönemde hem Kürt folkloruna hem de Kürt edebiyatına önemli katkıları olmuştur. Eserleri yabancı dile çevrilen ilk Kürt yazardır. A. Jaba, 1856-1869 yılları arasında Erzurumda Rus konsolosu olarak çalıştığı dönemde Mela Mehmûdê Bazîdî ile tanışmıştır. Bu tanışma sonucunda hem Mela Mehmûdê Bazîdî'nin yaşamı hem de Kürt edebiyat tarihi yeni bir döneme girmiştir Zira Jaba'nın teşviki ile Mela Mehmûdê Bazîdî Kürtçe el yazma eserleri toplamış ve Jaba'ya vermiştir. Jaba'nın Mela Mehmûdê Bazîdî'nin el yazması eserlerini Petersburg'da arşivlemesi sayesinde eserler günümüze kadar korunabilmiştir. A.Jaba, “Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan”, “Adet û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradiye”, “Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan”, Mîr Şeref Xanê Bedlîsî'nin “Şerefname” adlı eserinin bir bölümünün çevirisi, Kürtçe-Fransızca- Rusça sözlük, Kürtçe-Fransızca sözlük, Elî Teremaxî'nin “Rêzimanê Erebi bi Zimanê Kurdî” adlı kitabı ile Mem û Zîn adlı öyküsü ve adını saymadığımız diğer eselerinin Fransızca çevirisini yapıp önsözyle beraber Petersburg Bilimler Akademisine göndermiştir. Mela Mehmûdê Bazîdî'nin eserleri antropolojik, sosyolojik, kültürel, edebi, sanatsal ve tarihi değer bakımından oldukça önem arz etmektedir.

İlk modern öykülerin tasniflenmesi aşaması problemlili bir konudur. Bu çeşit öyküler genelde halk edebiyatının geleneğini yansımasıyla beraber yeni ve modern unsurlar da içermektedirler. Bu problem yani ilk öykülerin modern unsurlar ile beraber halk öyküsünün özelliklerini yansıması bütün Orta Doğu edebiyatlarında görülmektedir. Başka bir deyişle modern doğu edebiyatının erken evrelerinde de aynı üslup görülür. Eleştirmenler öykülerin bu özellikleri nedeniyle onları her iki kategorinin içine de koyabilirler. Mela Mehmûdê Bazîdî'nin öyküleri de bu tarzdadır. Bu eserler halk öyküsü tarzından modern öyküye geçişte ilk basamaktır. Bu yüzden de her iki tarzın unsurlarını da görebiliriz. Mela Mehmûdê Bazîdî, halk edebiyatının adet ve özellikleri ile batı edebiyatını sentezleyerek modern Kürt öykücülüğünün öncülüğünü yapmıştır.

Mela Mehmûdê Bazîdî'nin öykülerinin tematik analizi adlı tezimizde, öyküler sosyal ve kişisel konular başlıkları altında analiz edildi. Bu başlıkların alt maddeleri şunlardır: Aile ilişkileri, aşk, evlilik, çapkınlık, ekonomik, toplumsal ve siyasal olaylar, devlet idaresi, savaş, eğitim ve öğretim, cahillik, edebiyat, dini yaşam, açgözlülük, yalancılık, kıskançlık, sahtekarlık ...

ABSTRACT
THEMATIC ANALYSIS OF MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ'S STORIES
EVİN BİLGE

Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1860) is a valuable Kurdish scholar. He has an important position in the Kurdish literature history. In his era, he contributed to both Kurdish folklore and Kurdish literature. He is the first Kurdish author whose works were translated into a foreign language. When Alexendere Jaba was the Russian consil in Erzurum (1856-1867), he met Mela Mehmûdê Bazîdî. As a result of this meeting both Mela Mehmûdê Bazîdî's life and Kurdish literature history took another turn. By means of that A. Jaba archived Mela Mehmûdê Bazîdî's holograph works in Petersburg, his works survived.

A. Jaba translates "Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan", "Adet û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradiye", "Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan", a chapter of Mîr Şeref Xanê Bedlîsî's work named "Şerefname", Kurdish – French – Russian dictionary, Kurdish – French dictionary, Elî Teremaxî's book named "Rêzimanê Erebi Bi Zimanê Kurdî", his story named "Mem û Zîn" and many other works of his into French and sends to Petersburg Academy of Sciences with an introduction he wrote. In that era A. Jaba and Mela Mehmûdê Bazîdî make a laudable work. Mela Mehmûdê Bazîdî's works have a great importance in point of anthropology, sociology, culture, literature, art and history.

The process of classification of the first modern stories is a problematical issue. This kind of stories represent the tradition of folk literature and involves some innovative and modern elements. Classification of the first stories is very difficult and by reason of the fact that they are the first examples, they have a position between modern story and folktale. This problematic issue, that is to say the fact that the first stories have the charecteristic of modern story and folktale, occurs in the entire Middle Eastern literature. In other words, this style is seen in the early period of the modern eastern literature. Because of this charecteristic of these stories, critics can categorise them into the both categories. Mela Mehmûdê Bazîdî's stories are in this style as well. These works make the first step of the transitional period from folktale to modern story. Thus we can see the elements of the both styles. Mela Mehmûdê Bazîdî spearheads the

usage and characteristic of folk literature and the modern Kurdish literature synthesized with western literature both.

In this thesis which is named Thematic Analysis of Mela Mehmûdê Bazîdî's Stories some items have been analyzed under the title of Social and Individual Subjects in Mela Mehmûdê Bazîdî's Stories. Some of these items are; family relationship, love, marriage, lechery, economical, social and political issues, state administration, war, education and training, ignorance, literature, religious life, greed, deception, jealousy, dishonesty etc.

KURTEBÊJE

Amd: Amadekar

B.d: bê dîrok

Bnr: binêrin

B.n: berhema navborî

C: cild

Edît: Edîtor

H.b: heman berhem

Hwd: Her wekî din

J: jimare

K.T.: Komara Tirkiyeyê

M: mirin

P.z: piştî zayînê

R: rûpel

T.ç: teza çapnebûyî

Wer: wergêr

Weş: Weşanxane

y.d: yên din

PÊŞGOTIN

Mela Mehmûdê Bazîdî kesayet û zanayekî girîng e ku di gelek waran de berhem dane. Çîroknivîsî jî yek ji van waran e. Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Yûsûf û Zuleyxa û ji çil çîrokên dinê pêk tê. Li gorî mijara tezê, dahûrîna çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî, ji aliyê naverokê ve hate analîzkirin. Me xwest ku di vê xebatê de em Mela Mahmûdê Bazîdî jî bidin nasîn. Piştî hinek agahiyên di derbarê jiyana û berhemên Mela Mahmûdê Bazîdî em bi gelemperî li ser çîrokan sekinîn.

Di beşa yekemîn de li ser jiyana Mela Mehmûdê Bazîdî û berhemên wî hate rawestandî. Di beşa duyemîn de ji bo pêwendîya di navbera çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî û çîrokên cîranên kurdan hîn bêtir ronî bibe, lêkolîna li ser destpêka çîroka modern a gelên cîranên kurdan hate kirin. Her wiha bi destpêka wêjeya nûjen ya rojhilatî re hate muqayesekirin. Bi vî awayî çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî ji aliyê gelerî û nûjenî hate dahûrandin. Di beşa sîsîyan de jî, çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî ji aliyê mijarên şexsî û civakî ve hatin dabeşkirin û dû re ew jî di navbera xwe de ketin bin banên sernivîsên cuda cuda. Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî yê di Cemî'eya Rîsaleyan û Hikayetan de nivîsiye ji pirtûka Ziya Avcî kiriye hate girtin. Di beşa çaremîn de bi gelemperî li ser şêwe û zîmanê çîrokan hate rawestî.

Teza mê xebateke tematîk e ku em hîn bêtir li ser mijar û naverokê hûr bûn. Ango me çîrok li gorî mijar û temayên ku nivîskêr hilgirtine dest xwe dabeş kirin. Ji bo dahûrîna tematîkî hîn hêsantir bê kirin, me çîrok li gorî mijarê kategorîze kirin û di bin banê sernivîsên diyarkirî de civandin. Pişt re van çîrokên ku me tesnîf kiribûn, dem dem da ber hev û li ser zîman, vegotin û taybetîya sazîkirinê şîrove kir. Lê divê em vê jî bibêjin ku ji hev veqetandina tema û naverokên çîrokê de diyarkirina sînorên teqez, karekî zehmet e. Lê di xebatê de em bi îsrar li wan çîrokan vedigeryan û bi vî awayî me hewl kir ku teza me hîn tekûztir bibe.

Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî di navbera êwra çîroka gelerî û êwra çîroka nûjen de cih digre. Hêmanên vegotinên gelerî û nûjen bi hev re di nava xwe de dihewîne. Ev taybetî, girîngiya van çîrokan derdixe holê. Wekî ku tê zanîn ev metna, çîroka 'Mem û Zîn' `ewilîn çîrok û pexşana Kurdî tê pejirandin. Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî di vê kategorîya pira modernî de ye. Ev taybetîya bihevrebûna unsûrên modernî ligel gelerî yê çîrokên Bazîdî ne taybetîyeke çîroka Kurdî ye. Li ser kategorîzekirina çîrokên destpêka modernî gelek wêjevan li ser fikra zehmetiya

tesnifkirina çîrokên pêşîn disekinin. Xeta tenik ya di navbera çîroka modern û gelerî de, carinan dibe ku qet xuya jî nabe. Hin çîrok hene ku mirov dikare wan ji herdu cureyan bihesibîne. Di wêjeya cihanê de mirov li destpêka çîroknûsiya nûjenî binere heman tecrube di her wêjeya gelî de heye. Wêje her çiqas ji pêvajoyê sûde wergirtiye jî, ji carekê dest ji reha xwe ya gelerî bernedaye û bi derbekê de terza nûjen bidest nexistiye. Di destpêka çîroka Erebî, Farisî û Tirkî de jî heman rewş xuyaye. Di edebiyata kurdî de di pêvajoya derbasbûna ji çîrokên gelerî ber bi çîrokên nûjen de çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî pêlika ewilîn e. Ji alîkê dest ji adet û taybetiyên gelerî bernade û dajo ji aliyê dinê bi hêmayên rojavayî pêşengiyê ji çîroka Kurdî ya nûjen re dike.

Ji ber ku em li Tirkiyeyê yekemîn xwendekarên Kurdolojiyê bûn û li ber destê me zêde çavkanî yên tehlîlên çîrokên Kurdî nîn bûn di vê mijarê de em rastî hinek dijwariyan hatin. Di vê pêvajoyê de min gelek alîkariya mamosteyên xwe dîtin. Berî her tiştî ez divêm ji bo ku bi îlm û sebra xwe di pêvajoya amadekariya xebata min de rêberî ji min re kiriye, spasiyeke ji dil û can ji mamosteyê xwe yê birêz Doç. Dr. Abdurrahman Adak re bikim. Ji ber ku di amadehiya teze de hem bi pêşniyazên xwe yên hêja, hem jî bi pirtûkxaneyê xwe ya dewlemend ji min re bûn alîkar, ji bo min ferz e ku spasiyê ji mamosteyên xwe yê hêja Serokê Enstîtuya Zimanên Zindî û Beşa Ziman û Çanda Kurdî birêz Prof. Dr. Kadrî Yildirim pêşkeş bikim. Her wiha ji bo piştgirî û teşwîqên ku daye min ji endamê hîndekariyê Birêz Doç. Dr. Hayrullah Acar re spasiyê dikim. Keda mamoste Ramazan Pertew ez ji bîr nakim, ji wî re jî spasdar im.

DESTPÊK

PEXŞANA KURDÎ Û MODERNÎZM

1- Di Serdema Klasîk de Rewşa Pexşana Kurdî

Berî ku em dest bi mijara ewilîn çîrokên kurdî bikin, hewce ye ku em li ser dîroka pexşanivîsiya kurdî bisekinin. Lewre bi piranî tê qebûlkirin ku modernîteya wêjeyê bi pexşanê dest pê kiriye. Li jêrê bi awayekî kronolijîk û bi kurtî em dê berhemên pexşanî yên ku heta dewra Mela Mehmûdê Bazîdî hatine nivsandin, bidin nasandin. Divê ev jî bê gotin ku, vê kronolojiya ku em didin, li gorî belgeyên halî hazir di dest de hene, hatiye rêzkirin. Ji ber ku destxetên kurdî, bi piranî nehatiye parastin û wenda ne. Her wekî Malmisaniyê¹ li ser vê mijarê derdibire ku, di dema Osmanîyan de, di pirtûkxaneyên mîrên kurdan û li medreseyan heremê de, bi hezaran pirtûkên destxetî hebûn lê mixabin niha di arşîvan de pir kêr belgeyên destxetî hene.

a- Pêşgotina Nûbihara Ehmedê Xanî. Ev berhem, wekî pexşaneke bi awayê modern nayê hesêb lê, jibo destpêka pexşanî ya wêjeya kurdî girîng e. Di vê pêşgotinê de, terzeke pexşanê ya nêzîkî helbesta erûzî heye. Ew ne helbest e, lê bi şêweya pexşana ‘erebî ya destpêkê ku, hîn beriya îslamê hebû, nivîsiye. Li gorî vê şêweyê dawîya hevokan bi heman tîpê diqedin.

Di edebiyata kurdî de berhema ewil ya bi awayê pexşanê hatiye nivîsîn, pirtûka Eliyê Teremaxî ya bi navê “Destûra Zimanê ‘Erebî bi Kurdî” ye ku, di sala 1000ê koçî de, ku beramberî bi 1591-1592 yê zayînî hatiye nivîsîn. Di dema Eliyê Teremaxî de feqî û şagirdên kurdan di medreseyan de destûra zimanê ‘erebî ji kitêbên ku bi ‘erebî hatine nivîsandin hîn dibûn. Lê Teremaxî bi armanca ku hînbûna destûra zimanê ‘erebî ji bo feqîyan kurdan yê ku hîn nû dest bi xwendinê dikirin hêsantir bike, nivîsiye.² Ev zimanzanê kurd di vê pirtûka xwe de gava di hinek babetan de, li ser rêçikên rêzimana ‘erebî sekinîbû, wekî muqayese rêçikên rêzimanê farisî û kurdî yê di wan babetan de jî diyar kiriye.³ Reşîd Findî, di pirtûka xwe de pêşniyaz dike ku bi vê berhema xwe Teremaxî, wekî yekemîn rêzimanivîsê kurd bê qebûlkirin. Findî, rêçikên ku Elî Teremaxî di vê pirtûkê de derbarê rêzimana kurdî aniye zimên, di kitêba xwe ya bi navê

1 Malmisaniyê, Mehmet (Malmisaniyê), “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine-II”, 1988, Tarih ve Toplum, sayı: 55, r. 58-63.

2 Marif Xeznedar, Destûrê Zimanê Erebi Bi Kurdî, Eliyê Teremaxî, Çapxaneya Daru’z-Zeman, Bexdad, 1971.

3 Mamoste Qedri, “ Eliyê Teremaxî û dîtînen wî yê li ser rêçikên rêzimana kurdî li gor pirtûka wî ya bi navê ‘Destûra Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî””, BÎR, hejmar: Bihar 2005.

“Eliyê Teremaxî Yekemîn Rêzimanivîs û Pexşanivîsê Kurd E” de kom kirine û bêyî ku dest bide orijînalê wan, bi alfabeya kurdî ya Başûr bi tîpên ‘erebî nivîsandiyê.⁴

b- Berhema pexşanî ya duwem, “Eqîdeya Kurdî” ye. Ev metn ji hêla Mewlana Xalidê Neqşîbendî Şarezûrî (1779-1827) ve hatiye nivîsîn. Weha tê xuyakirin ku Mewlana Xalidê Neqşîbendî ev berhem ji bo perwerdeyê, wekî çavkaniyeke di waneyan de bê xwendin amade kiriye. Eqîdeya Kurdî cara pêşîn di sala 1981ê de çap bûye.⁵

c- Berhema “Mewlûdname” ji hêla Şêx Huseynê Qazî (1790-1869) ve hatiye nivîsîn. Berhem wekî ku ji navê wê jî diyar e, di derheqê jidayikbûn û mezinbûna Cenabê Muhammed de ye. Bi zimanekî xweş hatiye nivîsîn û ji aliyê hunerî ve mişt e. Ev jî di medreseyan de wekî pirtûka dersê hatiye bikaranîn. Di sala 1935an de hatiye çapkirin.⁶

d- Di wêjeya kurdî de sê pexşanên dinê jî hene ku ji aliyê Mele Yûnûsê Ergetînî (1785) ve hatine nivîsîn. Mele Yûnûsê Ergetînî di çerxa XVIIIyan de jiyaye.⁷ Navê wan “Terkîb” (sazimana hevokan), “Tesrif” û “Zirûf” (hoker) e.⁸ Mele Yûnis jî weke Mele Eliyê Teremaxî, ji bo hêsanîkirina dersên feqîyan, xwestiye ku rêzimana ‘erebî bi kurmancî binivîse û ji bo vê mebestê ev her sê berhem nivîsandine.⁹ Mela Mehmûdê Bazîdî di nivîsa xwe ya Elî Teremaxî dide nasandin de, Mele Yûnisê Ergetînî jî tîne ziman û dibêje ew, yek kesê ku xwediyê pirtûkên li ser rêzimana ‘erebî ye. Ev pirtûk sala 1996an li Stokholmê ji nav weşanên Sarayê derket.¹⁰

Ji pirtûkên bi awayê pexşanê hatine nivîsîn kitêbeke tîbbê ji hêla Mele Mihemedê Erwasî beriya bêtirî du sed salî nivîsiye. Herweha Mele Xelîlê Sêrtî jî nivîstokeke bi navê “Cewahîr û Eqîdetil Îslam wel-îman” berî sed û heştê salî nivîsiye.¹¹

4 Reşîd Findî, Elî Teremaxî Yekemîn Rêzimanivîs û Pexşanivîsê Kurd E, Bexdad, 1985.

5 Ferhat Shakely, Modên Kürt Öykü Sanatı, Avesta, İstanbul, 1998, r. 21-22.

6 Ferhat Shakely, 1998, r. 21-22.

7 Abdulreşîb Yusuf, Şaîrên Klasîk ên Kurd, JN Weşanên Jîna Nû, Uppsala/Sweden, 1988, r. 20-21
Abdulreşîb Yusuf li ser Mele Yûnûsê Ergetînî wiha dibêje “ Mele Yûnis berî Mele Xelîlê Sêrtî ye. Yanî berî çerxa 19an. Mihemed Merdûxî, di rûpela 196an a cilde yeke ya tarîxa xwe de dibêje; Mele Yûnis xwedane terkîb, tesrif û zirûfe ye.”

8 Muhemed Merdûxî, Tarîxa Kurd û Kurdistan, cild I, r. 196; Mehmet Uzun, Kürt Edebiyatına Giriş, İthaki Yayınları, İstanbul, 2007, r. 36.

9 Feqî Huseyn Sağnîç, Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 444.

10 Se’îd Dêreşî, Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Amd. Se’îd Dêreşî, Spîrêz Pres, Duhok, 2007, r. 36-37; Jan Dost, Adat û Rusûmetnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bazîdî, Nubihar, Stenbol, 2010, r.22.

11 Se’îd Dêreşî, 2007, r. 36- 37; Jan Dost, 2010, r. 22.

e- Berhema “Tewarîxî Qedîmî Kurdîstan” a Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1857an de hatiye nivîsîn û ji hêla K.K. Kurdoev û J.S. Musayliyan li Moskowayê di sala 1986an hatiye çapkirin.

f- “Adat û Rusûmetnameya Ekradiye” ya Mela Mehmûdê Bazîdî, di heman salan de hatiye nivîsîn. Ew berhem her çiqasî dahûrînek antropolojîkî be û li ser mijara adetên kurdan hatibe hûnan jî, tê de hêmanên wêjeyî jî dihewe.

2- Pexşana Kurdî ya Edebî û Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî

Edebiyata kurdî ya ku bi sed salan, bi hezaran edîb û helbestvanên hêja ên wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şêx Evdîrehmanê Axtepî, Feqiyê Teyran û hwd. gihandiye û di wêjeya klasîk de di nav edebiyata cîhanê de xwediyê cihekî taybet e. Belkî jî ji ber ku zanîna me ya di derbarê wêjeya kurdî de qels e û kêma lêkolînên akademîk li ser çand û wêjeya kurdî hatine kirin em têr jê ne haydar in.

Xebat û lêkolînên akademîk ên li ser wêjeyê û çanda kurdî, zêde zêde hewce ye. Ev hewcebûn ji taybetiya dîroka kurdî tê. Wekî tê zanîn piştî peymanê Qasra Şîrîn a ku di sala 1639an de hatiye îmzekirin, axa welatê kurdan bû du perçeyan, pê şerê cihanê yê I. jî bû çar perçeyan. Dema ev sînor ketin nava erdnîgariya kurdî lê dijîn, bi her awayî bandoreke neyînî li wêjeya kurdî kir. Wêjeya her perçeyî, dikare bê gotin ku, bêyî ku ji perçeyên dinê sûd wergire bi nivîxweserî pêş de çû. Haya nivîskarên perçeyekî ji perçeyên dinê çênebû an jî kêma çêbû. Tiştên dihate nivîsandin jî ne her bi tenê kêma bû, belê bi sed dijwariyan piştî ku çap dibû jî, nedigihîşt destê xwendevanên kurd. Romana Erebe Şemo piştî derketina xwe bi 40-50 salan hê nû digihe destên beşek ji xwendevanên kurd, yê Rehîmê Qazî û gelek nivîskarên din.¹² Di roja me de bi pêvajoya globalbûna cihanê re meriv dikare bibêje ev rewş hatiye guhertin.

Di sedsala XIXemîn de bala oryantalistên rojavayî çûne ser çîrokên kurdî. Lê ne ji hêla wêjeyî hîn bêtir ji hêla zimanzanî û filolojîkî nêzîkî çîroka kurdî bûne. Di vî warî de serkêşiyê Peter Lersch,¹³ Oscar Mann,¹⁴ Eugen Pryme û Albert Socin¹⁵ dike. Kurdolog û zimanzanên rojavayî çîrokên gelerî bi gelemperî ji bo wekî çavkaniyakî hebanoka peyvê, cudatîyên dialektî, gramer û sentaksê bikaranîne. Ji ber wê jî guh

12 Fevzi Özmen, “Pêşgotin” Kovara Înstîtûta kurdî ji bo lêkolîn û zanistî, Köln Hejmar 16-Payîz 2010, r. 5-24.

13 Peter Lersch Recherches sur les Kurdes inaniens et sur leurs ancêtres, les Chaldeens septentrionaux (Iran Kürtleri ve Ataları Kuzey Khaldiler Üzerine Araştırmalar), St. Petersburg 1856.

14 O. Mann, Kurdische u. Persische Forschungen. IV. Die Mundart der Mukri, Berlin, I. 1906, II, 1909.

15 E. Prym û A. Socin, Kurdische Sammlungen, St. Petersburg, 1890.

nedane ziman û sazûmanîya wêjeyî. Zanist, sosyolog û kurdologên bi sazûmanîya civaknasiya kurdî mijûlbûne, dema bi zehmetiya bidestxistina çavkaniyan re rû bi rû mane serî li çîrok, efsane û destanên dengbêjan dane. Di tezên xwe û di pirtûkên xwe de wekî çavkanî bikar anîne.¹⁶

Çîroka Mem û Zînê, wekî yekemîn çîroka modern a bi kurdî tê naskirin. Ev çîrok di sedsala XIXan de ji hêla Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivîsandin.¹⁷ Em bi pirtûka Ferhad Pîrbalî¹⁸ ya bi navê Mela Mehmûdê Bayezîdî ya ku di sala 2000î de çapbûyî re, bi vê rastiyê û hinek şaşiyên xwe hesiyan. Berî berhema Ferhad Pîrbalî, çîroka “Le Xewma” ya Cemîl Saîbî, ku di sala 1925an de hatibû belavkirin wekî yekem çîroka kurdî ya nûjen dihat zanîn.¹⁹ Lê, piştî bi dîtina çîroka “Şiwêş” a Fûadê Temoyê ku di sala 1913an bi kovara Rojî Kurd belav bibû êdî ew dîrok bi 12 salan paş de biribû.²⁰ Niha dema çîroka “Mem û Zîn” a Mela Mehmûdê Bazîdî ku di sala 1856an de nivîsî hate dîtin û sax kirin êdî dîroka çîroka kurdî pêncî û heft salên din jî paş de çû û rûpelekê zêrîn ji bo wêjeya kurdî hate neqîşandin.²¹

Jan Dost, jibo pîrsa “çima pexşan bi Bayezîdî re dest pê kiriye?”, weha dibêje:

Wek tê zanîn mejiyê rojhilatî mejiyekî afirîner e romantîk û lîrîk e, mejiyê helbestî ye, lê yê rojavayî mejiyekî felsefîk û lêkolînî ye. Lêkolîn û felsefe jî ku ne bi pexşanê bin nabin, loma jî bi təkiliya Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî re dewreke nû dest pê dike. Bazîdî berhema têkelbûna rojhilat û rojavayê ye! Çêlîka lihevraştatîna mejiyekî akademîk û hişê rewşenbîrekî kurd î rojhilatî ye.”²²

Mela Mehmûdê Bazîdî nivîskar û berhevkarekî hêja û biqîmet e. Xebatên wî, di nav wêjeya kurdî de cihekî birûmet digre. Di warê kurdolojiyê de xebat û lêkolînên zanistî yên berhevkirina berhemên heyî karekî taybet e. Jibo rastnivîsîna dîroka wêjeyê muhîm e. Ferhad Pîrbalî rolek mezin lîstîye ku bi lêkolînvaniya xwe ketiye dû şopên destnivîsên Bazîdî û Jaba û di warê dîroka wêjeyê de karekî baş kiriye. Duhokî di

16 İlhamî Yazgan, Eski Kürt Öyküleri, Belge Yayınları, İstanbul, 1996, r. 1.

17 Ferhad Pîrbal, Mele Mehmûdê Bazîdî 1799-1867 Yekemîn Çîroknûs û Pexşanûsî kurd, Weşanxaneyê Aras, Hewlêr, 2000.

18 Bnr. Ferhad Pîrbal, 2000.

19 Cemîl Saîb, Di Xew De, Awesta, Stenbol, 2002.

20 Fuad Temo, Çîrok, Rojî kurd, Çapa I, 1913, Hejmar I., Weşanên War, Stenbol, 2002.

21 Firat Cewerî, Antolojiya Çîrokên kurdî, Cilt I(1958-2003), Nudem, Stenbol, 2003, r. 38.

22 Jan Dost, 2010, r.19

meqaleya xwe ya bi navê Mela Mehmûdê Bazîdî de ji ber vê karê hêja û girîng a dîtî û saxkirina yekem çîrok û yekem pexşana kurdî kiriye Pirbalî pîroz dike.²³ Lê di warê kurdolojiyê de karê herî mezin A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî kirine. Findî jî dîsa di berhema xwe yê bi navê Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî pesnê A. Jaba jî dide û dibêje:

*“Çêndîn karêt zanistî encam dan dane dest konsolê Rûsya Qayserê li Erziromê li Bakurê Kurdistanê ku navê wî Aleksander Jaba bû. Wî konsolî jî ew berhemê berkevtî li kutubxaneyê Rusyayê daniye ku her zindî bimîne û berze nebin. Bi vî çendî vê xizmeta jêhatî bo milletê kurdan pêşkeş kir. Çunkî ger wî ev kar nekiriba me ev ro ew gencîne ji berhemêd Bazîdî nedibû.”*²⁴

3-Di Wêjeya Cihanê de Destpêka Çîroka Modern û Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazîdî

Di cihanê de êwra destpêkirina çîroka modern di sedsala XIXemîn de ye. Modernîzma çîroknûsiya kurdî jî di heman sedsalê de ye. Mirov li ser heyama wêjeya kurdî li pêvajoya dawîya serdema klasîk û destpêka modernîzmê raweste ewê bê dîtî ku, wêjeya kurdî, ji aliyê pêşveçûnê wekî wêjeya cihanê bi şeklekî asayî pêşdeçûye. Eger ku, li derekî aliqîbe jî, ev cihê ku lê sekinî ye -yan jî hilkumî ye- ne sedsala XIXan, sedsala XXan e. Her wekî Firat Cewerî²⁵ di berhema xwe ya bi navê Antolojiya Çîrokên kurdî de pêwendiyê bi Mem û Zîna Bazîdî datîne û dibêje, berî sed û şêst salan çîroka hunerî ya nûjen hatiye nivîsandin. Duhokî di gotara xwe de taybetiya çîroka Mem û Zîna ya Mela Mehmûdê Bazîdî bi berfirehî vedibêje. Li gorî wî ev berhema navborî ne ji aliyê teknîk û ne jî mijarî kêmi çîroknûsiya cihanê ye.²⁶

Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê (1923), di warê tirkî de gelek çîroknivîs derketin û bêtir piştî vê demê de hunera çîroka tirkî kemilî. Nivîskarên mîna Ömer Seyfettin, Sabahattin Ali, Sait Faik ku hê jî cihekî wan ê taybetî di edebiyata tirkî de heye, piştî avabûna komarê hunera kurteçîrokê li ba tirkan gihandine dereceyeke bilind.²⁷ Komara Tirkiyeyê xwe li ser bingehehên kapîtalîzmê û modernîzmê inşâ kir. Şêweya modernîzm û kapîtalîzmê di siyasetê de xwe wekî netewe-dewletê derdixe pêş. Bi dema

23 Xelîl Duhokî, “Mela Mehmûdê Bazîdî”, Gulistan, Hejmar I, 2002, r. 73-84.

24 Reşîd Findî, Pirtûka Adad û Rûmetnameya Ekradiye ya Mele Mehmûdê Bazîdî, Spîrêz, Çapa I, Hewlêr, 2006, r.3.

25 Firat Cewerî, 2003, r.37-58.

26 Duhokî, 2002, r. 73-84.

27 Cewerî 2003, r. 9-45.

ji nû ve vejînek di edebiyata tirkî re çêdibû, her ku diçû, kaniya edebiyata kurdî jî dimiçiqî. Dawî li klasîkan hat û bi her awayî, rê li ber avakirina edebiyateke kurdî ya nûjen hate girtin. Êdî derxistin û weşandina kovarên mîna Kurdistan (1898), Rojî Kurd (1913) û Jîn (1918-1919) ne mimkin bû. Herçiqa ev kovar û rojnameyên kurdan bi du zimanî, bi tirkî-kurdî bûn û giraniya wan siyasî bûn jî, dîsa li ser çand û wêjeya kurdî, li ser rabûn û rûniştina kurdan gelek nivîsên balkêş diweşandin.²⁸

4- Di Wêjeya Nûjen de Cihê Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî

Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî wekî xelekeke zincîrê ya di navbera çîroka gelerî û nûjen de ye. Hem bi taybetiyên kevneşopî û gelerî, hem jî bi hêmayên rojavayî pêşengiyê ji çîroka kurdî ya nûjen re dikin. Mînakên taybetiyên gelerî xwe di terza vegotina çîrokbêjiyê de eşkere dikin. Hêmayên nûjenî jî di çîrokan de xwe ji aliyê hûnandin û teknîkê ve derdixin pêş. Bûyerên dîrokî li gorî pirsgerêkên rojane ji nuh ve tîn şîrovekirin. Mela Mehmûdê Bazîdî gelek serhatiyên dîrokî yê du re bi awayê zargotinî ketiye nav wêjeya kurdî di nava çîrokên xwe de hewandiye. Mijarên wekî Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Kela Dimdimê û çend hebên din ên ku berê bi awayê zargotinê hatibûn veguhestin yan jî yê ku tenê bi awayê nezmê hatibûn nivîsandin kiriye çîrok. Berî Bazîdî jî gelek edîbên kurd heman şêwe bi kar anîbû, berhemên zargotinî yê di nava gel de heyî ji berhemên xwe re kiribûn bingeh. Li ser vê mijarê Qenatê Kurdo fikrên şagirta xwe ya kurdnasa Sowyetê Margarita Borisnova Rudenko neqil dike ku, Rûdenko jî di kitêbên xwe de vê mijarê aniye ber çavên xwendevanan. Li gorî ku Kurdo neqil dike, Ehmedê Xanî “Mem û Zîn” a xwe ji Mem û Zîna zargotinî (Memê Alan) wergirtiye û nivîsiye. Harisê Bedlîsî “Leyl û Mecnûn” a xwe ji “Leyl û Mecnûn” a zargotinê wergirtiye. Feqiyê Teyran beyta xwe ya “Şêxê Senan” ji beyta zargotina “Şerê Sîsebanê” yan jî ji beyta “Doda Gurca” wergirtiye.²⁹

Li gorî M. B. Rudenko gelek tiştên baş ên edebî ku ketine nava civakê, bûne beytên zargotinê. Dengbêj û çîrokbêjên kurdî gelek caran bi ezberî hînî stran, gotin û beytên zargotinê bûne. Serhatiyên lehengan bi ew stran li nava civakê bi qeydê xwe bi tertîb û sazmaniya xwe belav kirine. Mînak beyta “Dimdimê”, serhatiya “Siyabend û Xecê”, serhatiyên “Şerê Sîsebanê”, “Mem û Zîn” yan jî serhatiya “Zembîlfiroş” û gelek tiştên din hem bi zargotinî hene, hem jî bi şaxê lîteraturî. Eva yek, nîşan dike ku gelek bûyer û çîrokên dîrokî ku ketine nava çanda gelerî bi alîkariya hostatiya nivîskar,

28 H.b, r. 9-45.

29 Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Weşanên Öz- Ge, Enqere, 1992, r. 21.

helbestvan û çîroknivîsan tevî çîrok û serhatiyên nivîsandî bûne. Herweha bi alîkariya nivîsa Erebe Şemo beyta “Dimdimê”, “Xanê Çengzêrîn” bûye ramana nivîsandî. Bi alîkariya Sebendê Siyabendov şaxê serhatiya “Xecê û Siyabend” bûye poema nivîsandî.³⁰ Herekol Azizan di kovara hawarê de çîrokeke bi navê “Siyabendê Silivî” weşandiye.³¹ Dîsa M. Said Ramazan el Bûtî vê çîroka Siyabend û Xecê bi zimanê ‘erebî nivîsandiye û Abdulhadî Timurtaş wergerandiye ser zimanê tirkî.³²

Nivîskarên pêşiya wî û hemçax û xelefên wî heman şêwe bi kar anîne. Di berhemên tevan de jî şêwe ne terza zargotinî ne. Lê naveroka wan nêt û meremê wan, navên lehengên wan kêr û zêde mîna hev in. Ev yek jî dîsa nîşan dike ku edebiyat û zargotina kurdî bi hev re girêdayîne ku hevbendiya wan bi hev re heye.³³

Çîrokên modern ên pêşîn, zêde zêde di bin bandora çîrokên gelerî de ne. Ev jî her wekî Ehmed Haşîmzade³⁴ jî dibêje, ji xwezaya berhemên wêjeyî tê. Her berhemeke wêjeyî bivê nevwê ji derdora xwe ya civakî derdikeve û li gorî civaka xwe teşe digre. Heman berhem, ji alîkî jî bandorê li ser civakê dike û wê vediguherîne. Bi kurtasî meriv dikare bibêje ku berhemên wêjeyî û civak, bi hev re têkildar in. Wêje xwe dispêre çand û folklorê civaka xwe. Nivîskarê Mem û Zînê, Bazîdî, mijara çîroka xwe ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî girtiye û Ehmedê Xanî jî ev mijar ji “Memê Alan” a zargotinî girtiye.³⁵

Bazîdî çîroka Dimdimê jî dîsa ji beytên Meleyê Bateyî girtiye û Melayê Bateyî jî ji dengbêjan bihîstiye.³⁶ Çîroka Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa her wekî di çîrokan de ew jî beyan dike ji halê wan ê nazimî sûde wergirtiye. Siyahmed û Şemsê û çîroka Lalîxan û Hesem Axa jî bi heman rengî ne, hîn jî ji hêla dengbêjan tîn xwendin.³⁷

30 Kurdo, 1992, r. 21.

31 Herekol Azizan, “Siyabendê Silivî”, Hawar 13, 1932; Stig, Wikander, Berhevoka Kurdî, Koral 34, İstanbul, 1992, r. 97-98

32 M. Said Ramazan el Bûtî 2001, M. Said Ramazan el Bûtî, Siyamend û Xecê, Kent Işıkları, Stenbol, 2011.

33 Kurdo, 1992, r. 22.

34 Haşîm Ahmedzade, Romana Kurdî û Nasname, Wer. ji îngîlîzî, Fahriye Adsay, Avesta, Stenbol, 2001, r. 18.

35 Ali Kılıç di nivîsa xwe yî bi navê “Bo bîranîna Zanyarê nemir Prof. D Qanatê Kurdo”de, nivîsara Kurdo ya peywendîya folklor û lîteratura kurdî “Derheqa şovêd Mem û Zînê, zargotî û şova Mem û Zîna Ehmedê Xanî” di Govarî Kotî Zanyarî Kurdî, cild. VI, Bexda, 1978, 78-110. neqil dike. Ali Kılıç, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/ali-kilic/bo-biranina-zanyare-nemir-prof-dr-qanate-kurdo.html> 21.02.2013

36 Bnr. Çîroka Dimdimê.

37 Mela Mehmûd Bazîdî, Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye, amd. Ziya Avci, Weşanxaneyê Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 21.

Bazîdî ev tekstên nivîsandî û nenivîsandî hilgirtiye, bi tertîba xwe, bi sazmaniya xwe, bi rengê nivîsara xwe û bi xemla xwe ji nû ve can daye.

5-Di Çarçoweya Çîroka Gelerî û ya Romansê de Çîrokên Bazîdî

Di nava cureyên çîrokê de çîroka gelerî ya herî kevn e. Ev cure wezîfeya pîrekê di navbera destan û çîrokên modernî dike. Çanda devkî her çiqas bi pêşketina teknolojiyê û belavbûna radyo û televîzyonan bi taybetî jî di van 20-30 salên dawî de kêmtir bûbe jî, hîn jî li gelek heremên kurdan de ev çanda devkî û gelerî zindî ye. Di çanda devkî ya tirkî de jî ev rewş weha ye. Li gorî ku Boratav dibêje³⁸ wekî heremên Serhed û Çikûrovayê, çîrokên gelerî yê bi terza vegotinî hîn jî zindî ye.” Di çanda devkî de, jibo dengbêjiya kurdî hîn jî qasî ku xebat li ser bê kirin malzeme hene. Dengbêjî, îro jî di nava civakê de zindî ye û xebatên lêkolînî tên kirin. Wekî mînak, Hilmi Akyol, di xebata xwe ya “Antolojiya Dengbêjan” de ji herêma Serhedê heta Botanê, heta Anatolya Navîn bi dengbêjan re rû bi rû hevdîtinan pêk aniye û berhema xwe nivîsandiye.³⁹

Li rojava destpêka romansê di sedsala duyemîn de bi yunaniyan destpê dike. Dema meriv li romansê dinere li vir hûnandineke dubare derdikeve pêş mirov. Du xoşewîst bi sedemên curbicur ji hev dûr dikevin û dema li hev digerin hin bûyer tên serê wan, carinan tên revandin û carinan jî wekî kole tên firotin yan heps kirin. Carinan zilam çav bera jinê dide, carinan jin çav bera mêr dide, carinan hin dimîne ku leheng bimire, lê dawiya dawî du xoşewîst xwedî li evîna xwe derdikevin û digihêjin hev û dizewicin. Li gorî ku Moran dibêje hemû rexnegirên ku li ser romansê xebitîne li ser van hunandinên romansê yê ji hev qetandin-talûke-mirad li hev dikin.⁴⁰ Dema meriv çîrokên dengbêjan û qalibên romansê dide ber hev, dibîne ku hinek unsûrên qalibên romansê, di nava çîrokên gelerî (dengbêjan) de hene. Mijarên romansê meriv dikare bike 4 beşên bingehîn:

- 1) Ji hev hezkirina keç û kur,
- 2) Ji hev dûr ketina xoşewîstan,
- 3) Berxwedana xoşewîstan a ku ji bo gihastina hev,

38 Pertev Naili, Boratav, 100 Soruda Türk Halk Edebiyatı, Gerçek Yayınevi, İstanbul, 1969. r. 55.

39 Hilmi Akyol, Antolojiya Dengbêjan 1-II, Edîr, Azad Zal, weş. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, 2011.

40 Moran, 2008, r. 28.

4) Encama bi zewac an jî mirin.⁴¹

Dema meriv varyantên gelerî yê çîroka Mem û Zînê yan jî Siyabend û Xecê ji beş bi beş dahûrîne, meriv dê rastî gelek hêmanên wekî hev bîn. Nimandina romansê, li gorî Moran cureyeke vegotinê ya nerealîst û bi pirsgirêkên jiyane re bêelaqe ye. Tenê ji bo demeke xweş bide xwendevanan hatiye nivîsandin. Bi gelemperî hûnandina bûyerê û epîsodên wê her dem xwe dubare dike û bi tevayî evînen bi mirad diqede, wekî mijar ji xwe re distîne. Lehengên tê de yan reş in yan spî, yan baş in yan xerab.⁴² Ev tişt di çîrokên Bazîdî de nîn in. Ji ber wê çîrokên Bazîdî û terza romansê ji hev dûr in.

Lêkolînanên li ser mijara modernîzmê dixebitin, li ser jêderka modernîzmê li hev dikin. Modernîzma wêjeyî jî her wekî tê zanîn li Ewropayê dest pê kiriye û ji wir li cihanê belav bûye. Hinek ronakbîrên ku li ser nûjenbûna hunera çîroka kurdî mijûl bûne dibêjin ku çîroka kurdî her wekî çîrokên rojhilatî bi çîroka Ewropayê re têkildar e. Ev şîrove ji bo gelên rojhilatî rasterast derbasdar e. Her wekî li jêr wê hîn bi awayê eşkeretir bê vegotin, di pêvajoya destpêka modernîzma wêjeya tirkî, ‘erebî û farisî de ronakbîrên wan bi awayekî çanda Ewropayê dibînin, heyran dibin û tînen welatê xwe wergerên çîrokên rojavayî dikin û dû re jî wê terza navborî teqlîd dikin. Wêjeya rojava ya modern piştî sedsala bîstan de bi awayê wergerê re ketiye nava wêjeya kurdî. Lê di sedsala nozdehan de, ji ber ku Mela Mehmûdê Bazîdî neçûye Ewropayê, berhemên rojavayî wernegerandiye ser zimanê kurdî û teqlît nekiriye, meriv teqez nikare ev heyranî û ecibandina wêjeya rojavayî bibêje. Di vî warî de, her wekî nivîskarên tînen qalkirin û Mela Mehmûdê Bazîdî naşibin hev.

Kurdo, di pirtûka xwe ya bi navê Tarîxa Edebiyeta Kurdî de dirêj dirêj li ser tevahiya xebatên ku, ji weşana “Recueil de notices et récits kourdes” a A. Jaba li St. Petersburgê di 1880 de hatiye çapkirin heta îro li ser edebiyata kurdî hatine kirin disekine û li ser rola çapemeniya kurdî pir radiweste.⁴³ Di pirtûka xwe de Ferhat Shakely⁴⁴ fikrên Izedîn Mistefa Resûl⁴⁵ wiha tîne ziman:

“Çîroka kurdî ya modern, ne tenê dewama çîrokên gelerî ye, ji wêjeya Ewropayê jî nehatiye standin. Bes tevlihevbûna mîrasa gelerî ya devkî û nivîskî û vegotinên hunerên mayî ye.”

41 Moran, 2008, r. 29.

42 H.b., r. 28.

43 Kurdo, Tarîxa Edebiyeta Kurdî, cîld 1, Stockholm, Weşanên Roja Nû, 1983, r. 192.

44 Shakely, 1998, r.30-34.

45 Resûl, Izedîn Mustafa, Ara’ fi’l- qissatil Kurdiyye, Al Aqlam, 19 (1984), r. 113.

Li gorî Shakely jî ev fikir hîn rastir tê.⁴⁶

“ Di salên 1940î de heyama Gelawêjê çîrok ji zimanên dinê hatibû wergerandin ser zimanê kurdî ji ber wê mirov nikare bêje tesîra Ewropayê rasterast li ser destpêka çîroka nûjen ya kurdî heye. Çîrokên hatine wergerandin pewajoya gelawêjê barîz zêde dibe. Kovara Gelawêjê di navbera deh salan (1939-1949) de çap dibe. Ji sed û penc hêjmarên ku derketine sed û çarde çîrok tê weşandin jê heştê û du çîrok werger yê mayî ên nivîskarên kurd in.”

6. Di Werarbûna Çîroka Kurdî de Bandora Rojname û Kovaran

Yekemin çîroka modern ya ku bi şeweya edebî hatiye nivîsandin Decameron e. Decameron di sedsala 14an de ji aliyê Bocacîoyê îtalî hatiye nivîsandin. Decameron ji deh çîrokên kurt pêk tê û mijara xwe ji deh rojên dema şewba webayê digire. Li dû vê çîrokê di sedsala şanzdemîn de hejmara çîrokên çapbûyî zêde bû. Di vir de bandora kovar û rojnameyan divê neye jibîrkirin. Di wêjeya rojavayê de çîrok bi alîkariya kovaran bi pêş de ket. Ji ber kinbûna xwe, di kovaran de pir hêsanî dihat weşandin. Ev jî bû sedem ku, çîrok ji nav cureyên wêjeyê de cureya herî bêtir di kovar û rojnameyan de ciyê xwe zevt bike û zêde zêde belav bibe.

Bandora rista rojname û kovaran a li ser çîrokê her wekî li jor jî di mijara çîroknûsiya cîranên kurdan de hate îfadekirin, pir girîng e. Ferhat Shakely bi nêrîneke objektîf li tesîra rojnamegeriya kurdî ya li ser pêşketina çîroka kurdî hûr dibe. Li gorî wî, rojnameya kurdî, hem peyvira belavbûna feraset û hişmendiya politîkî hem jî peywira pêşvebirina çandî hilgirtiye. Ji ber vê Marûf Berzencî tekîliya derketina çîroka kurdî û rojnamegeriya kurdî bi hev girêdaye.⁴⁷ Li gorî wî di wê demê de du fonksiyonên girîng ên rojnameyên kurdî hebûn, ji aşîlîkî jiyana kurdan ji alî politîk û îdeolojîk pêşdexistin û belavkirina hêstên neteweyî, ji aliyê din jî pêşvebirina çand û zimanê kurdî.” Li gorî Ferhat Shakely⁴⁸ û Omer Marûf Berzencî⁴⁹ jî derketina hunera çîroka kurdî jî bi rojnamegeriya kurdî rasterast tekildar e.

Her çend rojnamegeriya kurdî pêş ketiye, tesîreke erênî li pexşana kurdî kiriye. Weşanên di navbera 1925-1975an de ji 1100 çîrokan 800ên wan di kovar û rojnameyan

46 Shakely, 1998, r.30-34.

47 Omer Marûf Berzencî, Lêkonînewe û Bibliyografyay Çîrokî Kurdî (1925-1969) Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 19 weguheztin ji Ferhat Shakely 1998, r. 25.

48 Shakely, 1998, r.12.

49 H.b. 25.

de hatine weşandin. Ev jî vê bawerîya me piştrast dike. Dema meriv çîrokên ewil dixwînin dibînin ku, tesîra kevneşopiyên çîrokên gelerî an jî destanên gelî li ser çîrokên modern bênavber xuya dibin. Tesîra çîrokên gelî, xwe di ziman û sazûna çîroka modern de belî dike. Lê dîsa jî wekî Izededdîn Mustafa Resûl⁵⁰ dibêje, çîroka modern ya kurdî ne tenê dewama çîrokên gelerî nin; ne jî tene jêwergirtinên çîroka Ewropayê ne, sentezeke mîrateya gelerî ya afirîner e. Ev mîrateya gelerî hem vegotina devkî hem jî ya nivîskî ye.

Meriv bi çavekî hûrbînî li rojnamegerîya kurdî binere mêjûya çapemeniya kurdî ne derengtirî çapemeniyên milletê mayî yê rojhilata navîn e. Rojnameya Kurdîstan di sala 1908an de derketiye. Ji bo milleteke bindest, ev dîroka rojnameya netewî gelekî baş e. Rojnamegerîya farisan di sala 1822yan de bi metbeaya Muhammed Ali Paşa ku li Bulakê sazkir û pê re rojname û kovar pêşdeçûn. Di dîroka tirkî Şemsettin Samî, 1288/1872 yekemîn rojnameya sîvîl derxistiye. Dîroka rojnamegerîya ‘ereban jî ne jê kevintir e. Piştî dagirkerîya Fransewîyan ya li erdnigariya wan re ev mêjû destpê kir.

Rojnameya Kurdistan bi destê kurên Bedîrxan Beg, Evdîrehman Paşa û Midhad Paşa dihat weşandin. Ji ber ku siltanê Romê çapkirina wê li Tirkiyeyê qedexa kiribû mecbûr mabûn ev rojname li Qahîreyê, Londonê, Folkstanê û li ciyê din çap bikin. Wekî tê zanîn kovar û rojnameyên pêşîn tevî ku peywîrên xwe yê bîngêhî gelek mîsyonên hêja jî girtibûn ser milên xwe. Hem ji aliyê çandî, hem jî ji aliyê wêjeyî û hişmendî xwestine xizmetê ji gelên xwe re bikin. Çapkirî rojnameya Kurdistan (Kurdistan Hejmar: 3, r.3) di rojnameyê de ji aliyekî perçeyên Mem û Zîna Ehmedê Xanî diweşîne û agahî derheqê Ehmedê Xanî û berhema wî dide û ji bo hinek cihên nehatiye xwendin sererast bike, ji gelê xwe dixwaze ku destnivîsê orjînal hebe bigihîninê.

50 Izededdîn Mustafa Resûl, Ara fi'l qissatîl Kurdiye, el-Aqlam,19 (1984) ,113, neqil ji Ferhat Shakely 1998, r. 25.

BEŞA YEKEMÎN

JIYAN Û BERHEMÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

Mela Mehmûdê Bazîdî 1799an de li Bazîdê hatiye dinê.⁵¹ Li heman cihî, dest bi xwendina medreseyê dike. Li Tewrîzê hînî farisî dibe û li Bazîdê dest bi seydatiyê dike. Piştî hin bûyerên wê demê rewşa malbata wan a tîcarî xerab dibe mecbûr dimîne ku ji bajarê xwe dûr bikeve. Li ser vê derbasî bajarê Erziromê dibe û li wir dest bi melatî û seydatiyê dike. Li Erziromê, nasîna wî bi konsolosê Rûsyayê rojhilatnas Aleksandere Jaba (1803-1894) re çêdibe. Herdu bi hev re xebateke piralî, têrberhem û hêja dikin. Mela Mehmûdê Bazîdî di nav civata kurdan de xwediyê cihekî bilind û bi paye bû. Em ji gelek bûyerên qewimîne, ew rêz û siyaneta ji Mela Mehmûdê Bazîdî re hatiye kirin derdixin ku, ew ji malbatake paye bilind e. Ew bi xwe jî bi ilm û perwerdeya ku dîtîye di nav civatê de bûye xwediyê rêz û hurmetê.⁵² Aleksander Jaba di derheqê zanabûn û jêhatîbûna Mela Mehmûdê Bazîdî de weha dibêje:

“ ... Wî ziman û edebiyata farisî, ‘erebî û tirkî jî xwendiyê û van zimanan baş dizane... ew di nava hevalên xwe de ji hemûyan zanatir bû... di nava rewşenbîrên welêt de jî gelek bi nav û deng û biqedir bû. Piştî sala 1856an Mela Efendî bû seydayê min û di derbarê dîrok, ziman û kultura milletê kurd de alîkariya min kir. Ew karê ji min re hatibû sipartin, yanî hînbûna zimanê kurdî min bi saya rewşenbîrê kurd, Mela Mehmûdê Bazîdî ew dan hev.”⁵³

Mela Mehmûdê Bazîdî ne tenê di herêma xwe de, heta li seranserê Kurdistanê, kesekî gelek bi siyanet û qedirbilind bûye. Bêguman ev birûmetbûna wî ji ber alimî û zanetiya wî dihat. Aşkartinan van gotinan jî ev e, ku di dema serhildana Mîr Bedirxan Beg (1847) de, ji aliyê siltanê osmanî Ebdulmecîd bi wezîfeya navbeyntiyê tê peywardarkirin. Jê tê xwestin ku Mîr Bedirxan Beg îqna bike ku bi osmaniyan re nekeve şer û pevçûnê. Ji aliyê çavkaniyên cihê cihê ve ev bûyer bi vî awayî tîr neqilîkin.⁵⁴ Sultan Ebdulmecîd, Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo ragirtina şer û serhildana li dijî Dewleta Osmanî, dişîne Cizîrê ba Mîr Bedirxan Beg. Ji vir jî dixuye ku nasîna Mîr Bedirxan Beg û Mela Mehmûdê Bazîdî beriya vê bûyerê bi hev re hebûye. Mela Mehmûdê Bazîdî li vir navbeyntiyê dike. Dîsa dema Mela Mehmûdê Bazîdî li Wanê bû,

51 Pîrbal, 2000, r. 9-30; Bazîdî, amd. Ziya Avci, 2010, r.11-14.

52 Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010, r. 11-14.

53 Bnr. H.b.

54 Bnr. H.b.

şerê di navbera Xan Mehmûd û Osmaniyan de berdewam dikir. Vê carê Mela Mehmûdê Bazîdî bi handana vî şerî û bi hevkarîya serokê serhildanê Xan Mehmûd re hate tawanbar kirin. Li ser vê, wî digrin û panzdeh roj li Wanê di zindanê de dihêlin. Lê pişt re wî berdidin, ew tehdîd dikin û tim di bin çav de didin girtin. Bêgûman Osmaniyan, Mela Mehmûdê Bazîdî, ji ber di demeke wiha de ji tirsê firehbûna cebheyek li dijî xwe nedixwestin û qedrê Mela Mehmûdê Bazîdî yê di nava civaka kurdan hesab dikirin, serbest berdan.⁵⁵

Mela Mehmûdê Bazîdî yekem rewşenbîr û zanayê kurdan e ku di sedsala XIXan de, di hemû danûsitandin û xebatên xwe de tenê zimanê kurdî bikar aniye.⁵⁶ Her wekî em dizanin, bi taybetî di sedsala XIXan de, zimanê farisî û ‘erebî di nav zana û rewşenbîrên kurdan de gelek di rewacê de bû. Nêzîkî temamê zana û rewşenbîrên kurd, di karên xwe yê nivîsandinê de, ev her du ziman bikar anîne. Lê em dinêrin Mela Mehmûdê Bazîdî bi eksê vê hereket kiriye. Di kar û barên xwe de û ew kitêbên ji aliyê wî ve hatine nivîsandin, bi kurdî ne.⁵⁷

Mela Mehmûdê Bazîdî ne tenê bi çîroknûsiya xwe derdikeve pêş, kesayetekî piralî ye.⁵⁸ Hinek lêkolînvanên li ser Bazîdî xebitîne vê xalê anîne ziman. Rudenko girîngiya rola wî ya li ser wêjeya dawîya sedsala XIXan destnîşan dike û her wiha didomîne yekemîn çîroknûs û pêşengekî pexşanûsî kurdî, mêjûnûs, komelnas, etnograf, wergêr, kamûsvan, yekem arşîwîst û komkerê tekstên folklorî... Aso Zagrosî di nivîsa xwe ya li ser înternetê weşandiye de ecêbmayîna xwe wiha neqil dike:

“ Ez her cara Mela Mehmûdê Bazîdî dixwînim, şaş dibim ku wî wekî nivîskar têxim kîjan kategoriyê. Ji ber ku Mela Mehmûdê Bazîdî bi serê xwe wekî pirtûkxaneyê kurdî bû. Gelo Mela Mehmûdê Bazîdî dîrokzan bû, civaknas bû, zimanzan bû, yekemîn çîroknûsê kurdan bû, wergêr bû, dîroknasê wêjeyê bû, siyasetmedar bû, yan kesayetek nadîr kurdî ya dikaribû senteza van zanistan bike bû? ”⁵⁹

55 Bazîdî, amd. Ziya Avci, 2010, r.11-14.

56 Pîrbal, 2000, r. 9-30.

57 Pîrbal, 2000, r. 9-30; Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010, r.11-14

58 Feqî Huseyn Sağniç, 2002, r. 444.

59 Aso Zagrosî, “ Mela Mehmûdê Bazîdî” <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-mella-mehmude-beyazidi-1797-1870-50904238.html> (10.01.2012).

Mela Mehmûdê Bazîdî, ji êwira dîrokê de xwe berdewamkirê Şerefyan û di ziman, netewiyet, rastnivîs û îspatkirina hêza zimanê kurdî de xwe wek şagirtekî Xanî dibîne. Lê bi wergervanî û arşîvgiriya xwe jî, ji herduwan jî dubihure û ji wan derbas dibe. Çawa pêşengiya dîroknivîsandinê Şerefyan; ya netewiyet, felsefeya siyasî û edebî, Ehmedê Xanî dike, pêşengiya arşîvgirtin û wergerê jî Mela Mehmûdê Bazîdî Beyazîdî dike.⁶⁰

Bandora A. Jaba ya li ser arşîvkirina berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî berbiçav e. Em dixwazin hinekî vî kesayetî jî bidin nasîn. Aleksandere (Auguste) Jaba (1803-1894), di sala 1804an de li Kraslawê (Polonyayê) hatiye dinê.⁶¹ Ew bi eslê xwe cihû ye. Bavê wî kesekî gundî, lê xwedî milkekî zêde bûye. Wî wekî birayên xwe leşkerî hilnebijart; di destpêkê de xwest biçe Enstîtuya Komunîkasyonê, lê di sala 1824an heta 1828an de xwendina xwe ya bilind ya li Sankt Petersburgê li ser zimanên rojhilatî kir. Di sala 1830yî de, di beşa zimanên rojhilatê de, bû wergêrê zimanê tirkî. Di sala 1832yan ji bo wezîfeyekê çû Stenbolê û di sala 1835an de jî cardin ji aliyê wezaretê derve ya împatoriya Rûsyayê ve li İzmirê hate wezîfedar kirin. Di sala 1843yan de, li ser biryara serokatiya meclisa împaratoriye, bû sekreterê dîwana serokatiyê. Di sala 1848an de dest bi peywira konsolosiya Erziromê kir. Ev wezîfeya wî heta sala 1869an dewam kir. Li wir li ber destê Mela Mehmûdê Bazîdî kurdî jî hîn bû.⁶² Mela Mehmûdê Bazîdî ji pirtûkxaneyê xwe gelek pirtûk bexişand Jaba. Piraniya van pirtûkan pirtûkên destxetî bûn.⁶³

Jaba yek ji wan kesan e ku di sedsala XIXan de, damezirênerê destpêkî yê lêkolîna edebiyata kurdî bê hesêb kirin. Ev wezîfeya han ji hêla Boris Andreevich Dorn, Akademiya Zanistî ya Bilind a Petersburgê ve jê re hate dayîn. Di wê demê de akademîsyen B. Dornî (1805-1881) serokê akademiya St. Petersburgê bû wî li ser navê akademiya St. Petersburgê daxwaza meteryalan ji rojhilatnasan kiribû. Ew daxwaz gehande gelek rojhilatnasên ku li wan deveran kar dikirin. Yek ji van, rojhilatnasê naskirî N. Chanykova ye ku, ew di wê demê de li Tebrîzê konsul bû û wî gelek

60 Özmen, 2010, r.5-24.

61 Jan Reyhman, Lêkolînanên Polonî yê Ziman û Folklorê Kurdan, Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan, Wer. Sidqî Hirorî, <http://www.kulturname.com/?p=749>, (14 Mijdar 2012)

62 Pîrbal 2000, r. 9-30; Ziya Avcı, “ Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, Kovara Bîr, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> (14 Mijdar 2012)

63 Feqî Huseyn Sağniç, 2002, r. 444.

materyal ji wir bi dest xistin.⁶⁴ Jaba li ser vê daxwazê birek mele û zanayên kurd yên wekî Teha Hecî Ebdal, Mihemed Xerîb Silêman, Şah Nezer, Mela Mihemed, Hesen Hekîmbaşî, û Mihemed Moksî li dora xwe kom kir⁶⁵ û bi alîkariya wan dest bi berhevkirin, lêkolîn, werger û nivîsandina destnivîsên kevin ên kurdî kir.⁶⁶

Di civîna 4/5 1859an de nameya Jabayî ya sisê adara wê salê hate xwendin. Jabayî her wisa “Recueil des et udes kourdes avec transcription du texte et traduction française” şandibû. Akademîsyen Dornî li ser hindê raporek pêşkêş kir û guhdariya pêdaçûna Lerchî hat kirin û komîteyek ji bo munaqêşekirina çawaniya weşandina wan materyalan hat hilbijartin. Komîte, ji van kesan pêk hatibû: Akademîsyen Dorn, Böhlingk, Wiedemann, Weliaminov-Zernov.

Endamên komisyonê, bi çavên ecêbmayî temaşayî wan materyalên Jabayî kirin. Ev materyalên di dest de bûn, dabûn xuyakirin ku ew berhem, ne wekî şandekên bere bûn ango tenê ji wergeran pêk nehatibûn. Materyalên original yên bi zaravayê kurmançî û zanyariyên li ser jiyanameya şairên kurd yên ku heta wî demî nehatibûn naskirin û nivîsek li ser eşîran û transkripsiyona fonetîk ya tekstan (li gor rênivîsa fransî) û herweha wergerên wan yên fransî li gel de hebûn. Ew materyal bi karekê pir wechar bo filolojî, etnografî, statistîk û dîrokê hatin bi nav kirin⁶⁷

Aleksander Jaba bi Mela Mahmûdê Bazîdî re koleksiyana destnivîsarên kurdî yên derheqê folklor, dîrok, etnografya û zimanê kurdî berhev kirine.⁶⁸ Li gorî Pîrbalî, Mela Mehmûdê Bazîdî di çar qadan de alîkariya A. Jaba kiriye: alîkarî kirina nivîsandina pirtûk û belgeyên di derheqê kurdan de, berhev kirin, werger kirin, di amedekariya pirtûkan de alîkarî kirin.

Li Petersburgê, destxetên ji pênuşa Mela Mehmûdê Bazîdî derketine hatiye parastin. Ji van destxetan 44 bi zaravayên kurmançî 4 farisî, 3 heb jî tirkî ne.⁶⁹ Ev koleksiyon bi qasî 90 salan çap nebûn û di refên akademiya zanistî ya Petersburgê de li hêviya lêkolînavanekî/ê man. Heta sala 1957an Rûdenkoyê ew xebatên di Pirtûkxaneyê

64 Jan Reychman, H.b. 14 Mijdar 2012.

65 Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010.

66 Kurdo, 1992, r. 14.

67 Jan Reychman, h.b.

68 Bois, Th, V.Minorsky û hwd., “Kürtler, Kürdistan, wer. Kamuran Fıratlı, Weşanxaneyê Doz, Stenbol, 2004, r.169-176.

69 Aso Zagrosî, r. 2010.

Petersburgê ya bi navê Şaltikov-Şêdrîn de bû, da weşandin û naskirin. Li sala 1961ê xebateke wê ya bi navê “Derheqa Destnivîsarê Kurdî yê li Lenîngradê” çap bû.⁷⁰

Xebatên ku A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî kirine, di warê kurdolojiyê de wekî çavkaniyên bingehîn li ber destên lêkolînavan in. Mehmet Uzun⁷¹ di pirtûka xwe ya “Kürt Edebiyatına Giriş” (Destpêka Wêjeya Kurdî) de weha piştrast dike. Uzun, di bin mijara helbestvanên klasîk ên kurdî de têbiniyeke wiha dide: “Pêşgotina D. N. MacKenzie ya bi navê “Melayê Cizîrî and Feqiyê Teyran” ya beşa Şêxê Senan de bi mafdarî nivîsandiye ku agahiyên me yê ewilî ên derbarê klasîkên kurdî bi alîkariya nivîsên Mela Mehmûdê Bazîdî ku, dane A. Jaba çêbû. A. Jaba dû re ev nivîs di pirtûka xwe yî bi navê “Receuil des notices et recits Kurde” weşandin. Di kovara Hawarê de, Celadet Elî Bedirxan jî, bi rêzenivîsên xwe yê bi navê “Klasîkên Me” dîsa piştî xwe disparê heman çavkaniyê.

1. Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî yê ku Xebat li ser Kirine

Ewilîn lêkolînen li ser çand û wêjeya kurdî bi destên rojhilatnasên rojavayî çêbûne. Ev jî sedemeke ku kurdoloji, di sedsala nozdehan de bibe deyndarê tevgera kolonyalîzma rojavayî. Bi vê tevgerê re û bi destpêka berjêrbûna Dewleta Osmanî re êdî welatên rojavayê jibo desthilatdariya wan deran bi dest bixin, xwestin milletên heremê nas bikin. Xwestin xoyên xelkê, mezheb û dîn, rewşa civakî, aborî û wêjeyî jî zanibin ku pê re karibin mîras û bermayê (Mêrê nexweş) ango dewleta Osmanî di nav xwe de parve bikin. Li ser vê bingehê di warê rojhilatnasiyê, û di nav re jî di warê kurdnasiyê de gavin mezin avêtin.⁷² A. Jaba ji nav van rojhilatnasan yek bû, ku wî jî dîsa li gorî vê ferasetê peywira xwe dianî cî. Li jêr xebatên ku A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî bi hev re kirine, hatine rêzkirin.

1.1. Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransîzî û Rûsî-Fransîzî-Kurdî:

Mela Mehmûdê Bazîdî, di amadekirina vê ferhenga han a ji 15 hezar bêjeyan pêk hatiye, alîkariya A. Jaba kiriye. Ev kitêb heta niha nehatiye çapkirin û ew di Akademiya Zanistî ya Petersburgê de hatiye parastin.⁷³

70 Jan Dost, 2010, r.202.

71 Mehmet Uzun, Kürt Edebiyatına Giriş, İthaki, İstanbul, 2006, r. 23.

72 Jan Dost, 2010, r.10; Rohat, Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987), Weşanên Deng, İstanbul, 1991, r. 14.

73 Pîrbal, 2000, r. 18.

1.2. Ferhenga Kurdî-Fransiwî (Dictionnaire Kurde Francais):

Mela Mehmûdê Bazîdî di nivîsîn û amedekirina vê ferhenga kurdî-fransizî de alîkariyeke gelek mezin daye A. Jaba. Ev ferheng li St. Petersburgê hatiye çapkirin.⁷⁴ Ferhenga kurdî-frensiwî yek ji wan xebatên hêja ya A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî bi hev re kirine.

1. 3. Ferhenga Kurdî ya bi Diyalekta Hekarî-Rewendî - Frensî:

Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo amadekariya ferhengeke diyalektê Hekarî û Rewendî alîkariya Jaba kiriye. Pêşgotina destnivîsî ya ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji ferhengê re hatiye nivîsandin, li Kutupxaneyê Akademiya Rojhilatnasiyê ya Lenîngradê bi jimara (D448) hatiye parastin. Navê wergera vê berhemê “Vocabulaire Kurde des Dialectes de Hekarî et Rewendî par A. Jaba. Consul de Russie Erzeroum le 15 Mars 1958” ye. Berhem di sala 1984an de ji aliyê Maruf Xezenedar ve hatiye çapkirin.⁷⁵

Mela Mehmûdê Bazîdî di pêşekê de bi diyalekta kurmancî behsa hinek taybetmendiyan zimanê kurdî dike. Desnivîsa Mela Mehmûdê Bazîdî bi kurmancî-bi elîfbeya ‘erebî; bi kurmancî-bi elîfbeya latînî û wergera frensî; di beşa duduyan de jî di penc sitûnan de bi şeweyê Rewendî-bi latînî; bi şeweyê Rewendî bi ‘erebî; Hekarî bi latînî- Hekarî bi ‘erebî û bi frensî.⁷⁶

Bazîdî di warê amadekirina rêziman û hinek pirsên ziman û alfabeya kurdî de jî çêbûye. Bi diyalektê kurmancî, behsa hinek taybetmendiyan zimanê kurdî dike. Ev kitêb, bi destxetê yekê bi navê Şehnezer û di sala 1858an de hatiye ji berkirin. 49 rûpel e, di her rûpelê de 13 rêz hatine nivîsandin. Rudenko ji vê berhemê re dibêje ev berhem, di derheqê ziman û gramera kurdî yekemîn çavkanî ye.⁷⁷

2. Berhemên ku Mela Mehmûdê Bazîdî Telif Kirine

2.1. Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan

Wateya navê vê pirtûkê Mêjûya Nû ya Kurdistan e. Ev kitêb ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Lê mixabin ew wenda ye. Hete niha ji bo peydakirina wê gelek hewil hatiye dayîn, lê ew hewldayîn bênetîce mane. Li gor wan

74 Pîrbal, 2000, r. 15.

75 Pîrbal 2000, r. 9-30; Ziya Avcı, “ Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, Kovara Bîr, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> (14 Mijdar 2012).

76 Pîrbal, 2000, r.16

77 Pîrbal, 2000, r.16

agahdariyên ku A. Jaba û gelek kesên ku di derbarê vê kitêbê de nivîsandine, em bi hindikayî jî be di derbarê vê berhemê de dibin xwediyê agahiyê. Pêşgotina ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatiye nivîsandin û A. Jaba ew wergerandibû fransîzî de heta niha hatiye parastin. Mela Mehmûdê Bazîdî, di sala 1857an de dest bi nivîsandina vê kitêbê kiriye. Pirtûk ji yanzdeh beşan pêk tê. pirtûk li ser bûyerên çaxa mîrekiyên kurdan rawestiye. Bûyerên salên di navbera 1785 û 1857an qewimiye nivîsandiye.⁷⁸ Ew berhem wekî yek nusxe hatiye nivîsandin. Hecma wê nêzîkî hezar rûpelan bûye. Pêşgotina A. Jaba ya bi ji pêncî rûpelan pêkhatî ye li Akademiya Zanistî ya Peterborgê de ye. Kemal Mezher ji bo vê hewildana Mela Mehmûdê Bazîdî û rista wî ya mêjûnûsiya destnîşan dike.⁷⁹

2.2. Adat û Rusûmatnameyê Tewayîfê Ekradiye

Urf û Adetên kurdan, bi awayekî xwerûtir “Jiyîn û Adetên Kurdan”, ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve, li sala 1274 meşextî (1857-1858 mîladî) de hatiye nivîsandin. Ji aliyê A. Jaba ve jî wergera wê ya fransîzî hatiye kirin. Bi destê Aleksander Jaba’yî çûye kutupxana Saltikov Şîdrîn a li Rûsyayê û bi jimara (Kurd 7) hatiye parastin.⁸⁰ Ev berhem wekî du nusxe hatiye parastin. Nusxeya yekemîn bi destxeta Bazîdî ya qopyaya wê jî deh sal pê wê bi dest xetê Şehnezer hatiye nivîsîn.⁸¹ Pişt re di sala 1963an de, ji aliyê M. B. Rudenko ve li Moskowayê wergera wê ya rûsî hatiye kirin û li Moskovayê hatiye weşandin. Ev wergera Rudenko bûye bingeha wergera Şukriye Resûl ku, wê jî ji zimanê rûsî wergerandiye ser zarê soranî û di sala 1982yan de li Bexdayê çap kiriye.⁸² Wergerên “Adat û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradiye” yên bi zimanê ‘erebî jî heye.⁸³ Jan Dost ev berhem beş bi beş wergerand û li ser malperên internetê ew weşand,⁸⁴ pê re kir wekî pirtûk. Findî jî wê pirtûka Ehmed Osman Ebubekir ya li sala 1972yan li ser berberiyên çar beş ji vê vekolînê wegerandiye ser zimanê ‘erebî di rojnameya et Teaxiyê de weşandiye li Kutubxana Karê Zanyarê

78 Murad Celalî, (2010). “Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye û Çend Gotin”. Nûbihar, Hejmar: 112, r. 50-54; Ziya Avcı, “Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, 2012.

79 Pîrbal, 2000, r.16.

80 Pîrbal, 2000, r. 15; Findî 2006, r. 9.

81 Ji pêşgotina M. B. Rudenko, neqil ji Jan Dost, 2010, r. 208.

82 Pîrbal, 2000, r. 9-30; Findî, 2006, r.,9; Jan Dost, 2010, r. 23.

83 Pîrbal, 2000, r.15.

84 Dost, 2010, r. 23.

Kurd li Baxda dîtiye.⁸⁵ Di sala 1998an de li Stenbolê ji weşanxaneyê Periyê çapa vê berhemê ya tirkî derket.⁸⁶ Transkirîpsiyona wê ya kurmancî jî hatiye kirin.

Mela Mehmûdê Bazîdî, ji bo ku gelê xwe baş binase li erdnîgariya Kurdîstanê digere, li nav eşîran, koçeran û gundan gelek dahurandinan dike. Hal û tentêla wan qenc hîn dibe. Mêvanî, malvanî (mêvandarî), keç xwestin, dawet, cîrantî û yên mayî qenc hîn dibe û van zanînan di serê xwe de cih dike û paşî dixê ser kaxezê bi van bizava pirtûka xwe ya Adet û Rusûmatnameyê Tewayîfê Ekradiye dinivîse.

Ev kitêb yekem lêkolîna civaknasî, etnolojî û etnografî ya li ser kurdan e ku bi kurdî hatiye nivîsandin. Mela Mehmûdê Bazîdî li Kurdîstanê geriyaye, çavdêriyê ji adetên kurdan kiriye. Ew çavdêriyên xwe li ba xwe not kirî û piştî kiriye berhem. Ji vê awirê mirovekî xwediyê çavdêriyên xwurt e. Bi van aliyên xwe kesekî din ku bikaribe lingên xwe li yên wî bide, bibe yek ji kilasê wî û xwediyê heman payeyê be, mirov nikare bi hesanî di nav hemdemên wî de bibîne. M. B. Rudenko⁸⁷ jî bo vê, ev tişt gotiye: “Eger xebata Mela Mehmûdê Bazîdî digel A. Jaba tunebûya ev çend nasîna kurdan a çaxa navîn bi vê rewşê sererast dê destê me neketa.” Reşîdê Findî⁸⁸ jî disa heman fikrê de ye. Dibêje ku: “Di warê Kurdolojiyê da û Bazîdî baştirîn numûne dane destê wî û eger Bazîdî wenekiriba û A. Jabayî ev pirtûk û destnivîs ba me nehilgirtibana me ev ro ev hemî dur û mirarî ji gencîneya kurdan nedibûn”

2. 3. Camî'eya Risaleyan û Hikayetan

Ev berhema hêja - Civînoka Name û Çîrokana - ya Mela Mehmûdê Bazîdî, ji sê maqale û çil çîrokana pêk hatiye.

Beşa “Beizê Eşîr û Qebaîl û Taîfeyê Kurdîstanê” û “Navên Mêr û Jinên Kurmancan”; “Behsa Şaîr û Musenefên di Kurdîstanê” û “Muqedîma Ilmê Serfê û Beizê Usûlê Lazîmeyê Te'îmeyê bi Zimanê Kurmancî” di sala 1858an de hatine nivîsîn.

“Çil Hikayetên Kurmancî” di sala 1860î de nivîsandiye.

Maqaleya yekê, di derbarê hinek eşîretên Kurdîstanê û agahdariyên di warê jiyana wan de û ji lîsteke navê jin û mêran pêk hatiye.

Maqaleya duduyan, bi kurtî behsa jiyana heşt şaîrên kurd ên kevin dike. Ew şaîr jî ev in: Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî. Şaîrê

85 Findî, 2006, r. 9.

86 Dost, 2010, r. 23.

87 Feqî Huseyn Sağniç, 2002, r. 443-445.

88 Findî, 2006, r. 9.

şeşan, Îsmâîl ê eslê xwe ji Bazîdê û şagirdê Ehmedê Xanî ye. Di sala 1065ê hicrî de hatiye dinê û di 1121ê hicrî de wefat kiriye. Şairê heftan, Şerefxan ê eslê xwe ji mîrên Hekariyê ye û di 1101ê hicrî de li Hekariyê koçê dawiyê kiriye. Şairê heştan jî Muradxan e û li Bazîdê di sala 1150yê hicrî de hatiye dinê û di sala 1199ê de koçê dawiyê kiriye.

Maqaleya sisiyan nasandina destnivîsa Elî Teremaxî ya bi kurdî û di derbarê rêzimanê ‘erebî de ye. Pirtûka Elî Teremaxî ya Mela Mehmûdê Bazîdî ew ji nû ve bi rêkûpêk kir, nivîsand pişt re pêşgotinek jê re amade kir. Paşî ev pêşekî Jaba dixê nav maqaleyên Camî’iya Risaleyan û Hikayetan.⁸⁹

Alaxander Jaba wergerên van çil çîrokên kurdî li meha adara 1859an ser daxwaza rojhilatnas Boris Andreevich Dorn bi navekî dinê Johannes Albrechts Bernhard Dorn(1805-1881) kiriye.⁹⁰ Ev berhem wekî yekem pirtûka çîrokan a çapkirî ye. Ev pirtûk bi pêşeka Peter Lerch nivîsiye bi zimanê kurdî-frensî di sala 1860î de belav bûye.⁹¹

Dû re Ferhad Pîrbalî, destxetên Mele Mehmûdê Bazîdî ji pirtûka xwe re kir bingeh û berhema xwe ya bi navê “Mele Mehmûdê Bazîdî 1799-1867 Yekemîn Çîroknûs û Pexşanûsî Kurd” di Weşanxaneyê Arasê li Hewlêr di sala 2000 de weşand. Ziya Avcî jî çîrokên Mela Mehmûd Bazîdî, di bin navê Camî’eya Risaleyan û Hikayetan di Weşanxaneyê Lîsê ya li Diyarbekirê di sala 2010 de çap kir.

Cankurdî ev çil çîrok û heft çîrokên Xanima Dietrici Chrestomathie Ottomane,⁹² bi tîpên latînî vediguhezîne. Ev berhem bi navê “Çîrokên Kurmancî”⁹³ di weşanxaneyê çanda nûjen de di sala 2000’î de bi transkripsiyona Cankurdî tê weşandin. Cankurdî ev berhemên li jor rêzkerî ji tîpên ‘erebî û rênivîsa berê, kirine yên latînî û ferhengoke jê re çêkiriye.⁹⁴

2. 4. Wegera Şerefnameya Mîr Şerefxanê Bedlîsî

Mela Mehmûdê Bazîdî, yekem kes e ku cara ewil cilda ewilî ya Şerefnameya Mîr Şeref Xanê Bedlîsî ji orjînalê wê ya farisî û li ber wê nusxeya ji aliyê Zêrnov ve

89 Pîrbal, 2000, r. 14.

90 Pîrbal, 2000, r. 14.

91 H.b., r.13.

92 M.Ali Kut, http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=4430 (14 Mijdar 2012).

93 Aleksander Jaba, Çîrokên Kurmancî, Weşana Çanda Nûjen, Stockholm, 2000.

94 Duhokî, 2002, r.73-84.

hatiye amadekirin, wergerandiye li ser zimanê kurdî. Wî ev xebat di sala 1858an de tamam kiriye.

M. B. Rudenkoyê⁹⁵ hemî destnivîsê kurdî yê di pirtûkxaneyê bi navê M. E. Saltîkova Şêdrînê ev destnivîsa Şerefnameyê ya bi zarê kurmancî di nav destnivîsên rojhilatê yê kevn de hatiye arşivkirin berhev kirîne. Di sala 1986an K. K. Kurdoev û C.J. Mûsayêlyan ev paşmayê Kurdan û destnivîsan berhev kirine û pêşgotineka hêja nivîsîne. Ev berhema wergera Mela Mehmûdî ji farisî kiriye di du-sê berpera de hevber kirin. Dû re bi navê “Mela Mehmûdê Bazîdî Tewarîxî Qedîmi Kurdîstan” li Moskovayê belavkirin.⁹⁶ Di van salên dawiyê de kurdnasê hêja J. S Mûsaelian lêkolînek li ser vê wergerê kiriye û bi pêşgotineka xwe û ya K. K. Kurdoev a muşterek orîjînalê wê ya kurdî daye çapkirin. Ev çap di 1986an de li Moskovayê pêk hatiye

Sala 1860î rojhilatnas û karbidestê Akademiya Zanyarî ya Rûsyayê F. Viljainov Zernov(1830-1914) cilda Şerefnameya ewilî li Peterburgê da weşandin. Wî bi vê re pêşgotineka bîst rûpel a lêkolanê ya hêja bi zimanê fransîzî jî pêşkêş kir bahsa xebatên li ser Şerefnameyê ên heta dewra wî, hin agahdariyên li ser nusxeyên destnivîsên Şerefnameyê û qîmeta wê ya zanistî ya di dîroka gelên Rojhilata-navîn de kiriye.⁹⁷ Wî wergera xwe ji ber çapa farisiya Zernov amade kiribû, lê ew dabû ber du nusxeyên destnivîsên din jî.

2. 5. Rêzimanê Erebi bi Zimanê Kurdî

Ev kitêb di eslê xwe de ya Elî Teremaxî ye. Lê Mela Mehmûdê Bazîdî ew ji nû ve bi rêkûpêk kiriye, nivîsandiye û pêşgotinek jê re amade kiriye. Paşî ev pêşekî Jaba dixe nav maqaleyên Camî'eya Risaleyan û Hikayetan.⁹⁸ Navê kitêbê yê orîjînalê ev e: “*Serf û Be'dê Usûl Lazimeyê Te'lîme Bi Zimanê Kurmancî*”. Ev pirtûk yekemîn çavkaniya gramerî bi zimanê kurdî ye.⁹⁹

Jaba, destnivîsek vê berhema Elî Teremaxî jibo rojhilatnasê elmanî Bernhard Dorn ji melayekî ji xelkê Hekarî dixwaze ku bifroşê. Melayê Hekarî ev destnivîs nafroşe wî lê belê dide Mela Mehmûdê Bazîdî. Bazîdî ev destnivîs li sala 1857 an bi

95 Pîrbal, 2000, r. 20.

96 Se'id Dêreşî, 2007, r. 9.

97 Rohat Alakom, Efsaneyê Qanadê Kurdo, Lêkolînek li ser Qanadê Kurdo <http://netkurd.com/?mod=news&option=view&id=8494>, (01.03.2013).

98 Pîrbal, 2000, r. 14.

99 H.b., r. 14.

pêşkekî jiyana Elî Teremaxî û derbarê jiyana dînî û rewşenbîrî û di wê serdemê de dersxwendina di mizgeftan de dinivîse.

Wêjekarê kurd ê navdar Mela Mehmûdê Beyazîdî di sala 1274ên koçî de, ku beramberî bi 1857-1858ê zayinî dike, pêşgotinek li ser vê pirtûkê nivîsandiye û pirtûk wekî destnivîsek teslîmî Qonsolosê Rûsî yê bajarê Erzeromê Aleksander Jaba kiriye. Ev destnivîs bi frensiwî “Gramaire Kurde par Alî Teremakhi offert a l Academie Imperial des Sciences a St- Petersburg par A. Jaba” ye.¹⁰⁰ Maruf Xeznedar ev destnivîsa ku li Lenîngiradê di Pirtûkxaneyê Amojgeha Rojhilatnasî ya girêdayê bi Akademiya Zanistî ya Sovyetê de bi hejmara C1958 hatibû qeydkirin, di sala 1971ê de bi dest xistiye û di eynî salê de bi navê “*Destûra Zimanê ‘erebî Bi Kurdî: Eliyê Teremaxî*” li Bexdadê daye çapkirin.

2. 6. Mem û Zîn

Li gorî çavkaniyên di destê me de ye, ev berhem, yekemîn çîroka hunerî ye ku bi hêmanên nûjen û di sedsala XIXan de hatiye nivîsandin¹⁰¹ Mela Mehmûdê Bazîdî, berhema hêja û giranbiha a Ehmedê Xanî Mem û Zînê, kiriye forma çîrokê û wê jî weke berhemên dinê radestî Jabayî kiriye. Reşîd Findî ji bo vê çîrokê dibêje, nusxeyek ji wê çîrokê di pirtûkxaneyê Petersburg a Rusyayê û nusxeyeka di jî li pirtûkxaneyê Longezê li Parîs a Fransayê¹⁰² 1960î de Rudenko digel pêşkekê li Moskowê ev diweşîne.¹⁰³

2. 7. Yusif û Zuleyxayê

Destana şîrî ya mesnewî ya di salên 1586-1587an de Selîmê Silêman nivîsiye Mela Mehmûdê Bazîdî kiriye çîrok. Di dawiya vê berhemê de Mela Mehmûdê Bazîdî dibêje mesnewiya Selîmê Silêman ya 1711 beytên pêkhatî girtiye. Kurdnasa rûs Rudenko di sala 1963yan de teza xwe li ser vê destanê daye û 1970yî de weşandiye.¹⁰⁴

2. 8. Çîroka Şêxê Senan

Berhema helbestî ya Feqiyê Teyran Mela Mehmûdê Bazîdî kiriye çîrokî. Ev berhema evînî û dînî û sinetî di 1860î de nivîsiye. Rudenko 1960î de digel pêşkekê li Moskowê diweşîne.¹⁰⁵

100 Bnr. H.b.14.

101 Cewherî, 2003, r.37-58.

102 Pîrbal 2000, r. 9-30; Findî, 2010, r. 3-4.

103 Pîrbal 2000, r.19.

104 H.b., r.19.

¹⁰⁵ Kurdo, 1992, r. 21.

2. 9. Destana Kela Dimdimê

Ev çîrok di nav Cami'îya Risaleyan û Hikayetan de cih digre. Çîrokeke lehengî û berxwedanê ye. Di dawiya çîroka xwe de Bazîdî jî zikir dike ku ev destan ji hêla Meleyê Bateyî jî û ji devê dengbêjan jî hatiye ristin û di meclîsan de hatiye xwendin guhdarî kiriye.

Dû re bi vê mijarê Mustafa Salîh Kerîm di sala 1960î, Ordîxanê Celîl di sala 1966an Ereş Şemo di sala 1966an û Jan Dost jî di 2011ê de berhemên xwe weşandin.

2. 10. Çîroka Leyla û Mecnûn

Berhema şîrî ya Harisê Bedlîsî Rudenko 1960î de digel pêşkekê li Moskowê diweşîne. Jaba¹⁰⁶ jî bo Leyla û Mecnûna Bazîdî kiriye çîrok dibêje Bazîdî ji ber mesnewiya Fizûlî; Rûdenko dibêje ji Harisê Bîtlîsî wergirtiye. Ev destnivîsa Bazîdî dendikek li pirtûkxaneyê Petersbûrgê bi jimara Kurd- 31ê tê parastin, yek jî li Parîsê ye. Ev destxeta çîroka duyemîn a kurdî ye.¹⁰⁷

Mela Mehmûdê Bazîdî, ji xêndî berhema hêja û giranbiha a Ehmedê Xanî Mem û Zînê, Yusif û Zuleyxa ya Selîmê Silêman, Leyl û Mecnûn ya Harisê Bedlîsî, Şêxê Senana Feqeyê Teyran; Bersîsê Abid, Qewlê Hespê Reş û Zembîlfiroş jî wekî çîrokî nivîsandiye. Temamê berhemên jî ji aliyê A. Jaba wergera wan a fransîzî hatine kirin. Jaba, pêşgotinekê jî ji wan re nivîsandiye û pişt re jî ji Akademiya Zanistî ya Petersborgê re şandiye. Di berhemên ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin û ji aliyê A. Jaba ve wergera wan a fransîzî hatine çêkirin de, gelek caran, Mela Mehmûdê Bazîdî jî ji bo danefehimkirina kurdiya wan, alîkariya Jabayî kiriye.¹⁰⁸

Belê, em bi awayeke ronî dibînin ka vî zana, rewşenbîr û alimê mezin çiqas xebat kirine û di navbera wan çend salan de çiqas berhem afirandine. Berhemên ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatine amade kirin, hemû ji aliyê A. Jaba ve wergera wan a fransîzî hatine çêkirin û ji piraniya wan re bi fransîzî pêşgotin jî nivîsandine û ji Akademiya Zanistî ya Petersborgê re şandine. Gelekê van berhemên, di çarçoveke teng de be jî hatine çapkirin û belav kirin. Lê gelek jê jî hene hê kesekî dest lê nedaye.

106 Pîrbal, 2000, r. 13.

107 H.b., r. 13.

108 Pîrbal, 2000, r. 9-30; Bazîdî amd. Ziya Avcı, 2010, r.11-14.

Mela Mehmûdê Bazîdî, Kitêba Mewlûda Şerîf a wergera kurdî jî nivîsandiye. Destnivîsa jimareya (Kurd 19) Mewlûda Şerîf a Bazîdî di sala 1858an de nivîsandiye.¹⁰⁹

Mela Mehmûdê Bazîdî, gelek berhem ji zimanê tirkî, ‘erebî û farisî jî wergerandine li ser zimanê kurdî. Destnivîsa jimareya (Kurd 49) el mecals çîrokên Millî ên ji Mela Mûsayê Hekarî standiye û ji farisî wergerandiye. Şîrîn û Ferhad, Yusif û Zilêyxa, Zuhakî Paşa, Rustem, Newşîrwan û Darewan, Bûk gwasteway Cengîz Xan. Destnivîsa jimareya (Kurd 6) bi navê “Sefhe Sibyan” ê ku nivîskarê wê naye zanîn bi xetê xwe Mela Mehmûdê Bazîdî nivisiye.¹¹⁰ Destnivîsa jimareya (Kurd 46) Bayezîdî di 1867an de nivîsiye. Destnivîsa jimareya (Kurd 43) heştê û çar çîrokên farisî kiriye kurdî, Jaba jî ew wergerandiye frensî. Destnivîsa jimareya (B3971) wergera Mela Mehmûdê Bazîdî ya Gulîstana Sa’diyê Şîrazî ye.¹¹¹ Ev destnivîsên navborî li pirtûkxaneyê Saltikov Şîdrîn e.

Mela Mehmûdê Bazîdî, di van xebatên xwe de nexwestiye navê xwe yê rastî bikar bîne. Tê gotin ku ev ji ber sebebê xweparastina ji gotegoteyên di nava xelkê de bûye. Yanî nexwestiye xelk li dîwanxaneyan û li kolanan, bêjin ku Mela Mehmûdê Bazîdî bi kesekî ne misilman re di nava teşwîkê mesayiyê de ye û ji ber vê di van xebatên xwe de navên wekî, “Mela Efendî, Hacî Mehmûd Efendî” bikar aniye. Gelek caran jî, wekî A. Jaba bi xwe jî dibêje, qet nav bikar neaniye.¹¹²

109 Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010, r.11-14.

110 Pîrbal, 2000, r. 19.

111 H.b., r. 19.

112 Pîrbal 2000, r. 9-30; Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010, r.23.

BEŞA DUYEMÎN

DI DESTPÊKA SEDSALA NOZDEHAN DE ÇÎROKNÛSIYA ROJHILATA NAVÎN

Mebesta me ya di bin vê serenivîsê de ev e ku, em berê objektîfê bidin ser hemdemên Mela Mehmûdê Bazîdî. Em difikirin ku, heta ku em berhemên Bazîdî û berhemên çîroknûsên cîranên xwe nenêrin, ew ê teza me yê kêmbimîne. Nêrîna ji gûçeke firehtir jibo şeweya Mela Mehmûdê Bazîdî hîn rastir bê analîzkirin lazim e.

Heta sedsala nozdemîn di wêjeya rojhilatê de helbest xwedî payeyeke bilind bû. Vê cureya wêjeyê ji aliyê wêjevanan gelekî dihat hebandin û ristîn. Cureyê çîroka nûjen li rojava di sedsala hevdemîn de destpê kiribû. Lê heta sedsala nozdemîn, rojhilatî êdî hay ji paşdemayîna xwe ya modernî û teknolojikî bû. Pê hayjêbûnê jî, heyranîyak li hember çanda rojavayî çêbû û ronakbîrên rojhilatî dest bi şopandina rojava kir. Bi vî awayî dîroka çîroka modern li rojhilatî destpê kir. Li jêr yeko yeko em li ser çîroknûsiya cîranên kurdan sekinîn û me hewl da ku pêwendîya wan û çîrokên kurdî derxin holê.

1. Çîroknûsiya ‘Erebî

Di sedsala nozdemîn de bi dagirkeriya fransewîyan re ‘ereb hem ji aliyê politîk hem jî ji aliyê aborî ketin bin desthilatdariya fransewîyan. Ji wir pêv de êdî di warê wêjeyê de ketin pêvajoyeke dinê. Çîroka ‘erebî xwe ji bandora destanî difilitîne û ber bi çîroka Ewropayê gav davêje.¹¹³ Ji vê heyamê pêve bi dibistanên nuh, şandina xwendekarên li Ewropayê, faalîyetên wergerê yê Râfî‘ et-Tahtâviyê Misirî (1801–1873), piştî di sala 1822yan de çapxaneyê Muhammed Ali Paşa ku li Bulakê saz kir û pê re pêşdeçûna rojname û kovarê bûye sedema ku gihaştina nîfşên nuh. Ev nivîşên nuh berê xwe dan Ewropayê û berhemên îngilîzî û frensî bi zimanê orjînal xwendin û wergerên wan kirin. Sedem ev e ku di wêjeya ‘erebî ya modern de çîrokên pêşîn hîn bêtir wergerên çîrokên îngilîzî û frensî û adaptasyon bûn. Ev nîfş di wergerê de gelek carî sadiqî metnê jî nediman carinan li gorî dilê xwe û çanda xwe li ser wê leyistinan dikirin. Carinan jî di binê berhema ku wergerandibûn ser zimanê xwe de ji dêvla nivîskêr înzeya xwe davîtin.¹¹⁴ Temasa bi wergerê çêdibe berê bi şiklê teqlîdê xwe rêdide. Pêvajoya pê teqlîdê êdî berhemên ‘erebî ên orjînal derdikevin.

113 Hüseyin Yazıcı, Çağdaş Arap Öyküleri, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 1999, r. 7-19.

114 Yazıcı, 1999, r. 7. ; Ahmet Hamdi, Can, Zekeriyâ Tâmir ve ‘İbâdullâh Adli Eserinin teknik ve Tematik İncelenmesi, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Atatürk Üniversitesi Erzurum, 2006, r. 9.

Çîroka modern berê li Misirê dixuye, paşî li heremên dinê belav dibe. Piştî ev serdema pêşîn çîrok wekî cureyeke modern bi nivîskarên wekî Halil Mutranê Lubnanî (1871-1949), Cîbran Halîl Cîbran (1883- 1931), Mustafa Lutfî el Menfûtî (1876-1924), Muhammed Huseyin Heykel, (1889-1956), Taha Huseyîn (1889-1978) û Îbrahîm el Mâzînî (1905-1968) hin şexsiyetên balkêş tên naskirin in. Bandora temasa bi wergerê di wêjeyê de berê bi şêweyê texlîdê dûra ber bi orjînalîyê xwe rê da.

Yazıcı¹¹⁵ gotinên Makî, al-Tahir Ahmad neqil dike û dibêje: “ Di dîroka ‘ereban de rasterast çîroka kurt di bin tesîra Ewropa de derketiye holê. Di wêjeya ‘erebî ya modern de, bingeha çîroka kurt, bi qasî makamat, efsane, çîrokên lehengî, gotinên pêşiyîyan tune ye.”¹¹⁶ Ji wêjeya ‘erebî re pêşengiya nivîskariya çîroka kurt, Salîm Butrus al Bustanî dike. Bustanî 1870yê de kovara al- Canan derxistiye. Di vir de bînavber gotar û çîrok nivîsandiye çîroka yekemîn “Ramyatûn min gayrî ramîn” a di 1870yê de nivîsandiye.¹¹⁷ Li Misir û Lubnanê ji 1870yê heta 1914an bi hezaran çîrok li kovar û rojnameyan de hatiye weşandin. Ji nav romanûsan Corcî Zeydan¹¹⁸ (1861-1914) wekî nivîskarê pêşengiya romana dîrokî kiriye tê pejirandin. Zeydan, 1892yan de di kovara wêjeyî ya mehane de ya bi navê “ El Hîlal “ ava kir.

Bandora Aleksandre Dûmas, hem ji aliyê tevna mijarê û hem jî ji aliyê hûnandina wî ya dewlemend di berhemên Corcî Zeydan de zêde zêde beloq e.¹¹⁹ Nivîskarê bi navê Farah Antûn jî wekî Corcî Zeydan romanûsekî ‘ereb û xirîstiyîyan e. Ew nivîskar jî di bin bandora J.J. Rousse de ye.¹²⁰ Balkêş e nivîskarên pêşengê romana dîrokî ya ‘erebî, ji nav nivîskarên ‘ereb ên xirîstiyîyan derketiye. Ev encam dibe ku weha bê şîrovekirin, ronakbîrên wekî wan ji aliyê olî bêtir bi rojava tîkîlî danîbûn ji ber wê jî bondora çanda Ewropayê hîn bileztir tesîr li van nivîskarên hate qalkirin kiriye.

Bi berhema Muhammed Taymûr (1892-1921) ya bi navê “ Fî al-Kitâr” (1915an de nivîsandiye) çîroka modern ya ‘erebî dest pê dike.¹²¹ Du salan pê çîroka Siwêşa Fûat Temo hatiye nivîsandin. Muhammed Taymûr her wekî hem çaxê xwe ji xêndî ‘erebî, bi

115 Yazıcı, 1999, r. 8.

116 Yazıcı, 1999, r. 8 de pêwendiyê bi - Makî, al-Tahir Ahmad, al- Kissa al- Kasîra, Dâr al- Macarif, çapa 5., Kahire, 1988, r. 86- re datîne.

117 H.b., r. 8.

118 Jacob M. Landav, Modern Arap Edebiyatı Tarihi, wer. Bedrettin Aytaç, T.C. Kültür Bakanlığı Dünya Edebiyatı, Ankara, 2002, r. 8-10.

119 H.b., r. 8-10.

120 H.b., r. 8-10.

121 Yazıcı, H.b. 1999, r. 8; Can, 2006.

zimanê farisî û tirkî jî dizane. Bi giranî di bin tesîra wêjeya fransî û di bi bin bandora Maupassant de maye.¹²²

2. Çîroknûsiya Farisî

Li gorî lêkolînavên Îranê berî Îslamiyê li Îranê du cure pexşan hebû. Nivîsên dîrokî û nivîsên rêveberî.¹²³ Ji qebûlkirina wan a misilmantiyê heta sedsala 9an çend beyt û çarînên bêqiyet pêve tiştê rast û dirust nemaye.¹²⁴ Di sedsala 9an pê ve bi helbestê re pexşan jî pêşdikeve berhemên herî bi qîmet wergerê ji ‘erebî ne.¹²⁵

Zimanê hunerî û ilmî ya rojhilata navîn piştî Îslamiyê re dibe zimanê ‘erebî. Hinek ziman her wekî zimanê sasaniyan jî holê radibe. Hinek jê jî hêdî hêdî dikeve bin bandora zimanê ‘erebî. Di vê heyamê de zimanê kurdî jî nesîba xwe girtiye. Gelek alim û zanayên me berhemên xwe bi zimanê ‘erebî dane. Muhemad-i Îsti’lâmî ji bo zimanê sasaniyan û bandora ‘erebî de mînakê ji Tarîhî Sîstan¹²⁶ berhema Meliküşşueral a Muhammed Takî Bahar dide û dibêje: Yakûb-i Leys dema Herat fetih dike helbestvanê Sîstanê bi ‘erebî helbestên pesnê wî nivîsandine. Lê, wî gotiye ku “piştî ku min fam nekir çi giringiya gotinê we heye” piştî vê katibê seraya wî Vasif-i Sîstanî jê re helbesteke bi zimanê wî gotiye.¹²⁷ Muhemad-i Îsti’lâmî¹²⁸ li di deheqê bandora ‘erebî ya li ser berhemên farisî û kêmbûna berhemên bi zimanê farisî wiha dibêje:

“ Zimanê sasaniyan bi hatina ‘ereban re yekcarekê de nemiriye li Îranê ji 400 salî bêtir bi vî zimanî hatiye axaftin û berhem hatine dayîn. Îroj jî ji wê demê çend berhemên giranbuha yên bi Pehlewiya Sasaniyan di dest de ye. ‘Ecêb e digel bi zimanê Pehlewî, bi zimanê farisî berhem nehatiye dayîn. Bêgûman hin berhem hatiye nivîsîn dû re wenda bûye. Ji ber ku heta sedsala dehan ehlê xwedî zewq û xwendin û nivîsînê zanîbûn destên xwe wê nedabin ber rûyê xwe tiral tiral wê rûnenîştibin.”

Dîsa di sedsala bîstan de bi çûn û hatinê têkiliya Ewropayîyan û Îraniyan bi sedemên eskerî û siyasî çêdibe. Bi vê munasebetê pêşketina Ewropayê bala Îraniyan jî

122Musa Yıldız “ Arap Edebiyatında İlk Modern Kısa Öykü, Muhammed Teymûr’un Fî’l-Kitâr’ı” Nusha, Yıl, II, Sayı 4, Kış, 2002, r. 45-57.

123 Muhemad-i Îsti’lâmî, Bugünkü İran Edebiyatı Hakkında Bir İnceleme, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1981, r. 8.

124 Muhemad-i Îsti’lâmî, r. 10.

125 H.b., r.24.

126 Muhammed Takî Bahar, Meliküşşueral, Sebkişinas Bâhar, c. I. – III.

127 Muhemad-i Îsti’lâmî, r. 209.

128 H.b., r. 213.

dikişîne. Cara pêşîn Nasiruddîn Şah diçe geşta Ewropayê û ferqa di navbera Ewropa û Îranê dibîne. Hinek şahên ku modernîzma rojavayê dibînin û dixwazin bînin welatê xwe çêbûne. Yek ji wan Abbas Mîrza ye ku, gelek reforman pêk aniye matbaaya ewil aniye welêt, xortan ji bo perwerdeyê şandiyê Ewropayê. Ji wan xortan yek Mîrza Salih Şîrazî yekemîn rojnameya farisî derxistiye. (Kaxizî Ahbar)

Romanûs û çîroknûsên pêşîn ên wekî Âhûnzâde, Talîbov û Merêgaî yan Penaber in yan jî wekî Mîrza Hebîb-î Isfahânî û Mîrza Âxâ Xan-î Kirmanî mişextî nin. Çîroka nûjen her wekî cureyên wêjeyê yên ku ji rojava herikiye nava wêjeya farisî bi vê munasebetê ye. Çîroka pêşîn a bi şeweya Ewropayî hatiye nivîsîn çîroka Seyîd Muhammed Elî Cemalzade (jidayikbûn 1891) ya bi navê yekî bûd yekî nebûd e (yek hebû yek tune bû).¹²⁹

Ji bo hûrnêrîna li romanên ewil yên îranî, divê meriv vegere li salên 1870yî. Sala 1874an Mîrza Cafer-i Karacadaxî, Mîrza Fethali Âhûnzade(1812-1878) Stâreganî Firîbharde û çîroka xwe yî bi navê hikaye-i Yusuf Şah ji azerî werdigerîne farisî. Bi bahaneya çîroka dîrokî rastiyên nexweş ên dema xwe bi zimanekî rexneyî radixe ber çavan. Nivîskariya Âhûnzade di atmosfera çanda Tiflîsê lê di bin bandora wêjeya Rûsan de digihêje.¹³⁰

3. Çîroknûsiya Tirkî

Di sedsala nozdemîn de Împaratoriya Osmanî, her wekî ji aliyê çandî û civakî guheriye, ji aliyê wêjeyî jî xwe guheriye. Roman her çiqasî li Bîrîtanyayê caciro dabe jî, demeke bondor li cîranê xwe Fransayê jî nekiriye, demeke dirêj li wê derê jî pêş de neketiye ji bo rabûna hostayên serketî û derketina berhemên hunerî yên girîng li hêviya Şoreşa Burjuwayê maye. Li tirkî jî heman rewş xuya ye. Heta ku bi Tanzimatê re bingeha pergala burjuwayê nehate danîn tu roman nehate nivîsîn. Piştî derbasbûna Tanzimatê re jî roman nivîsîn ewqasî hêsan nebû ji ber ku hin şert ne têr bûn. Bi tirkî roman ji aliyê nivîskaran ne ji bo ecibandina kitleya xwendevanan, ji bo li rojava dihate nivîsandin, hate nivîsandin.¹³¹ Çîroka rojavayî ji derketina wê ya di destpêka sedsala hevdemîn heta dawîya sedsala nozdemîn, bi gelemperî terza realîzmê bikaraniye. Romanên kurdî yên ewil xusûsî ramanên sosyalîst realîst in. Sedema wê ji ya wêjeyî

129 Mehmet Kanar, Çağdaş İran Öyküleri, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 1999, r. 7; Mehmet Kanar, Modern İran ve Afgan Öyküleri Antolojisi, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1995, r. 9.

130 Hasan-i Mîr Âbidînî, İran Öykü ve Romanının Yüz Yılı I. Nüsha Yayınları, Ankara, 2002, r. 5.

131 Murat Belge, Edebiyat Üzerine Yazılar, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2009.

wêdetir e. Bi gotineke din derketina romana kurdî wek romana rojavayî rasterast ne encama guherînên civakî û epîstemolojîk ên hundurîn bûn. Li yekîtiya Sowiyetan piştî Şoreşa Cotmehê di sala 1917an de romana kurdî derket.¹³²

Di gelek çavkaniyan de tê pejirandin ku yekemîn romana tirkî ya bi şeweyê rojavayî hatiye nivîsandin, Ta'aşşuk-i Tal'at û Fitnat'a Şemsettin Sami (1288/1872) ye. Lê berî romanê, mînakên çîrokê ên di dawiya sedsala XIXan de wekî mînakên pêşîn ên ji wêjeya dîwan û gelerî bi dûr dikeve û nêzikî romanê dibe derdikeve holê. Ev berhemên di navbera çanda devkî û nivîskî de ne, şopên rengên wêjeya Imparatoriya Osmanî di hundirê xwe de dihewîne. Berhemên bi navê "Muhayyelat" (Azîz Efendî, 1268/1796), "Akabi Hikayesi" (Vartan Paşa, 1851), "Hayalat-i Dil" (Hasan Tevfik, 1285/1868), "Musameretname" (Emîn Nîhat Bey, 1288-1292/1872-1875), "Temaşa-i Dünya ve Cefakar" û "Cefakeş" (Evangelinos Misailidis, 1872)¹³³ di navbera wêjeya dîwan û gelerî û wêjeya nûjen de ye. Bi îfadeyeke din, ev çîrok li êwra di navbera çanda klasîk û wêjeya nûjen de ne.

Nivîskarên hemdemê Mela Mehmûdê Bazîdî Bazîdî yên di wêjeya tirkî de Emîn Nîhat Beg, Şînasî, Ziya Paşa, Ehmed Mîthat Efendî, Ehmed Vefik Paşa û Reçaîzade Mehmûd Ekrem in. Çîroka tirkî ya nûjen li derdora 1870yî dest pê dike. Di 1873yan de yekemîn pirtûka çîrokan, Mûsameratnâmeya Emîn Nîhat Begê, hate weşandin. Berhem ji 12 parçeyan pêk tê. Di naveroka vê pirtûkê de çîrokên şevên dirêj ên di zivistanê de tînen vegotin hene. Muhayyelat'a (1868) Azîz Efendî, mînakek dinê ya bi terza rojavayî hatiye nivîsîn tê hesêbandin. Mûsameretname'ya, Emîn Nîhat (1872), Kırk Ambar'a Mîthat Efendî (1873) tev jî bi kokên xwe ve girêdayîne. Ji bo şîretan hatine nivîsîn. Ev çîrokên navborî tev jî wekî pirên çîroka modern in.¹³⁴

Wekî em ê hîn berfirehî îzah bikin hin çîrokên Bazîdî ji aliyê mijarî, bingeha xwe dispêre berhemên mesnewî. Ev terza ku mijarê ji mesnewiyan wergirtin di dawiya sedsala XIXan de tê dîtin. Wekî mînak Musameretnemeya Emîn Nîhat Begê de ev şeweyê hatiye bikaranîn. Bi awayeke belok di berhema wî ya bi navê "Kapı Kethudası Behçet Efendi ve Makbule Hanım'ın Serguzeştî" de xuya ye ku, mijarê ji mesnewiya wêjeya

132 Ahmedzade, 2011, r. 18.

133 Gonca Gökalp, "Osmanlı Dönemi Türk Romanının Başlangıcında Beş Eser", Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi, Osmanlı'nın 700. yılı Özel Sayısı, Ekim, Ankara, 1999, r. 185-202.

134 Ayşenur İslam Külahlıoğlu, "Modern Türk Hikâyesinin Kısa Tarihi", Türkler Ansiklopedisi, Cilt 21. Ankara, Yeni Türkiye Yayınları, 2002.

dîwanê “Leyla û Mecnûn” standiye. Mijara vê çîrokê bi kurtasî ev e: Behçed Beg û Meqbûle Xanim Li Dibistana Sibyanan hevdu dibînin û ji hev hez dikin. Lê dema evîna wan li der dorê têbihîstin, paşgotinî belav dibe. Ev paşgotinî, heta digihêje guhê malbata Meqbûle Xanimê. Ji ber van paşgotiniyan Meqbûle Xanimê ji dibistanê digrin ... û çîrok her wekî çîroka Leyla Mecnûn wisa dom dike. Ji xêndî navê kes û cihan hema hema çîrok yek e.¹³⁵

Wateya navê Musameretneme-yê çîrokên şevê ye. Wekî ji nav jî diyar dibe Emîn Nîhat Begê xwestiye berhemek wekî Decamerona Bocacio bide. Ev rastiya teqlîtbûna wê ji hêla gelek nivîskarên jî tê pejirandin. İbrahim Yıldırım¹³⁶ weha dibêje: “Wekhevîna her du berhemên Giovanni Bocaccio û Emin Nihad Beg li gorî zanebûna me, qet ne bêhemdî (tesaduf) ye.”

Di çîrokên Musameretname-yê de terza vegotina macerayê hakim e. Tevan de jî wekî meddahêkî dixwaze xwendevanan têxe nava meraqê û heyecanê û vî awayî bûyerê biherikîne. Hîn jî tewira wî xwedî ehlak û dîdaktîk e. Di hin çavkaniyan de Musameretname bi Decamerona Bocacio tê şibandin û rûberhevkerin¹³⁷ di hinan de jî ji hêla vegotina gelerî ya rojhilatî tê nirxandin¹³⁸ hinek jî wekî di navbera her duyan de be ciyê ku hevdu dibire dinirxîne.¹³⁹ Musameretname mînakeke balkêş ya di navbera vegotina gelerî û kevneşopiya vegotina rojhilatî û terza vegotina rojavayî ye. Berhem bi şeweya çerçoweya vegotinê û rojhilatî ye. Bi vegotinê jî nêzîkî çîroka gelerîbûnê û terza çanda devkî ya tirkî ye. Vegotina pirsgirêkên rojevî, ferasetek nuh e û terza rojavayî ye. Bi vê hela xwe jî digihêje ber bi terza rojavayî. Dem dem wekî meddahan heyecanê zêde û kêmdike, dem dem jî wekî romanûsan hûr û kûr dirêj dirêj vedibêje. Heta di plana dawî ya çîrokên xwe de rexneyan li pirsgirêkên civakî, zewac û esaretê dike. Ew hêl jî wî nêzî vegotina rojavayî dike. Li gorî gelek ronakbîran “Musameretname” wekî texlît bê binavkerin jî qiymeta wê jî înkâr naye kirin. Wekî Ekrem Işın jî dibêje: “Cihê

135 Emîn Nîhat Beg, Musameretname, Cuz II.

136 İbrahim Yıldırım, Müşteki Aşklar Kitabı Musameretname'nin Muharriri Emin Nihad Bey Kimdir?, Altıkitap Yayınları, 2003.

137 Boratav, 1991, r. 310; Robert, Finn, Türk Romanı (İlk Dönem, r. 1872-1900), wer. Tomris Uyar, Cilt I, Ankara, 1984, r.33.

138 Tanpınar, 1985, r. 289.

139 Kudret, 1979, r. 58.

Musameretnameyê di wêjeya Tanzîmatê de, asta şikestina vegotina gelerî û li noqteya derizînê de ye.”¹⁴⁰

Muhayelat di dawiya sedsala XIXan de hatiye nivisîn. Di wêjeya tirkî de berhema yekemîn a vegotina nivîskî ye.¹⁴¹ Ji alîkî Muhayelat werger û adaptasyon e, ji alîkî jî berhemeke orjinal e. Hem berhemeke nivîskarekî ye, hem jî anonîm e. Hem çîrçîrok e hem jî çîrok e. Hin kes vê berhemê dixin kategoriya çîrçîrokan hin jî tevî ku tekîliya wê û çîrçîrokan bipejirînin jî li aliyên wê yî resenî îşaret jî dikin.¹⁴² “Gerdanlık Hikayesi” (Çîroka Gerdeniyê) ya Emîn Nîhat Begê jî dîsa texlîdek ji çîroka Alexandre Dumas Fils e.

Li gorî Tietze'yî¹⁴³ vegotinên Azîz Efendî yên rasterast çîrokên hezar û rojekê ev in: Ferruhnaz ile İklilülmülk, Hoca Abdullah, Şabur ile Hüma, Nacibillah ile Şahide, Prens Asil, Firuz Şah, Karahan, Situ Emine û hinek ji kissayên Gazanfer û Rahile'yê; yên ji çîrokên hezar û şevekê çîroka Kamercan û Gülruh, Abdüssamed, macerayên Prens Nesil û Alemara'yê; ya di bin bandora çîrokên tirkî yên gelerî de ye jî, çîroka “Kissa-i Receb Beşe” ye.

Azîz Efendî di pêşgotina pirtûka xwe de bi xwe dibêje berhemên bi navê Hulasatü'l-Hayal, İbretnüma û çîrokên hezar û şevek xwendiyê û ketiyê bin bandora wan û dû re dest bi nivîsandina Muhayyelatê kiriye.¹⁴⁴ Bandora çîrokên hezar û şevekî ya li ser Muhayyelatê hem ji aliyê şeweyê hem ji aliyê mijarê hem jî asta motîfê bi eşkere li ber çavan e.

Berî Şînasî hindik nivîskaran bi zimanê ewropî dizanîbû. Heta ku ronakbîrên tirkî pêwendî bi Ewropayê nekirin bi terza tê qalkirin berhem derneketin. Xatrê weşanên siwîl jî divê neye jibîrkirin. Wekî tê zanîn Şînasî di çand û wêjeya tirkî de pêşengê gelek tiştî ye. Di Tanzîmatê de sê nesil hene dibêje Tanpınar¹⁴⁵ û berhemên wan li gorî neslê wan dinirxîne. Nesla ewil ya 1812-13-14 nesla Cevdet Paşa ye; yên di salên 1826 ji dayik dibin nesla Şînasî Ziya Paşa û yên 1840 de ji dayik dibin nesla Namik Kemal in.

140 Ekrem Işın, “Emin Nihat ve XIX.Yüzyılın Büyük Sorusu”, Oluşum, 44, Haziran, 1981, r.16.

141 Gökalp, 1999, r. 185-202.

142 H.b., r.185-202.

143 Gökalp, 1999, r. 185-202; Tietze, 1948, r. 308-311.

144 Gökalp, 1999, r. 185-202.

145 Tanpınar, 2004 24.

Her du neslên dawî perwerdeya medreseyê nedîtine, di terza perwerdeya nuh kemilî ne. Emîn Nîhad, Namik Kemal û Ahmed Mîthad romanûsên pêşîn tên hesêb û Namik Kemal jî wekî mucîdê pexşana nuh tê nasîn.

Her wekî tê zanîn uslûbeke çîrokên Servetî Funûn heye. Ji xêndî çend îstîsna bi gelemperî li Stenbolê derbas dibin. Kesen lehengê çîrokê tim arîstokrat û ronakbîrin. Lê wekî awarte lehengên Halîd Ziya ji her tebeqeyên civakê ne. Her wekî lehengên çîrokên Bazîdî Axa, mîr, paşa, gundî, derwêş, mele, diz, ciwan, ixtiyar, jin, keç yan zarok.in. Yanî wekî hemdemê xwe lehengê xwe tenê ji ronakbîr û tebeqeya bilind hilnebijartîye. Bi vî aliyê Halid Ziya Uşakligîl meriv dikare bişibîne Mela Mehmûdê Bazîdî. Wekî ew ê bê dîtin lehengên çîrokên Bazîdî ji her tebeqeyên civakê de ne. Di çîrokan de leheng hem ji aliman hem ji cahilan, ji zarokan, jinan, pîr, zilam, axa, xulam, beg heta ji padişahan pêk tê.

Di muqayesekirina çîroknûsiya Bazîdî û nivîskarên hemçaxên wî ên ‘ereb, faris û tirk de wekî li jor jî hate analîzkirin, çîrokên Bazîdî, li gorî demê têra xwe pêşketî û nûjen in. Li aliyê din ne ji aliyê teknîk û ne jî ji aliyê formê ve li paş in. Hetta em dikarin bêjin Bazîdî, di vî warî de gellekî li pêş e. Lewre ne nûnerê şêweya çîrokên modern Kafka, ne Çexov¹⁴⁶ ne jî nûnerê terza bûyerê Maupassant¹⁴⁷ di çaxa Bazîdî de berhem dabû ku em bêjin dibe ku ji wan sûde wergirtibe. Ferqa Bazîdî jî ev e. Ji ber ku Bazîdî di bin bandora çanda kurdî gelerî û klasîk de ye, wekî nivîskarên hemçaxên xwe neketiye bin bandora Ewropîyan û wî wekî wan, mînakên rojava ji xwe re nekiriye mistere. Ferhad Pîrbal balê dikişîne ser serketîbûna çîrokên Bazîdî û ji bo serketîbûna çîrokan weha dibêje:

“Eger bêjin teknîk û formê vegêranê di vê çîrokê de, kevn û folklorî ye hingî divê bizanin ku di sala 1856an de, ev teknîk û formê vegêranê di nav tevaya edebiyata cihanê de hebû û hingî ne Mapupasan û ne jî Çehov hebûn. Her wisa hemî mercên çîrokê tê de hene, wek (hîbke û lêkdayîn, rûdan, palewan, girê, destpêk, dialog, monolog û dawî)”.¹⁴⁸

146 Terza Çehov, bi vê şêweyê çîrok ne bûyerê, beşeke ji jiyana rojane vedibêje. Bi plana destpêk bûyer û çareseriyê ve xwe girênade. Tu encamên bellî jî tune ne. Ji meraq û heyecanan bêtir cî dide hêst û xeyalan. Herikandina rewş û bûyeran ji hêza xeyalên xwendevanan re tînin hiştin.

147 Çîroka bûyerê, li pê çîroka gelerî derketiye û ev şêwe bi navê terza Maupassant jî tê nasîn. Çîroka bûyereke bi pîlana raxistin, girêk û çareserî vedibêje û biencam dike.

148 Duhokî, 2002, r. 73-84.

Ayhan Geveri¹⁴⁹ di meqaleya xwe ya bi navê “Di notên li ser wêjeya kurd û tirkî ya klasîk de mijara muqayeseya Mem û Zîn û Husnû Aşk” de “Mem û Zîn”a mesnewiya Ehmedê Xanî û “Hüsnu Aşk”a Şêx Galib dide ber hev û hem ji aliyê hunerê hem jî ji aliyê rêbaz û şêweyê Mem û Zîna Ehmedê Xanî ya berî Hüsnu Aşk a Şêx Galib 90 salî hatiye nivîsîn dide ber çavê xwendevanan. Önder Beyter ê ku di kovarekê de rûberhevkirina du berhemên sedsala XIXemîn de hatiye nivîsîn kiriye, (Mem û Zîn - Ta`aşuk- i Talat û Fîtnat) û gihîştîye hin encaman. Li gorî wî digel ku tevî ku Ta`aşuk- i Talat û Fîtnat bi donzde salan pê Mem û Zînê ye, ji aliyê şêwe, honandin, ziman, mijar û lehengan de ji hostatiya Bazîdî nabihure. Keda wî ya li gorî serdema xwe hêjayî pesnê ye.¹⁵⁰

Di mijara mukayeseya çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî û hemçaxê wî de hêja ye meriv qala çîroknûsê Çerkes Qalembiy jî bike. Di uslûba çîroknûsiya Qalembiy bi navê rastîn Ç`aşe Adalcery- (1840-1872) û Bazîdî de nêzîkîhevûneke balkêş bale dikşîne. Ev pêwendîya di navbera çîrokên Bazîdî û Qalembiy hem ji aliyê naverokê, hem ji aliyê lehengan hem ji aliyê vegotinê xwe dide dest.

Berhema Mela Mehmûdê Bazîdî ya herî dawî di sala 1860î de hat Petersburgê. Qalembiy dema 1860î de di zanîngeha S. Petersburgê Fakulteya Zanistiya Rojhilatî beşa Fîlolojiya `erebî, Farisî, Tirkî û Tatarî dest bi bi xwendinê kir gelo hay ji berhemê Bazîdî bû naye zanîn, lê li gorî me dikare li ser bê rawestin.

Qalembiy di berhema xwe de heta jê hatiye hewl daye ku çareserî ji pirsgerêkên civaka xwe re bibîne. Bi awayekî wêrek û helwesteke berpirsiyar tevgeriyaye. Çi rastî û şaşiyên ku di nava civaka xwe de dîtiye teyisandiye berhema xwe.¹⁵¹ Li hember adetên nerast ên dibin sedema şûndemayîna civaka xwe re têkoşiyaye. Di salên 1860î de mafên jinan, azadî û mafên kesayetî, modernî haniye rojevê. Di sala 1872yan de hîn di 32 saliya xwe de dimire.

149 Ayhan Tek, Mem û Zîn ve Hüsnu Aşk Karşılaştırması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar, http://www.academia.edu/891642/Mem_u_Zin_ve_Husnu_Ask Karşılaştırması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar, (17.03.2013)

150 Önder Beyter, “Zanista Edebiyata Rûberhevî/Muqayese û Rûberhevkirina Çîrokên `Ewilin ên kurdî (Mem û Zîn) û tirkî (Ta`Aşuk- i Talat û Fîtnat)

151 Qalembiy, Adige Xhibarxer Elbrus Txilhedzap`e, Nalçık, 1978, Türkçeye çeviri: İbrahim Abaze, Kafdav Yayınları, Ankara, 2010, r. 8-16.

Mînak di vegotina çîroka Cîndar¹⁵² de her wekî Bazîdî çavkaniya çîrokê dide nivîskar jî ji xalê xwe dibihîze û neqil dike. Di çîroka kukla (pipxe) de jî çîroka Nazîha beş bi beş ji dengbêjan guhdarî kiriye¹⁵³ û carekê rastê wê jî hatiye. Di çîroka kukla (pipxe)¹⁵⁴ dîsa trajediya jinekê kiriye mijar. Bavê wê ji bo ku xwestiyê wê mîrza ye. Nazîha ji ber adetan qedera xwe qebûl dike û bi mîrzayê pîr re dizewice. Dawiyê ji ber Nazîha bera pê xoşewîstê xwe dide. mêrê Nazîhayê xoşewîstê wê dikuje û serê pozê wê jê dike. Nazîha ji ber wê bûyerê êqil berdide.

Çîroka du mehên li gundî¹⁵⁵ li ser mijara bandora adetan ya li ser kesan hatiye hûnan. Leheng heta 18 salî li Petersburgê li dibistanek eskerî xwendiyê. Piştî du salan li N-Ulan eskerî dike û ji bo betlaneyê diçe gundê xwe. Ji ber ku zarokatiya wî li Rusyayê derbas bûye adetên milletê xwe hem nizane hem jî guh nadê. Ji vê sedemê jî her wekî mêvan be muamele dibîne di nav gundiyan xwe de. Dilê wî dikeve Zelîxayê lê ji ber ku li dij adetan tevdigere û zêde zêde ew û keçik tên cem hev û diçin ev yek tê çavên gundiyan. Xwediyê Zelîxayê didin mîrzayekî çiyayî ji ber ku keçikên wê civakê di zewaca xwe de ne xwedî peyv in sitûxwar raziye qedera xwe tê, bê dilê Zelîxayê wê didin mêr. Mijara vê çîrokê her wekî çîroka Bazîdî ya Polo û Barnikê de hatiye hûnan belengazbûna jinê ye. Jin di biryarên ser jiyana xwe de jî ne xwediyê rayeyê nin.

Mijara çîroka Akinciyan¹⁵⁶ jî ne xerîb e ji çîrokên Bazîdî. Di çîroka Akinciyan de mijar encama dizî û talanê ye. Weke çîroka Bazîdî ya çaremîn de Mîrzooyê Reş û Memedê Salmasî, lehengên çîrokê du hevalên pir ji hev hezdirkin destebirakên hev in. Di çîroka Bazîdî de Memedê Salmasî çavbirçîtî dike û para Mîrzooyê Reş nadê ji bo wê ji hêla Mîrzo tê kuştin. Çîroka Qalembiy de dema talanê de hevalê wî tê zevt kirin û navê wî dide tê kuştin. Ev her du heval heta berî ku diziya dawî êşan xemgîniyan dilşadiyan basqinan, talanan ganîmetan bi hev re parve dikin. Rojekê dîsa darin diziyê, yek ji wan tên girtin û navê yê din dide. Berê yeqîn nake, naxwaze bawer bike ku hevalê wî kalleşî pê re kiriye, lê paşê wexta lê ewle dibe ku wî ixbar kiriye, dare wî hevalê xwe yî diziyê dikuje dûre xwînî çêdibe di navbera wan û malata hevalê wî û her wiha çîrok didome. Uslûba Qalembiy ji gelek aliyê dişibe ya Mela Mehmûdê Bazîdî. Çîrokan weke

152 Ji bo çîroka Cîndar, Bnr. Qalembiy, 2010, r. 51-65.

153 Bazîdî jî jêderka çîrokê dibêje. Mînak di çîroka 4. de nivîskar çîrokê ji Mîrzooyê Reş yanî ji leheng bihistiye, çîroka 18. de dîsa her weha ji Mele Osman bihistiye, çîroka 34an de ji destana Melayê Bateyî jî bihistiye, û hwd

154 Ji bo çîroka Kukla (Pîpaxe), Bnr. Qalembiy, 2010, r. 65-97.

155 Ji bo çîroka Du mehê li gundî Bnr. Qalembiy, 2010, r. 19-51.

156 Ji bo çîroka Akinciyan, Bnr. Qalembiy, 2010, r. 97-137.

jê re hatibe gotin dibêje. Di nava çîrokên xwe de Mela Mehmûdê Bazîdî kurdan dide naskirin Qalembiy ji Adigeyan. Di nava çîrokên xwe de çîrokên jê re hatiye gotin jî dibêje.

BEŞA SÊYEMÎN

DI ÇÎROKÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DE MIJARÊN CIVAKÎ

Her berhemeke wêjeyî di nava xwe de hebûneke organîk e, xweşbûna wê jî ji vir tê. Mikemelbûn, ji ahenga di navbera unsurên berhemê tê. Ji bo meriv berhemê fam bike û wê binirxîne divê berhemê hûr û kûr dahûrîne. “Rêgeza Dahûrîna Metinê”, guncavtirîn metoda têgihiştina metnê mahiyeta wêjeyê ye. Berhem eger di nava xwe de bibe wicûdeke organîk, wê çaxê digihe dereca xweşikahî mukemeliyê û eger nebe, serkeftî naye hesêbê.

Ji ber ku, her berhemeke orjînal naşibe yeka din, formuleke rêgeza dahûrîna metnê ku, li her berhemê bê tune ye. Metodên dahurandinê, li gorî berheman tên eyarkirin¹⁵⁷ Bi van taybetiyan dahûrîna çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo ronîkirina êwra destpêka çîroka nûjen, dê girîng be. Bi vê armancê di vê xebatê de, ji çavkaniyên curbicur, jibo metodên dahûrînê hate îstifadekirin. Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî peywira pirê ya di navbera çîroka gelerî û nûjen de tîne cih. Mebesteke vê xebatê jî ji alîkî vê hêla çîrokan derxe ber roniyê.

Berhema wêjeyî bêguman bi derdor, dîrok û jiyana nivîskêr re têkildar e. Wek her mirovî, nivîskar jî di nava malbatekî çêbûye, di taxekê de mezin bûye, hin dibistan xwendiyê, ji boyî debara xwe di hin karan de xebitiyê, hezkiriyê, jê hatiye hezkirin, gelek mirov naskiriyê û jiyayê. Ev jî rastiyeke ku nivîskar, dema berhema xwe diafirîne ji hişê xwe û jiyana xwe istifade dike. Ev tişt tev ji bo hunermend kereste ne. Hunermend di heyama afirandinê de van keresteyên ji çavkaniyên curbicur kom dike, bi tesîra hiş û binhişmendiyê dike yek. Berhem erê ji keresteyan pêk tê, lê tiştêkî ji keresteyên ku dikeve navê zêdetir e. Vazoyeke ji firinê derketî û ji heriya ku pê çêbûye ne yek in. Tu berhem tenê bi keresteyên ku ketiyê nava wê, naye icrakirin. Ya ku berhemê xweş dike ne kereste, sazûna wê ye. Rêgeza dahûrîna metinê xwe dispêre vê ferasetê.¹⁵⁸

Di çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî de mijarên civakî ciheke baş digre. Jiyana civaka Bazîdî, weke dîmeneke fotografîkî, tê li ber çavê xwendevanan. Bûyerên aborî siyasî û rewşa civakî ji nav rêzikên çîrokan de diherike der. Mucadeleya desthilatdarî ya di

157 Kaplan, 2009, r. 9-10.

158 H.b., r. 9-10.

navbera mîrekiyên kurdan û mucadeleya di navbera mîr û serekên kurdan û ereb, îranî û osmaniyan bi tevî siyaset û îdareya dewletê di çend çîrokan de hatiye hûnan.

Perwerde û hîndekariya wê demê, hem ji hêla qencî hem jî ji hêla kêmasî û arizayên sîstemê bi uslûbeke îronîk vegotîye. Her çiqas jî cehalet û kêmaqîlbûna ji kêma perwerdebûnê aciz dibe, ewqasî jî qismê mele û xwendeyên nejidil jî aciz dibe. Li hember timahiyê û bikaranîna dîne jibo berjewendiya şexsî disekine. Ev helwest, wekî mijar di nava çîrokan de bi zîmaneke mîzahî û rexneyî cihê xwe girtiye.

Li ser vê erdnîgariyê tenê kurdên misilman nejiyane, lehengên file (ermenî, nastûrî), frengî, ereb, faris êzîdî jî hene. Di navbera wan de bûyerên wekî xwînî, şer, talan û şelandin jî çêbûye. Li hember van xetereyan girîngiya xîsm û merivantiyê zêde dibe. Bandora nîrxên civakî yê mîna xîsm û merivantî di derûna kurdan de çawa ye ev tev di nava çîrokan de veşartî ne.

Têkiliyên lehengan yê bi malbatê, sekina civakê ya li hember hestên evînî û mijara tekîliyên zayendî û nêrîna Bazîdî ya li ser çavliderîyê (tolazî) aliyê çîrokan ê sosyo-pisîkolojîk e. Di nava civakê de merasîma zewacê û cureyên zewacê jî ji nav rêzikên çîrokan de diherike der.

1.1. TÊKILIYÊN MALBATÎ

1.1.1. Evîn

Evîn hesteke bi hêz e ku, ji însanên ewilîn heta roja me herî zêde li ser hatiye nivîsîn û xêzkirin. Mirov her dem pêdivî dîtiye ku bi cureyekî hunerê biteyisîne derveyî derûniya xwe. Însan, ji wêneyên şikeftan heta gihaye wêneyên li ser tabloyan, ji tabletên sumeriyên heta teknolojiya roja me ji vê mijarê aciz nebûne xwestine eşkere bikin.

Mela Mehmûdê Bazîdî jî di çîrokên xwe de cihekî baş daye mijara evînê. Ev jî qedirdayîna wî ya evînê bi awayeke xurt nîşan dide. Wexta li çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî yê bi mijara evînê hatiye hûnan meriv binere, bêtir hewayeke reşbînî dibîne. Bi gelemperî ev halên evînî, yanî tesîra evînê ya li ser evîndaran meriv dixwîne. Lê dema meriv bikaribe çîrokê vajî (beropaşo) bixwîne, îcarê tê de pîrozkirina evînê beloq dibe. Mela Mehmûdê Bazîdî di çîrokên xwe de bi van mijaran, evînê vedibêje: evîna platonîk, evîna bêmîrad, evîna bimirad, êşa evînê û evîna qedexekirî.

Evîna platonîk evîna Lalîxanê ye. Heta ku Lalîxanê dimire jî haya Hesên Axa ji hezkirina Lalîxanê tune ye. Lehengên çîrokên Bazîdî ên evîndar tev bêmîrad in. Evîna bimirad tenê ya Tacdîn û Sîtiyê ye. Lê divê bê gotin ew her du evîndar jî ne serleheng, lehengên talî ne. Ji xêndî evîna Tacdîn û Sîtiyê, evîndarên çîrokên Bazîdî de tev jî nagihêjin miradên xwe. Êşa evînê jî dîsa ji xêndî Tacdîn û Sîtiyê, di tevan de bi qasî zêde zêde bandorê li wan bike zêde ye. Evîna qedexekirî, evîna Werdê û Heyderî û evîna Leylêya jina Çînar Axa û Îbrahîm Axa ye.

Ji êşa evînê xwe xwekuştin, encameka mijarên Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Di çîroka Siyahmed û Şemsê, ya Barnîkê û ya Lalîxanê de ev motîf heye. Di çîroka Mem û Zînê de êşa evînê dibe sedem ku Zîn ji vê jiyanê biqete û bimire.

Berê berê çîroka Mem û Zînê ya bi mijara evînê hatiye hûnan emê binirxînin. Di vê çîrokê de meriv li rastî evîna Mem û Zînê û Tacdîn û Sîtiyê tê. Du cureyê evînê di heman çîrokê de hatiye hûnan. Evîna Mem û Zînê (serlehengên yekemîn ên evîndar) evîneke bêmîrad, evîna Tacdîn û Sîtiyê evîna bimirad e. Li hember Mem û Zînê nagihêjin miradan û dimirin, Tacdîn û Sîtiyê jiyanê ku her evîndar dixwazin bigihêjin, dijîn. Digihêjin hev, daweteke bi heybet ji bo wan lidar dikeve, paşê zarokên wan çêdibin.

Çîrok bi qurtasî wiha ye: Zînê û Sitî du xwehên Mîr Zeynedîn in. Her du jî têra xwe pak û sipehî ne. Ji ber ku xwehên mîr in, di heremserayê de xwedî xulam û cariyê nin. Bi naz û nîmet, perwerde, bi keyf û sefayê, di eyîş û zewqê de ne. Ji her kinaran xwazgîn û talibên wan tîn, lakîn xwedê nake qismet û nabe.

Ji nava Cizîrê ji eşrafê begzadan û eyanan, pehlawanekî zemaneyî bi navê Eskender Beg hebû. Sê kurên wî yên pir behadir û biquwet hebû. Navê yê mezin Tacdîn û yê navê Çeko û yê biçûk Arif bû. Mem jî ciwanekî dibîrzade bû. Digel Tacdîn ji berê de eqîd û benda kemera birayetiye girêdabû û bûbûn destebirayên hev.

Roja Newrozê Mem û Zîn û Tacdîn û Sitî çav li hev dikevin. Lê bi awayekî ne asayî Mem û Tacdîn bi qiyafetên jinan Zîn û Sitî jî bi qiyafetên mêran hevdu dibînin. Bêyî ku zayendên hev zanibin, dilê wan dikeve hevdu. Mohr û hingulîskên xwe wekî nîşane didin hevdu. Lê piştî ji hev vediqetin ji êşa evîne her yek li alîkî nexweş dikevin. Bi alîkariya wan hingulîsk û mohran hevdu dibînin. Tacdîn li gorî adetên, beg û axa dixwe navbeynê Sîtiyê ji xwe re dide xwestin. Tacdîn û Sitî dizewicin, lê Mem û Zîn ne bi qasî Tacdîn û Sîtiyê bi siûd in. Beko ji bo xwe li ber çavê mîr şêrîn bike, fesadiyê dike û evîna wan digihîne mîr. Ji ber fesadiyê, Beko dibe sebebê miradê wan bêimkan bibe û negihêjin hev.

Mîr ancax wexta qeneat dike ku Mem ê bimore Zînê dide Mem. Zîn wexta diçe cem Mem ku, mizgîniya efûya mîr û destûra zeweca xwe bidê, Mem di nav lepê wê de ruh dide. Lê di dawîya çîrokê de nivîskar, evîna van her du xoşewîstan bi mirina wan re neqedandiyê. Bihevreçalkirina wan de peyama gihaştina wan daye. Piştî Zînê ji ser mezê Memî vedigere, ji birayê xwe daxwaz dike ku wê jî, ligel Memî çal bikin û her wekî daweta Tacdîn û Sîtiyê daweta wê jî bikin. Mela Mehmûdê Bazîdî ev encam weha vegotiyê:

“ Weke rojekê paşî Zîn jî koç kirî çû dar el beqayê. Wekî hate gotin matema wê hate girtin. Ew jî tekfîn û techîz kirin, wekî ku hevî û nîaz kiribû, bi wê terze birin û digel Memo çal kirin.”

Lehenga çîroka duwanzdeyê Lalîxanê xwestiya Hesên Axa ye. Lalîxanê keçeke pir xweşik e, sedema bêşensiya herdu dilketiyan jî ji xweşikbûna Lalîxanê ye. Bi gotina Mela Mehmûdê Bazîdî, weke hêva di çardehê de, êdî mehbûbêd weke wê belkî kêmbê heyin. Lalîxan hem dergistî hem jî evîndarê Hesên Axa ye, lê Çeleng Axayê birayê

Hesen Axa, ku ji bo şîrînahî û qelenbirînê dihere mala bavê Lalîxanê, çav li Lalîxana xweşik dikeve û bêhemd dil dikeve. Lê mixabin, Lalîxan wê bibe dergistiya biraye wî. Bi fen û fût û dek û dolaban Lalîxan li ber çavê Hesen Axa reş dike. Hesen Axa jî ji xwestina Lalîxanê dibore. Lalîxan ji Çeleng Axa re dimîne. Daweta Çeleng Axa û Lalîxanê dikin. Gava Hesen Axa diçe bûkê ji birayê xwe re bîne, ba, serûka Lalîxanê hiltîne û Hesen Axa rûye Lalîxanê dibîne, û bêhemdî dibe evîndarê wê. Îcarê têdigihêje ku birayê wî ew xapandiye. Êdî tiştê ji destê wî naye û ji vî welatî diçe. Lalîxanê pê dihesa ku sedema zewaca wê ya bi Çeleng Axa re ne jibo Hesen axa pê qayil nebûye, ji qelsbûna îradeya Çeleng Axa bûye. Çeleng Axa bi fen wê ji xwe re anîbûye. Dema haya Lalîxanê, ji van bûyerên ku qewimiye çêdibe, pir xemgîn dibe, jahrê vedixwe û xwe dikuje.

Qedera mirov hin caran li ser adetan ava dibe. Bandora adetan ya bi qasî qedera mirovan biguherîne bi taybetî çîrokên evînî de derketiye pêş. Li gorî adetan tu mafê jinan ên ku bikaribe hevserê xwe hilbijêre, tune ye. Li ser mijara nînbûna vê mafê gelek evîn bê mirad maye. Ev hal hem di çîrokan de hem jî Adat û Risûmetnameyê Ekradiye de hatiye vegotin. Zînê, Şemsê, Lalîxanê, û Barnikê jî mexdûrên van adetan in. Mela Mehmûdê Bazîdî li ser heman mijarê, di berhema xwe ya dinê ya bi navê Adat û Risûmetnameyê Ekradiye de weha dibêje:

*“Keç û jinên kurdan bi xwe bi nefsa xwe ne muxtar in. Eger bav û birayên keçê wê bidin mirovekî, keç qadirî men’e nabe elbette.”*¹⁵⁹

Di çîroka sêzdehan de, çîroka evîna Siyahmed û Şemsê tê vegotin. Siyahmed lawekî ciwan û rind e, lê bêmal û hal û dewlet e. Şemsê qîza Tîmûr Paşayê serekê wî cihî ye. Siyahmed dema wekî xulam li cem Tîmûr Paşayî dixebite dibe evîndarê Şemsê. Şems jî her wiha jê hez dike. Lê di evîna wan de astengiya mezin e ku, Şems qîza Paşa û Siyahmed xulam e. Ji ber ku zanin, her du jî ne di yek astê de ne û bi xweşî nikarin bizewicin, biryara revê didin. Berî revê Siyahmed ji bo ku Şemsê ji bo revê re îqna bike dibêje:

“Em heta kengê weha zar vê belaya eşqê bikêşin. Ez dizanim eve şûla me bi rehetî nayête serî, were ez dê te birevînim, yan ew e ku em xelas dibin yan ew ê ku bi pê me dikevin û me dikujin, em ji belaya vîne xelas dibin.”

159Findî, 2006, r. 28.

Dû re jî direvin. Lê her wekî Siyahmed jî dibêje ger ji aliyê zilamên Tîmûr Paşayî bên zevtkirin ew ê bên kuştin. Tevî vê talûkeyê revê didin ber çavên xwe û dema koça wan ji Bîngolê ber bi beriyê ve diçe, ew bi şûnde ber bi Mûşê ve direvin û tîna Çiyayê Sipanê Xelatê.

Tîmûr Paşa êvarî pê dihesa ku qîza wî ne xuya ye. Zilamên xwe bi şopê ve dişîne. Siwarên Tîmûr Paşa dema bi şûn de vedigerin salix jê distînin û bera pê wan didin. Şemsê û Siyahmed li Çiyayê Sipanê Xelatê ji hespan dadikevin. Li wir bi hin gayên kovî rast tîna. Siyahmed bera pê wan dide û yekî birîndar dike. Dema Siyahmed ji bo serê gayê kovî jêke hemle dike, gakovî ji derdê canê xwe qiloçê xwe li wî dide û wî ji latê werdike û Siyahmed dimire. Bêyî ku haya Şems ji bayê felekê hebe, tê li Siyahmedê ji latê werbûyî dibîne, debar nake û ew jî xwe ji wê latê werdike.

Di vê çîrokê de balkêş e ku, Mela Mehmûdê Bazîdî hêstên xwe veneşartîye, dilê wî bi van her du dilketîyan şewitiye, di vî warî de weha gotiye:

“ Paşê xuha Siyahmedê Silivî hebûye, zaf istiran li wan girêdaye û el an ew istiran û qezaya wan di nêva Ekradan da meşûr e, hikayêdxwanêd di meclîsan da neqil dikin, lakîn istiranêd wan jî di gel dibêjin, qewî zêde hezîn e û giriyên mirovan têtin. Gelek bi jarî û bizarî fewt bûyine. ”

Mijara qîzên ku bera pê mêran didin û di pişt re bûyerên tîna serê wan di çîroka A. Seccadî, ya bi navê “Le pênavî efreta” jî de hatiye hunandin. Gulendam dibe qurbana xesîsiya bavê xwe. Qelenekî giran ji xwestiyê wê dixwaze. Her du mecbûr dimînin ku birevin. Lê mixabin tîna zevtkirin, encama şerê xwestiyê wê û malbavanê wê, heft birayê wê, bavê wê û xwestiyê wê Semsam tev dimirin.¹⁶⁰

Evîna Polo û Barnikê mijara çîroka heştan e. Barnik keçikeke bedew e. Dilê wê û Polo di hev de heye. Lê, Polo mirovekî feqîr e. Çend caran çûye devê deriyê Barnikê, ew ji xwe re xwestiye. Lê bavê Barnikê nedayê. Ji gundê dinê xortekî dewlemend, yê bi navê Şamas tê ji bavê Barnikê dixwaze. Bavê Barnikê, wê dide Şamas. Şîrîniyê vedixwin û nîşanê dikin. Polo bela ku dizane dilê Barnikê jî di wî de ye dixwaze, Şamas bikuje. Diçe pêşiya Şamas. Polo û Şamas bi xenceran bi hev re şer dikin û her du jî dimirin. Xeber diçe her du gundî. Barnik dema dibihîze tê halê her du xwestiyê xwe bi çavê xwe dibîne. Ew jî xwe dakuje, wekî encam her sê leheng jî bêmirad dimirin.

160 Shakely, 1998, r. 34 Seccadî, 1960.

Çîroka Leyla û Mecnûn evîneke ji zarokantî destpêdike. Leyla jî Mecnûn jî ji ber êşa evînê zehmetiyê dikşînin. Encamê de herdu dildar nagihêjin hevdu. Çîroka Yûsif û Zuleyxayê dîsa mijara xwe li ser bingeha evînê dihûne. Wekî tê zanîn, di metnên pîroz de jî ev çîrok heye. Di wêjeya klasîk de ev mijar bi forma helbestî pir dixuye. Zuleyxayê bi evîneke bêşnor dilketiyê Yûsif e. Ji ber ku Zuleyxa jineke zewicî ye, di serî de wekî evîneke platonîk e. Zuleyxayê ji ber evîna xwe buxtanê li Yûsif dike. Dibe sebeba Yûsif têkeve zindanê û demekê tê de cefayê bikşîne. Di vê çîrokê de Hezretên Yûsif sembola paqijbûn û safbûnê ye; lê Zuleyxayê sembola hêstên însanî ye. Her wekî çîroka Zembîlfroş jî, motîfa paqijbûn û safbûnê Zembîlfroş e; lê Xatûnê sembola hêstên însanî ye. Evîna Xatûnê evîneke yekalî ye. Zembîlfroş mirovekî dîndar û dirust e. Ev dibe sedem ku bi çavekî xerab li heramê nanere. Xatûnê ji ber ku zewicî ye imkana miradê jî tune ye.

Zembîlfroş lehengeke balkêş e. Çîroka Zembîlfroş ji gelek hêlê dişibe çîroka Bûda ango Prens Siddharta. Peyva Bûda tê wateya “kesê şiyarbûyî”. Siddharta li gorî gelek lêkolîneran berî zayînê 567an de hatiye dine. Kurê Mîr Suddhodana ye. Di şanzde salî dizewice û di bîst û neh salî ji serayê der tê. Tam ji xewê şiyarbûna wî di sala 523an de bûye û heya heştê saliya xwe miriye, ji der dorê re bangewaziya ji bo felatê kiriye. Bûda xwe tu carî wekî xweda an jî pêxemberekî nedîtiye, tene ji xew şiyarbûyiye. Piştî mirina wî teologên Bûdîst jiyana wî kirin formeke mitolojik û di nava gel de belav kirin. Çîroka jiyana wî ya efsanewî ji xwe ji wêjeya sofitiyê re ji hunerên şewekariyê re û ji mîtolojiyê re peywira bingehiyê hilgirtiye.¹⁶¹ Li gorî me jî tesîra Bûdîzmê xwe li ser vê erdnigariyê bi çîroka Zembîlfroş xwe derandiye der.

1.1.2. Nêrîna Bazîdî ya li ser Tolazî û Îxanetê

Çavliderî ango tolazî, di civaka kurdan de naye teswîbkirin. Ev rewş bi nêrîneke neyînî teyisiye çîrokan. Di berhemana de çîrokên mijara tolaziyê tê de hene, pênc heb in. Serlehengên çîrokan di mijara tolaziyê de pir hesas in. Bi gotineke din serlehengên çîrokê li gorî normên civakê tevdigerin. Kesên li tolaziyê digerin an jî dikin, tev jî ne serleheng in, lehengên alîkar in.

¹⁶¹ Mircae Eliade, Dinsel Düşünceler ve İnançlar Tarihi Gotama Budha'dan Hıristiyanlığın doğuşuna, Kabalıcı, 2003, r. 86

Di çîroka Yûsif û Zuleyxayê de, Zuleyxayê dikeve bin bandora hestên xwe yên însanî her wekî Xatûna çîroka Zembîlfroş. Lê hem Zembîlfroş hem jî Yûsif ji ber evîna xwe a li hember Xwedê paqijî û kesayetiya xwe diparêzin.

Bazîdî nivîskarekî ji hêla exlaqî ve xwedî helwest e. Bazîdî ji aliyê exlaqî û parastina saziya malbatî ve tevdigere. Ji ber vê jî di çîrokên wî de têkiliyên dijzewayî ên wekî tolazî û îxanetên ku xisarê bidin saziya malbatî bên dîtin jî, bêyî ku dilê kesî bibijîne, ji bo ji qisseyê hissê bidê vedibêje. Di sê çîrokên Bazîdî de ev mijara îxanetê hatiya hunan. Ên ku îxanetê dikin di her sêyan de jî lehengên jin in. Sedema îxaneta Werdê ji bedesilbûna wê; sedema îxaneta dêmariya Dijwar jî jibîrnekirina evîna wê ya keçikanî tê; ya Leylê ya jina Çinar Axa zêde bedewbûna wê li serê wê dibe bela. Di encama her sê çîrokan de jî ev jinên nebaş, bi tevî yarên xwe ve tên kuştin.

Kesayetên çavlider herwiha di çîrokan de jî tê diyarkirin, bi exlaqî jî ne dirust in. Çavliderî ango tolazî wekî her ferdeke civakê, li cem Bazîdî şola xerab e.¹⁶² Li gorî Bazîdî, jinên kurd şola xerab ji ber baweriyê û ji tîrsa kuştinê nakin. Belkî jî ji ber wê li cem kurdan bed gumanî tune ye, heta ku bi çavê xwe nebînin, yan jî bawer nekin kesî bi vê îtham nakin. Mela Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe ya dinê ya bi navê Adat û Risûmetnameyê Ekradiye da weha dibêje:¹⁶³

“...û ekradan qewî eyb e ku bab û birayed ew kumreşî û bed gûmanî li nik tayifeyêd Ekradan tunîne. Meselen jinêd wan ê ciwan digel mêrêd biyanî xeber dan û bikenin û rûnîn û rabin ew bed gûmanî nakin.”

Berevajî vê, jin û mêrên bisedaqat ji aliyê civakê, her dem tê pesinandin. Çîroka Guzel Xatûnê li ser vê mijarê hatiye hûnan. Di çîroka Guzel Xatûnê de Bazîdî pesnê mêrbûna Guzelê ya li hember Kirêt bi van peyvên dide:

“Wan etrafan aferîn û tehsînê ji boyî pakî û paqijî û cûrat û cesareta Guzelê dikin. Aferîn sed aferîn ji boyê jinêd wehe nêreşêr in, lewranê fi elwaqî’i, ew xanîne zêde muhîb û bitirs in, yanî bi rojê mirov bi tenê li wan xanan ditirsin, barekellah ji boyê Guzelê wê cesaretê û paqijiyê.”

162 Bnr. çîroka nozdehê.
163 Findî, 2006, r. 29.

Karektera Guzel Xatûnê motîfa, exlaqê xweş, pakî û cesaretê ye, berevacî Leylê, Werdê û dêmariya Dijwar e. Her wekî profileke jineke baş e. Bazîdî bi vê çîrokê wekî nimandina jina kurdî ya di Adat û Rusûmetnameyê Ekradiyê de kiribû bi vucûd dike.

Guzel Xatûn ji bo du sê rojan diçe mala bavê xwe, ji bo ku vegera wê dereng ketiye Cergo xulamê xwe yê bi navê Kirêt dişîne pêy wê. Gundê mala bavê Guzel Xatûnê yanzde saetan dûrî Bedlîsê ye. Kirêt bi nêta xerab li ser rê xwe diştexilîne, geh dibêje ez nexweş ketime, geh dibêje ez sancî bûme. Carekê jî bi kinayet xeber dide. Guzel Xatûn bi nêta wî derdixe lê bersivê nadê. Tenê jê lavahiya dike jibo êvar e, dereng e, lez bike. Kirêt nêta xera kiriye, li ber xaneke xewle diborin, ji ber ku şev jî dereng bûye û hêvron jî tune ye, ji naçarî li wir dadiwerin. Li wir Kirêt dîsa zorê didê, Guzel Xatûn li ber digere lavahiyan dike, aman dad dibêje, çare nabe. Kirêt xistiye serê xwe, jixwe ji bo vê demê bijî, ewqas xwe varqilandibû, vir de û wê de, ji Guzel Xatûnê re dibêje, yan daxwaza min bikî yan ez ê te bikujim. Kêreke frengî bi Guzel Xatûnê re hebû, di tariyê de ji bin kurkê xwe derdixe û dîsa lavahiyan dike, piştî li ber Kirêt digere, nêzîkî wî dibe, kêrê li zengeloka wî dide û diqetîne. Kirêt di cî de dimire. Guzel Xatûn li kuncikekê xana xewle rûdine bendeyî subeyê dimîne.

Di nava çîrokê de du çîrok hatiye vegotin; çîroka duduyan jî ya mêrê Guzel Xatûnê Cergo ye. Wexta ev tişt bi serê Guzel Xatûnê de dihatin, Cergo jî li meclîsekê bû. Mijara sohbeta wan camêrî, dilêrî û wêrebûn e. Dibêjin “ Kî dikare di vê şeva tarî de biçe Başxanê nîşaneyekî dîne û vegere. Em jî sibeyê herin wê nîşaneyê bibînin, eger bişev çûbe, ji wî mêrtir kes tune ye.” Berê yek dibêje ezê biçim dû re poşman dibe. Dûre Cergo dibêje ez ê herim û ên meclîsê qebûl dikin û dibêjin heta tu vegere em belav nabin. Cergo nîşanê radihêje û diçe Başxanê, nîşanê li wir datîne. Piştî hinek bûyerên biheyacan, bi halê jina xwe û Kirêt dihesa û wê tîne meclîsê. Yên meclîsê û çîrokbêj (Mela Mehmûdê Bazîdî) eferîmê didin Guzel Xatûnê. Di vê çîrokê de du hêmayên balkêş yek serbestbûna jinê ya duduyan motîfa pîvana cesaret û mêrbûnê û şerdgirtin e.

Di çîroka Êsif Haco ya bi navê “ Elî û Huseyin” de¹⁶⁴ ev motîfa şerdê û ezmûna cesaretê hatiye bikaranîn. Çîrok wiha destpê dike: Di gundê Gizrê di nav eşîra Hawerqan muxtarê bi navê Osman di koşkê de ji gelî re dibêje: “*Gelî civatê, kesek hey e ku here Şkefta Pîrevoka, çar libî hêk bibe, bikelîne û ji xwe re li hundirê şikeftê de bixwe. Çi dixwaze emê bikin.*” Yek hebû navê wî Huseyin got ku: “Heçî here vê şikeftê

164 Wikander, 1992, r.24-25.

hêkan tê de bixwe ezê keça xwe bidimê.” Elî rabû ser xwe û got: “Deste xwe bide min! Gelî civatê hun bibin şehada di navbera min û Huseyin de ku paşê hîle nebe ez ê herim şikeftê ...” Elî diçe şikevtî, hêkan tê de dikelfîne, dixwe û şerdê bicih tîne bi vî awayî mafê bidestxistina qîza Huseyin distîne.

Jin di nava civakê de xwe nade alî. Di her qadê jiyânê de xuya ye. Ev rewş li gorî milletên derdorê peşketin e. Mijara serbestbûna jinan û xwe ji mêran venegirtina wan, di Adat û Rusûmetnameyê Ekradiye de jî xwe dide der. Bazîdî li ser vê mijarê de gotiye¹⁶⁵

“ Waqî’ en revîna jinan ji mêran di nêv wan de adet nînin jin û keçêd wan ji kesî narevin weku milletên Efrencî ye. Ew jî serbest in.”

Her weha di dawiya çîroka Guzel Xatûnê de,¹⁶⁶ Guzel Xatûn ligel hevserê xwe tê meclîsê û xwe venagire, çî bûyer qewimiye tevî vedibêje. Reşîd Findî, ji vê ferasetê re dibêje

“ Pêşketina civaka kurdî ya wê serdemê niha jî berdewam e. Di wê demê de civakên din yê milletên hinek ciyan ne wisa bûn.”

Wêje neynikeke civakê ye. Bi taybetî, bawerî, adet û jiyana civakê bi hêmayên wêjeyî diteyise ser berhemên hunerî. Normên civakî di gelek çandan de dişibin hev û gelek çand li hember bûyerekî, bertekên nêzîkî hev didin. Her wekî kuştina jinên nesadiq, di çîrokan de wekî dehatûya sadiqbûnê ye. Aqûbeta Werdê, Leylê û dêmariya Dijwar mirin e. Bazîdî ji bo vê adetê wiha gotiye:

*“ ... bedgumanî nakin îlla ku xerabiyê bibînin û yeqîn bikin elbette bîlmecal ewê jinê dikujin û mêr jî. Êdî ewan xwîn tune. Kesek li wan nabe xweyî. Ekrad hemû qebehetan dibine xweyî lakîn li şolê xerab nabine xweyî. Lewranê li nik wan qewî eyb e.”*¹⁶⁷

Helwesta çerkesan ya li hember jinên nesadiq bi nivîskarê çerkesî Qalemby herikiye ser kaxezê. Wî ev mijar kiriye çîrok û nêrîn û çanda Adigeyan bi çîroka

165 Findî, 2006, r.20.

166 Bnr. Çîroka nozdehê.

167 Findî, 2006, r. 29.

Pîpxe¹⁶⁸ can daye. Di çîroka Pîpxeyê de bavê Zelîxayê bi bêdilê wê, dide mêrekî pîr. Zelîxayê her çend berê, nikare serî li hember adetên xwe rake û bi qedera xwe razî dibe û rûdine jî; dû re biryarê dide ku bera pê xoşewîstê xwe yî keçikanî bide. Lê di revê de mêrê wê yî pîr û zilamên wî digihêje wan, xoşewîstê wê dikuje. Ji ber ku li gorî adetên wan, pozên jinên nesadiqî mêrê xwe dihat jêkirin, pozê wê jî tê jêkirin.

Di çîrokên Xalid Ziya Uşakligîl de di saziya zewacê de, nelirêtiya îxanetê, hîn bêtir mêr dikin.¹⁶⁹ Heger jin bikin jî di encamê cezayê xwe dibînin. Her wekî lehenga *Aşk-ı Memnu*, Bîhtera qîza Fîrdews Xanimê bi mêrekî pîr re dizewice. Qîza Fîrdews Xanimê wekî diya xwe, guh nade nirxên exlakî û di bin bandora hestên ciwanî de sadiqî zewaca xwe nabe. Di encama berhemê de Bihter dilşad nabe û xwe dikuje. Heman encam di berhemên wekî *Madam Bowary* a Flubert û *Anna Caranîna* Tolstoy de jî tê dîtîn. Eşkere ye ku Uşakligîl, Flubert û Tolstoy jî weke Bazîdî rewşa îxanetê wekî nelirê dibînin.

Li çîroka hefdehan serpehatiya Werdêya bûka Elî Nasiran hatiye nivîsîn. Werdê hevserê xwe, bi Heyderê ku li cem wan bi nan û zikê dixebite dixapîne. Nivîskar ango Mela Mehmûdê Bazîdî bûyereke bi vî terzî ji jinên kurd hêvî nake, ev helwesta Werdê bi bedesilbûn û sêwîbûna wê girê dide.¹⁷⁰ Heyder ji Werdê re pêşniyara revê dike, lê Werdê qebûl nake. Dizane ku jineke bi mêr, bera pê yekî bide çî yê bê pêşiyê. Werdê, planeke hovane çêdike û Heyder jî bi xwe re dike şîrîk. Heyder ji Urmîyê merkemojan tîne. Werdê jî van merkemojan, tevî xwarinê dike. Malbat giş bi xwarinê jarî dibin. Di malbatê de ku hefdeh nufûs bûn, hew şeş kes dimînin. Ji jehrî nebûyîna Werdê û ji malê revîna Heyderî gel pê derdixînin ku ev plan ji bin serê Werdê derketiye. Werdê ji keziyên wê darde dikin û dikujin. Li pê Heyderî dikevin lê wî zevt nakin.

Mijara xapandinê, di çîroka bîst û şeşê de jî hatiye bikaranîn. Leylê jineke bedew e. Hevserê Leylê Çinar Axa, li Bexdayê demekê dixebite. Di wê navberê de di navbera Leylê û Îbrahîm Axa de, têkîlî çêdibe. Piştî demekê cîran û derdor bi wan dihesin û vê halê digihînin guhê Çinar Axa. Hevserê Leylê ji bo bi çavê xwe bibe şahid, berê du sê rojan xwe li wan dike diz. Dema her du li mala wî ne, her duyan jî dikuje û serê wan jêdike, datîne devê derî. Xwediyê Îbrahîm Axa jî birayên Leylê jî dawa xwînê nakin û

168 Qalemby, 2010, r. 65-97.

169 Aslan, 2008, r. 80.

170 Ji bo feraseta nivîskar Bnr. Findî, 2006, r.

paşayê Wanê jî eferîmê dide Çinar Axa û wî dike delîbaşê xwe. Mijara feraseta kuştina jinê di nava civakê de wiha vedibêje nivîskar:¹⁷¹

“ Lakîn ji boy şola xerab elbette mirovan dikujin. Hetta jinêd xwe û keç û da û xwehêd xwe jî elbette qetil dikin û jin jî ji boyî şola xerab meselen da keça xwe xwesû bûka xwe û xeh xweha xwe bişev dixeniqînin weya jahrê didinê û qetil dikin; ji axa û rîspiyêd wan kesek pirsiyarê nakin ku te ji boy çî eve kuşt. ”

Lehengê çîroka sî û pêncê zarokekî bi navê Dijwar e. Dijwar hîn heft salî ye diya wî dimire û bavê wî Mîre Beg ku ji Xesxêrê ye, ji xwe re ji xelkê Botan jinekê tîne. Piştî sê çar salan navbera Mîre Beg û Mîrê Botan xera dibe, mecbûr dimîne, direve Stenbolê. Dêmarî û Dijwar li Xesxêrê dimînin, bi milk û rezan debara xwe dikin. Meger dilê jinbava Dijwar, hîn di dema keçaniyê de, di yekî de bûye û ji çirka bavê wî çûbû Stenbolê ew kes dihat û diçû mala wî. Dijwar, ji vê rewşê dikeve şikê û ji jinbava xwe dipirse, lê jinbava wî bi derewan dibêje, ew kes birayê min e. Dijwar ji ber malbata dêmariya xwe nasnake bawer dike.

Carekê dîsa dema ew kes tê mala wan dêmariya Dijwar ji wî re dibêje here ji xalê xwe re ji rez tirî bîne. Dijwar diçe, li ser rê rastî, kurekî cîranekî tê. Lê dema kurik jê re rastiye dibêje, berê xarî lawik dibe ku, êrîş bike, lê paşê, biryarê dide ku dêmariya xwe bişopîne. Planekê çêdike berê diçe tiriye ku jê hatibû xwestin hildike û tîne dide dêmariya xwe paşê dibêje ku işev wê kerwanek ji nêzîka rezê me bibore bila tiriye me nedizin ka xençera bavê min ez ê li ber rez bim. Jinbav qerfê xwe pê dike û xençerê didê. Ji xwe jinbav minêkar e ew ê bi vî awayî bi yarê xwe re bi tenê bimînin. Dijwar diçe nav rez hinekî xwe li wir diştexilîne, weqta razanê tê dora xanî û li dêmariya xwe dibe diz. Dibîne ku dêmariya wî tenê cihekî razanê datîne û çilê vedimirîne. Piştî ew di xew ve darin, Dijwar ewan bi wê xençerê dikuje. Gazî cîranan dike. Bûyerê ji wan re dibêje. Ji ber ku tevî ku temenê xwe yê biçûk, li gorî normên civakê tevgeriyaye ji her kesî eferîne distîne. Bûyer li der dorê belav dibe heta diçe guhê mîrê Botan. Mîr jî ji bo vê cesareta Dijwar bavê Dijwarî, Mîre Beg, efû dike û destûra hatina wî dide û dike pîşekarê xwe.

Tekîliyên zayendî di çîrokên tolazî û çavliderî de xuya dibin. Lê tekîliyên cinsî ne bi awayekî belloq, tenê bi awayê îmakirinê bi xwendevanan dide hiskirin. Di çîrokên

171 Findî, 2006, r. 20.

Mela Mehmûdê Bazîdî de mijara munasebeta zayendî di çîrokên hefdeh, nozdeh, bîst û şeş û sî û pêncan de hene. Di vê mijarê de çîrokeke bakêş çîroka Kirêt û Guzel Xatûnê ye.¹⁷² Kirêt, xulamê Cergo û Guzel Xatûnê ye. Yekî bêîrade û pir di bin bandora hêstên xwe yên zayendî de ye. Şehweta zayendî li serê wî dibe bela. Cergo, Kirêt şandiye ku Guzelê ji mala bavê wê bîne. Lê, Kirêt ne yekî dirust e û di rê de, xanima axayê xwe aciz dike û Kirêt, bişev di wê xana xewle de nêta xwe yî rastîn dibêje. Guzelê ji ber binamûsbûn û cesareta xwe, bi paqijî ji belaya Kirêtî difilite. Cihê ku munasebeta zayendî tê tuwanckirin ev in:

“ Lakin bi rê ve dilê xwe bi Guzel Xatûnê xirab diketin, fesadî di dilê xwe da peyda diketin. Her çend êre ve pê da bi qinayet xeber didetin. Guzel Xatûn fêm diketin fesad(a) dilê wî, cewabê nadetin îcarê Kirêt heramzade xwe vir da wê da gêro diketin ku şev bi ser wan dibêtin, êdî cebrê xeraza xwe îcra biketin. Kirêt car peya dibe û car ez sanco bûme, nexweşim dibêje, hêdî hêdî hespê dajotin. Her çend Guzel Xatûn hêvî û rica diketin ku Kirêt dereng e em êdî nagihine bajarê, lezê bike. Kirêt guhdarî Guzel Xatûnê naketin. Xulase kelim, ew heramzade Kirêt, Guzel Xatûnê gêro û mijûl diketin. Rojavayê bi zorê digihine deşta Rehwayê Xana Başxanê ku hêjam sê seet bajarê Bitlîsê dikişe, êvar jî dibe. Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatûnê ku em dê îşevê li vê Xanê sakin bibin û sibeyê biçin. Guzel Xatûnê êdî neçarî li xanê dawerîn û hesped xwe girê didin, demekê disekinin. Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatûnê êdî çext feyde naketin û şerm nabê elbet tu dê şûla xerab di gel min bikî ji wê jî min heta şevê tu gêro kirî, eger ne elbet ez dê te bikujim. Her çend Guzel Xatûnê eman dad feryad dibêje û lawahiyan diketin, çare nabî.”

Di çîroka Dijwar de munasebeta zayendî ne bi qasî çîroka Kirêt û Guzel Xatûnê zelal e. Lê, dîsa tekîliya dêmariya Dijwar û yarê wê bi van hevokan tên vegotin:

“ Lakin meger vê jinbaba wî ya kurmanç di berê danê weqtê keçiyê danê eleqe di gel yekî rewend hebûye û hez ji yekûdu kirine. Ew mirovêd rewend ku eleqe di gel jinbaba Dijwarî heye, carinan tête mala wan û diçitin....”

Di beşa ji dêmariya xwe dikeve şik û gûmanê û wê dişopîne de:

172 Bnr. çîroka nozdehê.

“ Dijwar dibînitin ku belê cihek bi tenê li koşeyekê malê danîn û çirex vemirandin, herdu, jinbab û ew yarê wê ketine nêva cihan, paşila yekûdu razan.”

Di çîroka Werdê de:

“ Meger bûkeke Elî Nasiran bedesil û bêsewî hebûye, navê wê Werdê. Ew bûk û Heyder bi xef hevûdu dihebînin û bi dîzî di gel yekûdu didin û distînin”

Di çîroka bîst û şeşê de tekîliya Leylê û Îbrahîm Axa weha tê neqilkirin:

“ Leylê jineke bedew e. Hevserê Leylê Çinar Axa li Bexdayê demeke dixebite. Di wê navberê de di navbera Leylê û Îbrahîm Axa tekiliyak çêdibe.”

Divê her dem mirov çavekirî be ne wisa? Dibe ku carinan derew û buxtan jî li însanan bûbe bi gotineke dinê însanên durust jî mohra gunehbariyê xwaribin. Çîrokek berhemê li ser vê mijarê ye. Çîroka siyemîn de jî Huseyin Axayê Zîlî yê ku lehengê alîkar e. Ji Kehyayê xwe yî Ehmedê Feqî pir bawer e. Nevî û birayên wî ji wî dihezidin û her tim derewan û buxtanan li Ehmedê Feqî dikin. Her çiqas derew û fesadî, lê bê kirin jî, Huseyîn Axayê Zîlî ji wan bawer nake. Dema bira û lawên wî dayikeka xwe jî li derewa xwe dikin şîrîk û bi derewan, sond dixwin ku Ehmedê Feqî çav li bera jinên wî daye, êdî Huseyin Axayê Zîlî bawer dike. Pêre jî neçar kuştina Ehmedê Feqî emir dike. Çîrok bi hepiskirina Ehmedê Feqî destpêdike û dema dawiya jiyana wî ya li zindanê tê vegotin.

Çîroka Nureddîn Zaza¹⁷³ ya bi navê Gulê de jî motîfa cesaret û berxwedana jinê heye. Gulê, jineke bêdilê xwe hatiye zewicandin; ji ber ku ji mêrê xwe hez nake, mêrê xwe dikuje û bera pê eşqiyakî dide. Jineke mêrê xwe kuştibe û bera pê eşqiyakî ketibe ji aliyê derdorê ve divê neye pejirandin. Ji bo wê jî gundiyê wê, ji wê heznakin û bi çavên jina xerab lê dinêrin. Her çiqas, jê lêdanan jî bixwe, ji mêrê xwê yî nuh Qoco hez dike, li cem dimîne. Demekê dijmin tê erdê wan dagir dike. Ji ber wê Qoco derdikeve serê çê, rêberiya tekoşînê dike. Carekê gundî dibînin ku Gulê ji aliyê dijminan ve tê. Heman demê etîketê pêve datînin û dibêjin Gulê derbasî hêla dijmin bûye. Qoco Gulê dikuje. Di heman demê de şer didome. Kurd dijminan têk dibin. Wê çaxê rastî derdikeve holê ku di odeyeke tev bi xwîn de serê subayak jêkirî li erdê ye. Xencer li ser nivînê subayî

173 Zaza, r. 1941, r. 8-9.

de dibiriqe. Qoco wê xencera xwe yî ku dabû Gulê, nas dike. Di nava kefa destê subayî de biskeke porê Gulê yî zer diheje.

Hêleke dine ya bala mirovan dikşîne navê lehengan e. Navên lehengan û karakterên wan hevûdu dinimînin û temam dikin. Bi xweşikbûn, pakbûn, îffet û cesareta xwe Guzel Xatûn, bi mêrbûn û cesareta xwe Cergo; bi dilpîsî û nankorî û hêstên gemarî Kirêt derdikevin pêş.

1.1.3. Zewac

Zewac, saziyeke civakî ye. Di civaknasiyê de saziyeke kevn a dîrokî ye. Zewac, di pirtûkan de wekî bihevrebûna jin û mêran ya ji bo zêdebûna malbatê tê tarîfkirin. Zewac ne tenê bihevrebûna zayendî ye, xwestina bi hev re jiyînê ye. Bi hev re hilgirtina berpirsiyarê ye. Ji alîkî jî meşrûkirina civakê ya bi hev re jiyînê û bi hev parvekirina raye û berpirsariyê ye. Ji ber peywira wê ya jihevzêdebûnê, ji aliyê civakê ve bi norm û qaîdeyan ev sazî tê parastin.¹⁷⁴

Zewac çiqasî kevn e, ewqasî jî bi cure ye. Ji çerxa mirovahî avabûye heta niha saziya zewacê wekî xwe nema ye, bi demê re li her civakî li gorî xwe form girîye. Di çîrokan de cure û şeklên zewacê yên li civaka nivîskar, tê derxistin. Di van çîrokan de du riyên zewacê xuya dibe, zewaca bi merasîm û revandin yan jî revîn. Riya asayî û ya bi piranî tê tercîhkirin zewaca bi merasîm e. Riya duduyan, di dema awarte derdikeve holê ew jî revîn e.

Zewaca Tacdîn û Sitiyê her wekî di çîroka Mem û Zînê de tê dîtin li gor norm û adetên civakê ye. Merasîma zewaca wan di çîrokê de weha tê vegotin:

“ Tacdîn ku begzade û xanedan bû, paşî mudeyekî mela û eiyane Cizîrê berhev bûn û çûne nik mîr Zeyneddîn rica û hevî bi emre xudê dana Sitî ji bo Tacdîn û çiraxkirina wê derxwast kirin mîr jî rica wan qebl kirî Sitî da Tacdînî. Gora wî weqt û zemanî tedarak û pekhatinekî dirust hazir kirin di nêv hindek weqtekî da daweteke xundkarane kirî Sitî birêkirin û eqda nîkaha wê li Tacdîn kirin ew herdu aşiq û meşûq digel yekûdu gehane murad û meqsedê, ”¹⁷⁵

Ev merasîm di berhema xwe ya dinê de hîn vekirî îzah dike:

¹⁷⁴ Fatime, Güneş, “Aile, Evlilik, Akrabalık ve Hane”, Aile Sosyolojisi, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 28-48.
¹⁷⁵ Duhokî, 2002, 73-84.

*“ Weqtê ibtîda keçekê dixwazin weku dan hespekî bi taxim herî kirin distînin, paşî şîrinayî vedixwin û paşî nîşan dikin. Û qelendên wan zav dibin. Sed û dused û pencsed pez û hind çend bab û da û birayêd bûkê elbette ji bo her yekî xilatek lazim, bê xelat nabî”*¹⁷⁶

Cureya keçrevandinê e wekî mijar di çîroka sêzdehan, a “Siyahmed û Şemsê” de hatiye hûnan. Bazîdî nêrîna civaka xwe ya li ser revîna qîz û xortan bi vê çîrokê daye. Her çiqas meriv nikare bêje ev şeklekî zewacê ye, lê wekî çareya herî dawî ye ji bo xoşewîstan. Ji bo zewaceke bi vê riyê re dibêje: “Wexta keç û kur ji hev hezbikin û tu çareye bigihêjin hev tune be dibe.” Dîsa di berhemekê xwe de wiha dibêje:

*“ Keç revandin di ekraan de eyb nîne lakin bi riza, bê riza nabe. Weku keç û kurê hevdu hebandine bab û da keçê nadine wî kurî îcarî ewî keçê direvîne dibite mala axayekî weyanî şêxekî xweyêd keçê bi pê dikevin. Eger li rê rast hatin keçê û kurê herduyan jî dikujin. Eger rast nehatin û selamet çûn êdî xweyê keçê qadirî tiştekî nabin. Îcarê ew axa û ew şêx ku keç û kur çûyîne malê dikevîne mabêynê. Eger malê wî kurî jî tunebe ji kîsê xwe weyanê ji cîranan mîqdarekî malê dirav berhev dikin û dibin diçin mala xweye keçê û rica dikin elbette sulha wan dikin û ewê keçî li vî kurî mar dikin û dijminî radibe.”*¹⁷⁷

Di çîrokan de wekî cureyeke zewacê motîfa pirjinî balê dikişîne. Pirjinî heye lê ne zêde ye. Her wekî Thomas Bois¹⁷⁸ di nivîsa xwe ya li ser jiyana civaka kurdan de jî dibêje, pirzewacî di nava civaka kurdan de kême e. Di adetên kurdan de bi gelemperî ji aliyê hêjmarê ve şeklê zewaca monogamî heye. Ev di çîrokan de jî xuya ye. Meriv bi temamî li malbatên lehengan binere ji xêndî lehengê çîroka siyî, Huseyîn Axa, şeklê zewaca civakê yekjinî ye. Di çîroka sî û pêncê de Mîre Beg piştî jina wî dimire, dû re dîsa dizewice.

Daxwaza zewacê dibe ku ji her du hêlan ve jî bê. Her wekî di çîroka heştê de Polo û Şamas diçin Barnikê dixwazin; Mem û Tacdîn, Sitî û Zînê dixwazin. Îcarê berevaciyê wê, di çîroka nehê de Adîle Xanim teklîfa zewacê ji Şêxî Begê re dişîne.

176 H.b, r. 40.

177 H.b, r.28.

178 Bois, Th, V.Minorsky û hwd., 2004, r. 130.

Di çîrokan de, bi qasî ku tê dîtîn bûk û zava heta ku derfeta wan çêbibe li cem xwesû xezûr rûdinin. Her wekî Mela Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe ya antropolojîk, Adat û Rûsimetnameyê Ekradiye de wiha dibêje:

*“ Weku dinê adetêd wan in weku ce tunebûn bab û kur û bira digel jinêd xwe hemû di malekî da radizên û radibin û... Adeta ku malbat tev li cem hev bin pir e. Di wê demê de gelek malbat bi vî awayî dijiyan. Bûk dema tevlî malê dibû maleka nuh ji wan re venedikirin. ”*¹⁷⁹

Di çîroka hefdehan de Werdê li gundê Herîrê di gel malbata zilamên xwe li cem xwesû û xezûr û tî û dişên xwe dijî. Berovacî vê jî, çîrokên mayî de malbat ji dê û bav û zarokan pêk tê.

1.1.4. Xism û Merivantî

Mela Mehmûdê Bazîdî mijara xism û merivantiyê di gelek çîrokên xwe de daye pêş. Bi taybetî di mijara şer, xwînî û di rewşa teng de wekî hest û ajoya hezkirin û xwe hefidînê de beloq e. Pêwendiyên xism û merivantiyan hîn bêtir di lehengên jin de meriv dikare vebêje. Di çîroka nehê de Adîle Xanim bêyî ku tu dijminantiya wê û Şêxî Begê hebe, sirf ji bo alîkariya birayê xwe bike Şêxî Begê dide kuştin. Di çîrokan şanzdan de dîsa heman mijar e. Îja Siltan Xanima xweha Selîm Paşayê Rojkî alîkariyê ji birayê xwe re dike û ji bela Şêx Ehmedê Çiplaq xelas dibin.

Hezkirina bav û kur; bira bi birayî jî her weha balkêş e. Di çîroka sihî de Huseyîn Axayê Zilî ji ber fesadî, derew û buhtanên bira û torinên xwe dostekî xwe yê bi navê Feqî Ehmed bi kuştinkirin dide. Berî Feqî Ehmed bimire di zindanê de digel lawê xwe yî Bêlo demên xwe yî dawiyê dijî. Di wê demê de êşa ku Bêlo ji bo bavê xwe dikişîne perçeyek ji çîrokê ye. Çîroka bîst û nehê ya lehengiya Ehmê û Kerhê ye, ev her du bira dema digel hevdu bin hêzê ji hev distînin û di lehengiyê de kes nikare wan têk bibe. Lê di dawiya çîrokê de ancax waliyê Helebê û axayên herêmê dibin yek, bi artêşa nîzamî ya ji du hezar siwaran pêk tê û bi çar topan digrin ser her du birayan û pêncî siwarên bijare ên eşîra wan. Ehmê û Kerhê wekî gurên têkevin nava pez şer dikin û dijminên xwe perîşan dikin. Dema gule li eniya Kerhê dikeve û Kerhê ji hespê dikeve, Ehmê êdî hew dikare şer bike û ji hespê peya dibe û têk diçe.

¹⁷⁹ Findî, 2006.

2. BÛYERÊN ABORÎ SIYASÎ Û CIVAKÎ

2. 1. Şerê Mîrekiyên Kurdan

Dema mîrekiyên kurdan beşek ji dîroka kurdan e. Lê di derheqê mîrekiyên kurdan de zanîna me qels e. Lêkolînên xurt divê li ser mijara dîroka mîrekiyên kurdan bê kirin. Şerefname di vî warî de berhemeke girîng e. Di çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî de temaya têkoşîna desthilatdariyê ya di navbera mîrên kurdan de gelekî balkêş e. Di van çîrokan de cureyên tekoşînê ên wekî dîplomasi, siyaset, şer hîle tev jî hatiye bikaranîn.

Mihemed Begê ku mîrê Xunisê, ji hêla waliyê Erziromê Kor Yusuf Paşa ve ji welatê xwe bi malbatî tê derxistin. Kor Yusuf Paşa şûna Mihemed Begê Welî Paşa dike mîr. Lê her dem Welî Paşa bi şik e ku Waliyê Erziromê wî ezl bike û dîsa Mihemed Begê bîne dewsa wî. Îja ev tirs û şika Welî Paşa mijara sereke ya çîroka pêncê ye. Welî Paşa ji bo ji vî tirsê xelas bibe zilamekî xwe yê bi navê Behram bi pere û hespekî tima dike û peywir didê ku Mihemed Begî bikuje.

Behram berî suîkastê tê li xanekê dimîne. Çend rojan mala Mihemed Begê derdor çavradike, dibe êvar Behram çek û silehên xwe girê dide. Nîve şevê dikeve mala Mihemed Begê. Lê xweha Mihemed Begê pêjna Behramî dibihîze, diçe Mihemed Begê şiyar dike. Bi şiyarbûnê re jî ji mirinê xelas dibe. Bi xencerê arbede di nava wan de çêdibe û Mihemed begê bi ser dikeve. Behram birîndar dike bi vî awayî ji mirinê difilite.

Entrîkayên li dora bidestxistina Kela Şoxê dizîvirin mijara çîroka nehemîn e. Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan, ji dexesiya xwe dixwaze Şêxî Begê ku mamê Xan Mahmûd û mîrê Miksê ye bimire. Lê ew bi xwe cesareta kuştina Şêxî Begê nake. Jibo bi xweha xwe Adîle Xanimê ya ku hevsera Mîr Şerefê hakimê qezaya Şaxê bû, alîkarî bixwaze, bi dizî yekî dişîne cem. Ji xweha xwe dixwaze ku, Şêxî Begê vexwîne kelê û li wir kuştin bide.

Adîle Xanim jî xulamekî herema xwe dişîne ba Şêxî Beg, daxwaza hevdu dîtîne dike û vî mesajê dişîne: “Ji ber ku zarokên min jî tune ye, ez dixwazim ku Şêxî Beg mar bikim. Ev kela û mal û emlak û mucewher bila bigihêjin wî.” Şêxî Beg hem ji ber hewesên ciwanî, hem jî ji timaya mal û milkan pêşniyara Adîle Xanimê dipejirîne û digel sed dused mirovan tê kelê.

Adîle Xanim Şexî Begê û deh zilamên wî li keleyê dike mêvan, zilamên mayî jî li jêrî kelê dike mêvanê xelkê. Berî wê jî deh zilamên xurt û bi tiving û xençer ji bo kuştina Şexî Begê tîne kelehê û dike xulamê xwe.

Şexî Beg digel zilamên xwe tê dibe mêvanê kelê, hêla mêran li dîwanxaneyê rûdine. Kehyayê heremê şerbet, qawe, buxor û gulav îkram dike û gotinê xanimê digihîne: “Xanim aniha dua dike, ji we re silav dike, û dibêje hun bi ser ser û çavan hatine. Hinekî hêsayî bibin ez ê bi şev Şexî Begê bixwazim heremê, em ê bi hev re bipeyivin.”

Ji şev du sê seet dibihure, xanim xeberê dişîne ku were heremxaneyê. Şexî Beg, zilamên xwe li dîwanxaneyê dihêle û bi tenê tê heremê, li wir deh xulamên bi xencer hildikşin ser Şexî Begê û wî dikujin. Li cem Şexî Begê jî xencerek hebû, çend heban birîndar dike, lê li hember deh kesan şensê wî zêde tune ye û dimire. Piştî mirina Şexî Beg, zilamên wî yên li dîwanxaneyê mabû, digrin û hepis dikin dû re dişînin cem Îbrahîm Xan Beg. Zilamên mêvanê xelkê bûn jî digrin, tazî dikin û berdidin.

Piştî Şexî Begê li Miksê şîna wî digere. Lawekî wî bi navê Mu'tellah Begê wê demê duwanzde-sêzde salî hebû. Dema ew digihê, diçe heyfa bavê xwe, kelê zevt dike, wan deh zilaman dikuje. Dest bi Adîle Xanimê nade, tenê ji kelehê derdixe, çi mal û eşyayê wê hebin dest datîne ser û wê dişîne ba birayê wê Îbrahîm Xan Begê.

Honaka çîroka panzdehê, di mucadeleya bidestxistina desthilatdariya bajaran de rola durûtî û siyasetê ye. Şex Ehmedê Çiplaqê hakimê Rojkan, yekî zalim, bê dîn, xwunxwar û zalim bû. Wî li Xelatê hikum dikir. Ew Şex Ehmed “*paşê bela xwe jî dît*” dibêje nivîskar – ji ber riya bav û bapîrên xwe nagire xulam û etba'an xwedî dike. Bi siyaset mîritiya Xelatê zebt kiriye. Hespên qenc û xulamên dilêr peyda kiriye, ji aliyakî ve mirovan dikuje û cerîme digire û ji aliyekî ve jî dide xelkê û kerem dike. Ji ber wê jî kurd ewî wekî xwedî kerem dizanin. Bi vê terzê dused sêsed xulam û siwaran peyda dike û navçeyê zebt dike. Dîsa bi heman pîlanê dixwaze kela Elcewazê jî bi dest bixe.

Di wê wextê de bi wî re hemçax li Elcewazê Îsmâil Beg hebû. Ew jî têra xwe dilêr û aqil û ehl insan û ehalî jê xoşnud bû. Leqaba Îsmâil Begê di nava xelkê de Kuçik Şahîn bû. Ew herdu navçe nêzîkê yekûdu ne, mesafeya wan mîqdarê çar saetan e. Her çi kes ku ji zilma Şex Ehmedê Çiplaq direvin, dihatin ba Îsmail Begê disekinîn û xelas dibûn. Şex Ehmed êdî nedikarî tiştêkî bi wan bike, qadir nedibû. Lewra tewecuha nasan

hemûyan li Îsmâil Begê hebû û xelk ji ‘edla wî razî bûn. Şêx, bi hîle di nava xwe û Îsmâil Begê dostaniyê datîne, jê re dibêje, min di xewna xwe de dîtiye ku ez û tu bûnê birayên axretê. Bi vê terzê Îsmâil Beg dide baweriyê.

Êdî herdu dibin birayên axretê û zêde bi hevdu bawer dikin. Lê biratiya Îsmâil Begê sadiq bûye, lakîn dostaniya Şêx Ehmedê bi heramzayî bûye. Rojekê wekî adetê, Şêx Ehmed, peyamekê bi rê dike ku ji mêj ve min Îsmâil Beg nedîtiye, ez ê bême silaviya wî. Ew jî qebûl dike ku bilanê kerem bike û bê. Îcarê jî Şêx kurê xwe Şêx Mihemed Begê re dibêje ku

“ Ez di gel deh xulamên diçime kela Elcewazê nik Îsmâil Begê, tu bi şev tenbiye bike, her çi siwar û peya di nêva qeseba Xelatê da hebin, hemûyan nivê şevê digel xwe hilgire û nêzikê fecrê werine dora kela Elcewazê, şûlekî min heye.”

Şêx diçe serê kelê cem Îsmâil Begê. Îsmâil Begê, jê re izet û ikramê dike û di gel yekûdu di meclisê de heta dereng rûdinin. Li ba Îsmâil Begê bîst sî mirov Xulam û zilamên wî hene. Lê ji ber ku Îsmâil Beg radibe û diçe heremê û xulamên Îsmâil Begê jî her kesek diçine malên xwe, hêşî û dergêhên kelê jî dadidin. Li dîwanxaneyê Îsmâil Begê tenê dergewan û qawecî û sê çar mirov ji etbaên wî dimînin. Paşê wekî saet dibe şeş, Şêx di cihê xwe de bi derewan dibêje ez sancî bûme gazî Îsmâil begê bikin, bilanê bê, çareyekî li min bike. Îcarê dergewan diçe ba Îsmâil Begê dibêje ku: “Şêx Ehmed sancî girtiye û zêde bêhal e û nêzik e wê bimire, ji boyê wesyetê gazî te dike.” û wî tîne.

Îsmâil Beg jî bawer dike, ji nivînê radibe û tê dîwanxaneyê nik Şêx. Wekî Îsmâil Beg tê û rûdine, edî ew bê dîne Şêx Ehmed, ji nişka ve dide xençerê û hucûmê Îsmâil Begê dike û du sê xençeran le didê. Emîr û xulamên Îsmâil Begê ku li wê derê li nik wan bûne, digirin û hepis dikin. Îcarê dergêhê kelê dide vekirin û xulamêkî dişîne cem kurê xwe Şêx Mihemed ku di gel leşkerê Xelatê werin nêva kela Elcewazê. Ehlê hêşetê her kesek bê xeber li malên xwe razayîne. Bi vê terzê Şêx kela Elcewazê zebt dike. Cenazeya Îsmâil Begê, bi Adilcewaziyan dide defînkirin. Bi vî awayî mal û eşyayên wî zevt kir, malbat û zarokênên Îsmâil begê ji kelê deranî.

Mudeyê du sê salan bi zora xwe Adilcewazê di destê xwe de hişt. Kurekî Îsmâil Begê biçûk bi navê Sadiq Beg hebû, ahaliyan digel Sadiq begê ittîfaq kirin û Şêx li

Xelatê dan ber tivingan û qewirandîn û êdî nehêlan nêva xwe. Kurê Îsmâîl Begê Sadiq Beg kirin mîrê xwe.

Di çîroka şanzdehê de jî leheng, Şêx Ehmedê Çiplaq e. Di vir de mijar dijminahiya wî û Selîm Paşa ye. Şêx Ehmed (Seyîd Ehmed) her wekî di çîroka panzdehan de jî hatibû gotin, hakimê Rojkan e. Bi zilm û dizî gelek dewlemend dibe. Nivîskar Şêx Ehmed wiha dide naskirin “ Şêx Ehmedê Çiplaq ku belaya xwe dît paşê, îcarê ewî Şêx Ehmedê zaf diraf bi zilm û dizî bi hev xistî digel Selîm Paşayê Rojkî bûye dijmin û neyarî kirî.”

Seyît Ehmed bi leşkerê Erziromê re dibe yek, Bazîd û Wanê distîne û tê êrîşî Selîm Paşa dike. Selîm Paşa li Bedlîsê li ber xwe dide, lê têk diçe û direve Sasonê. Şêx Ehmed jî Bîtîsê talan dike û tê li Mûşê li serayê rûdine. Xweha Selîm Paşa jî li Mûşê bû. Ji bo belaya Şêx Ehmed xelas bibe ji xweha xwe Sultan Xanimê alîkariyê dixwaze. Sultan Xanimê jî xulamêkî xwe yî file yê bi navê Mixo peywirdar dike ku warîleke barûd têxe bin odeya wî û bi hewa xîne. Mixo peywira xwe bi cî de tîne Şêx Ehmed û zilamên wî bi wê teqîna barûdê bi hewa dixwe û dikuje. Pê Şêx Ehmed du kurên wî yên ji wî xerabtir tên şûna bavê xwe û heta Rom li wî welatî dibe desthilatdar ew hikum dikin. Dawiya çîrokê de nivîskar derheqê aqubeta Şêx û kurê wî de hêst û ramanên xwe, wiha dibêje:

“ Mizgînî ji boyê Selîm Paşa çûyî, hat û dîsa cebrî bûye hakimê Rojkan. Ev fileyê ku eve şûla kiribû zaf malê daye, çirax kir û Şêx Paşa jî belaya xwe dît û xelq ji şerêd wî xelas bûn lakin ewî jî kurêd ji babê bedtir hebûn, navê yekî Şêx Mihemed Beg û navê yekî Şêx Mistafa Beg. Îcarê ewan xelat zeft kirî, dest bi fitne fesad û mirov kuştinê kirin û gelek bêedebî kirin. Ewî Şêx Mihemed Begî zaf jinêd file û misilmanan rakeşan û bi zorê înan li xwe mar dikirin. Ewî jî dibêjin ku bi xwe bi deste xwe bela şiriket (şeket, şedeket)(?) çil nefer mirov file û misilman qetil kire. Paş weko de’wa Bedirxan Begê bûyî û Rom li Kurdistanê Xalib bûyî, ew Şêx Mihemed tebdîl el libas bûyî, revî û çûye Bexdayê wenda bûyî. Birayê wî Şêx Mistefa girtin, di gel Xan Mehmûd, birine Urisçuxê nefî. Niha jî li wê derê ye. Pêşîra ‘ebadullahê ji wan xelas bûyî û xelq rehet bûyî.”

Çîroka bîst û yekemîn jî di kela Şaxê derbas dibe û dîsa şerê mîran ê têkoşîna desthilatdarî ye mijar. Lehengên wê Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan û Şakir Axayê

Şengê ku axayê Hertûşiyân e. Şakir Axa di nava kurdan de yekî zêde zêde biqedir e. Paşayê Wanê û Mîrê Hekariyan leşkeran dişînin ser wî lê bi ser nakevin. Mîr û paşayên li wê derdorê tev qesda wî dikin, dîsa jî ew nakeve zevtê. Êdî Çetecî Evdillah Paşa ji Paşayê Wanê re fermana wî birêdike. Paşayê Wanê jî vê fermanê dişîne ba Îbrahîm Xan Begê. Lê nêta Îbrahîm Xan Begê ne bi zorê bidestxistina Şakir Axa ye. Ji ber ku çend carên dine ceribandibû lê bi ser neketibû.

Îbrahîm Xan Beg, bi fen û fûtan çareya bidestxistina wî difikire. Berê, qasidan dişîne bi dek û dolaban dostaniya wî dike. Dû re wî vedixwîne ku bike mêvanê xwe. Lê Şakir Axa bawerî pê nîne, qebûl nake. Piştî wê Îbrahîm Xan Begê dibêje wê çaxê ez werim mêvandariya te. Şakir Axa vê yekê diperjirîne. Îbrahîm Xan Begê û zilamên wî tên dibin mêvanê Şakir Axa û li wir piştî çend rojan firsetê dibinin û wî dikujin. Îbrahîm Xan Begê, Şakir Axayî li mala wî û di nav êla wî de dikuje.

Ji ber ku kurd dest li hember mîr û axa hilnadin, kes heyfa wî hilnînin. Mela Mehmûdê Bazîdî¹⁸⁰ di berhema xweyî Adat û Rûsumetnameyê Ekradiye de, sedema wê bi awayekî berfirehî dibêje. Mela Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe ya Adat û rusûmatnamê Ekradiye de jî dibêje:

“ Ekrad ji emrêd mezinên xwe bidernakevin û ehlê ekrad eger xwecihî û eger rewend qewî zêde hakimperest û axaperest in. Zêde îtîata mîr û axayan dikin. Bilanê hakimê wan fileyek jî bitin êdî zêde îtîatê dikin lakîn ji hemcinsêd xwe dexesî dikin bi înad û bi kîn û qudret eger cinsêd wan yekî jê ra bibine hakim û axayêd wan îcarê ewî qebûl nakin û îtîata wî nakin.”

Di çîrokê de jî zilamên Îbrahîm Xan Begê derî li ser xwe kilît kirine û ditirsin zilamên Şakir Axayî êgir bi wan xînin û bisojin lê tiştêkî wiha nabe bi gotina Mela Mehmûdê Bazîdî

“Lakin newêran. Lewranê Ekradêd re'ya li ber mîran û begzadan dest hilnagirin û jî paşê mulaheze dikin.”

Îbrahîm Xan Begê serê Şakir Axa jêdike û ji Paşayê Wanê re dişîne. Meriv û eşîra wî bêdeng laşê wî vedişêrin. “Piştî miriyan kes namirin” dibêje nivîskar. Weha diçe Şakir Axa.

180 Findî, 2006, r. 34-40

2.2. Îdareya Dewletê

Çîrokên bi naveroka îdareya dewletê hatine ristîn hêja ye ku di mijarekî de bê vegotin. Birêvebirina welatekî elbet ne karekî hêsan e. Hem berpîrsiyariyeke mezin divê bîn hilgirtin û hem jî jîrbûn lazim e. Çîroka yanzdehan di birêvebirina bajêr de, girîngiya memnûnbûna xelkê bi hêmanên çîroka gelerî, hatiye vegotin. Jina paşayî jî her wekî jinên axa û xulaman dixwaze cil û xişrên xweşik ên ne kêmî jinên xelkê li xwe bike.

Rojeka eydê jinên axa û xulaman cejna xanimê pîroz dikin û diçin destê wê, lê xanim ji ber kinc û xemla xwe fedî dike û ji wan diheside. Êvarî xanim bê kêf e û ji mêrê xwe re mirûzê xwe dadiliqîne. Paşa dixwaze ku xanima xwe îkna bike ku kêfa jinên axa, leşker û xulaman tenê bi xeml û xişr û kincan tê. Statuya jinên axa, xulam û leşkeran û xanima paşa ne wekî hev in. Peywira wê û jinên dinê ne wekî hev e û ew ji gişan mezintir e. Lê xanim bi vê bersivê aş nabe. Hîn jî dibêje bila xeml û cil û xişrên min jî wek wan be. Paşa jê nake der ji xulam û leşkerên xwe re meseleyê dibêje. Xulam û leşker destê sibehê dora Bazîdê digrin. Xanima Paşê dibêje qey dijmin girtiye ser wan û ditirse. Wê wextê fam dike ku cilên xweşik û xişrên bi qiymet têra parastina wî bajarî nake. Difikire ku dilxweşkirina xulam û leşkeran hîn bi menfeata wê ye û tê ser peyva mêrê xwe.

Di çîrokbêjiya gelerî de bêtir girîngî li ser şîretkirinê de ye. Vebêjer ji ber wê carinan hewce nabîne navan li lehengan jî bike. Paşa dibêje, lê kes nizane paşayê ku ye. Xanima paşê lehengeke sereke ye lê naveke wê jî tune ye. Tenê di çîrokê de navê Bazîdê heye. Di vê çîrokê de unsûrên terza çîroka gelerî hîn beloq e.

Di çîroka yanzdehan de girîngiya leşker, axa û xulaman a di îdareya dewletê de hatibû vegotin, di çîroka bîst û sêyê de jî mijarê biriye ser jîrî û qurnaziyê. Lehengê çîroka bîst û sêyê Çetecî Evdillah Paşayê Waliyê Erziromê ye. Rêveberiya herêma xwe tenê bi hêzên leşkeran nameşîne, bi aqilê xwe jî birêvedibe. Çetecî Evdillah Paşayê bûyera diziyekê bi vî awayî derdixe û sûcdaran ceza dike. Rojekê bişev diz dikeve mala yekî û tiştên wî tîn dizîn. Mirovê ku mala wî hatiye tazîkirin, dihere giliyê xwe ji walî re dike. Waliyê Erziromê Çetecî Evdillah Paşa bi qurnazî planekê çedike. Dike ku ev dizên malê derkeve holê û ceza bike. Plana walî pir hêsan e, lê belê bi derûniya sucdariyê dike ku diz xwe bidin dest.

Berê ji xwediyê malê dipirse ku ka diz çawa ketine hundur. Piştî ku têdigihê ku ji derî ketine hundur, ji xwediyê malê re dibêje here derî bîne ez ê derî bipeyivînim ka kî ketiye hundur. Xwediyê malê ji ber vê fikra ecêb şaş dibe, lê çî bike walî emir kiriye. Ji derdorê re dibêje walî ev derî xwestiye ji bo ku bipeyivîne. Ev xeber diçe guhê herkesî heta guhê dizan jî. Ên kêfçî û meraqçî tev jî ji bo bi walî bikenin tên meydanê. Her weha diz jî merakan dikin û tên temaşayê. Herkes ecebmayî ne, bê wê çawa derî bipeyive. Tiştêk ji êqil dur e yan walî aqil berdaye yan jî kerametêk heye. Li aliyê din walî bi tedbîr e. Çend zilamên xwe peywirdar kiriye ji bo li gel çavdêriyê bikin, ji hal û helwestên wan baldar bin. Walî dizan ji tevger û hereketên wan derdixe. Hevoka dawiyê bi gotina “ *Ev qeziye ji eqil û derîta Çeteçî Ebdullah Paşa yadgar maye û tete neqil*” diqedîne.

2. 3. Pêwendiya Kurd û Îraniyan

Em bi awayê rasteqîn, di nava pergala feodalî pêşketina mîrekiyên kurdan ji Şerefnameyê hîn dibin. Şerefname bi vî halî çerçoweya rewşa 1596an dide ber çavan. Bi tekoşîna di navbera Safewîyan û Osmanîyan re girîngiya kurdan ya li qada siyasî eşkere bû.¹⁸¹ Ji ber Şah Ismaîl şîiyeke tûj bû û ji kurdên sunnî re bêrehm bû, siyaseta xwe jî di vê xêzê de meşand. Serokeşîran dida girtin û waliyeke qizilbaş dişand jibo rêvebirîya herêmê. Siyaseta dewleta Osmanî bi destê mîrekê kurd Hakim Îdrîs teşe girtibû. Li gorî vê siyasetê di cih warê xwe de bi sazûmaniyeke feodalî welatê xwe birêve dibirin. Dewleta Osmanî bi vê siyasetê piştgiriya kurdan girtin.¹⁸²

Tekoşîna kurdên sunnî û xwendkarên Safewî di çîroka Bazîdî ya sî û çaran de hatiye hûnan. Mijara Kela Dimdimê di nav wêjeya kurdî ya devkî de gelekî namdar e. Niha jî gelek nivîskar vê mijara lehengiyê di berhemên xwe yên nivîskî de dinitirînin. Ferhat Shakely ji bo çîroka kela Dimdimê ya Mustafa Salîh Kerîm¹⁸³ balê dikşîne ser hêla nivîskariya wî ya ku destana folklorî kiriye çîrokeke edebî. Mustafa Salih Kerim çîroka xwe ya li ser vê mijarê di sala 1960î de nivîsandiye. Bi mebesta tekoşîna azadiyê ya bapîr û ecdadên xwe bigihîne xwendekaran û ji wan re vebêje nivîsandiye. Mela Mehmûdê Bazîdî, çîroka sî û çaran a bi heman mijarê, sed sal berî Mustafa Salih Kerim ristiye. Di çîroka Kela Dimdima Mustafa Salîh Kerîm de du mijarên sereke hene: 1. Şer û berxwedan. 2. Evîna Evdal Begê kurê Emir Xan û dergistiya wî Viyan. Lê di çîroka Bazîdî de ya sî û çaran tenê şer, berxwedan û lehengî heye. Piştî berhema Mustafa Salih

181 Bois, Th, V.Minorsky û hwd., 2004, r. 83.

182 H.b., r. 83.

183 Mustafa Salih Kerim, Şehîdanî Qelay Dimdim, Suleymaniye, 1960.

Kerîm, Ordîxanê Celîl¹⁸⁴ jî doktoraya xwe li ser vê mijarê kiriye, ji heremên cuda, ji serdemên cuda şeş varyantan berhev kiriye. Aniha ev tez jî hatiye wergerandin ser zimanê tirkî. Ji xêndî van nivîskaran ereb Şemo¹⁸⁵ û Jan Dost¹⁸⁶ çend nivîskarên girîng in ku heman destan di berhemên xwe de hûnandine.

Lehengê çîrokê Xan Evdal hîn bêtir wekî mîrê çepilzêrîn tê nasîn. Di navbera wî û xanê rafîzî Esker Xanê Îranî de dijminî heye. Esker Xan bi yanzdeh hezar siwar û peya tê hinda Kela Dimdimê, ji çar kenaran dorpêç dike. Di kelê de tenê hefsed mirov û zarok û jin hene. Ev hefsed mirov bi yanzdeh hezar leşkerên Îraniyan re şer dikin. Her roj heya êvarê Evdal Xan û sed zilamên wî derdikevin ber deriyê kelê şer dikin ên sax dimînin dîsa vedigerin kelê. Îmdadê ji Romê, ji paşayê Wanê û mîrê Hekariyan dixwazin lê sê meh jî diqede kes bi hawara wan de naye. Her diçe mirovê kelê kêmbibin, xwarin û cebxane hindik dimîne. Evdal Xan bi gelên mayî dişewire, bê ka em çawa bikin. Xanima wî Guher Xanim, fikra teslîmbûnê qebûl nake û pêşniyara berxwedanê heta mirinê dike. Çiqas mîrên gazî û jinên dikarin şer bikin derdikevin derê keleyê şer dikin. Bûk û qîzên ku quweta wan a şer tune ye jî jahrê hazir dikin ku dema yê şer dikin şehîd bibin, ew jî vexwin. Asmê Xanim çî cebxane û barûda mayî li ciyekî kom kir û dema leşkerê Rafîziyan xalib werin û bikevin hundirê keleyê bi hewa bixe. Gelek ji eskerên Rafîziyan jî bi vê telef dibin. Lê ji Kela Dimdimê zêde kesî sax namîne. Rafîzî, çend ixtiyarê mayî dikujin û zarokan jî esîr dikin.

184 Çapbûna pirtûka têza Ordîxanê Celîl a doktorayê (Êposa Kurda ya Mêrxasiyê, Xanê Lepzêrî Kela Dimdim) li sala 1966an, ku bi zimanê Rûsî hat weşandin, xebateke nû û dîrokî bû ji bo nasandina jiyana Kurdan. Ordîxanê Celîl bi hûrbîni di vê lêkolîna xwe de pirsên herî girîng li ser vê bûyera dîrokî raxistibûn pêş çavan, Wî ew bingeha dîrokî ya êposê, dîroka belavbûn û nivîsandina nimûneyên vê destanê, naveroka êposa” Xanê Lepzêrîn” û pirsên taybetî li ser bedewî (xweşikî) û lîtêraturî ya destanê û pirsên din nivîsandibûn. Di vê pirtûkê de Ordîxan li rex çend nimûneyên çapbûyî û destnivîsên êposa Dimdim, ku ji arşîva Rûsiyayê hatibûn derxistin, di şeş şaxan de wergerandibûn ser zimanê Rûsî û di paşekoka pirtûkê de weşandibûn. Xala herî girîng di vê lêkolînê de ew bû, ku Ordîxan lêkolîna xwe li ser bingeha çavkaniyên fireh û kêmbaskirî, pêkanîbû. Ev jî dibe sedema wê hindê, ku mirov vê xebata Ordîxanê Celîl karekî akademîk bihesibîne, ku yê di dîrokê de bimîne û ji bo pirtûkxaneyê millî ya Kurdistanê dewlemendiyê mezîn e. Balkêş e ku Ordîxanê Celîl sala 1958an ji bona civandina şaxên êposa Dimdim bi şewira nemir Mela Mistefa Barzanî diçe Uzbekistanê û li herêma Altayê di nava çekdar û mêrxasên Barzanî de mehekê dibe mêvan û ji kesên dengbêj û zanayên destana Dimdim, çend şaxên balkêş dinivîse.

185 Erebo Şemo 2005, Romana wî Dimdim romaneke dîrokî û yek ji romanên pêşîn ê di wêjeya kurdî ye. Derdibire ku çawa di bin serektiya Xanoyê Çengzêrîn de, tevî şênîyên kela Dimdimê, çî jin çî zarok, çî biçûk çî mezîn li dijî artêşa Şahê Îranê şer dikin, kelê diparêzin û di dawiyê de heya xwe nedîn kuştin jî dev jê bernadîn. Cara pêşîn di sala 1966an de li Rewanê çap bûye. Cara duyemîn di sala 1974an de li Moskowê, tevî wergera Rûsî çap bû. Di sala 1975an de li Bexdayê bi Soranî û bi tîpên Erebo çap bû. Di sala 1983yan de li Stokholmê bi latînî, di nav weşanên Roja nû de çap bû.

186 Jan Dost, Kela Dimdimê, Avesta, Stenbol, 2011.

Her wekî Bazîdî jî di berhema xwe de dibêje Kela Dimdimê aniha di nava sînorê Îranê de li herêma Mergeverê ye. Destana Dimdimê di serê sedsala XVIIan de (1608–1610) li perçeyê Kurdistana Îranê qewimî ye. Mijara wê di kelaya dorpêçkirî de berxwedana bi lehengî ya li hember teslîmîyet û dîlbûyînê ye. Bêyî ku hêviya serketinê hebe û ji bo ku bi saxî nexevin destê dijminên xwe yên Îranî berxwedane. Li gorî çavkaniyên Îranî Xanê Kurdên Bradostan Emir Xan bi destûra Şahê safewî Ebbasê I. Li herêma Mergeverê, nêzîkî gola Urmîyê, li asoyê çiyayekî Kela Dimdimê însa kiriye. Lê ji ber ku ev xanê kurdan roj bi roj bi hêztir dibe, ne bi dilê şah e û digre ser Kela Dimdimê. Piştî muharebeya bi salan û ji Hekarî û ji Romê alîkarî naye, Kela Dimdimê bi top û tivingan dikeve.

Bingeha Destana Dimdimê bûyereke rastîn e. Ev çîrok hem bûye mijara wêjeya folklorî ya devkî, hem jî ya klasîk. Her çiqasî em rastî varyantên Kela Dimdimê yên ji heremên cuda ji devê dengbêjan werin jî, ev naye vê maneyê ku bingeha vê destanê xeyalî ye. Di dawîya çîroka xwe de Bazîdî jî zikir dike ku ev destan ji hêla Meleyê Bateyî ve jî û ji devê dengbêjan jî hatiye ristin û di meclîsan de tê xwendin. Bazîdî tesîra vê destana ya li ser kurdan weha vedibêje:

“ Eve qezya şerê Kela Dimdimê qewî meşhûr û me’rûf e di Kurdistanê danê. Melayê Bateyî li vê qisey destanek însa kiriye, ekserê Ekradan wê destanê di meclîsan danê dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û du’ayê dikin ”

Pîremêrd Hecî Tewfîq jî di çîroka xwe yî bi navê “Dwanzde Siwarêy Merîvan”¹⁸⁷ ya çapa I. Suleymaniyê di sala 1935an de bûyereke salên 1700î vedibêje. Donzde siwarên mîritiya Baban bi êrîşekê, donzde hezar siwarên Îranê maxlûb dikin. Bi vê êrîşê mîritiya Baban xelas dibe. Di vê çîrokê de adetên wê demê, seraya paşa, adetên seyde, mazûbanî, def û lêdan ya girîng taktîkên şer dide nasîn.

Çîroka sî û nehê, qewimînên siyasî û tesîra tevger û exlaqê kurdan yên li ser bûyerên demê, bi awayekî vekirî dide pêşberî me. Malûmî herkesî ye ku Îranî û Osmanî ji ber ku du dewletên xurt bûn, ji berê de raqîb û dijminên hev bûn. Her du dewletan hêzên kurdan ji bo serketinê, herêma wan jî wekî herêma tampon û sînorên ewlehiyê bi

187 Shakely, 1998, r..29

kar anîne. Şerê Îranî û Osmaniyan ya di sala 1235an mişextî de(1824-1825 zayînî)¹⁸⁸ rista kurdan, serfiraziya dewletan diyar dikir.

Çîrokên li ser mijara şerê Îran û Osmaniyan esasên xwe daniye, lê li ser mijara li hember heqaretê tewirgirtinê bîna bûye. Zeman Xanê li Îranî Ayromî di hizura Ebbas Mîrzayî Abbas Mîrza wê demê warisê texta Îranê bû de ji Silêman Axayê Sibkî û Huseyn Axayê Zilî re dibêje zen qahpe (jin qahpe?). Abbas Mîrza pêşî deng nake lê dû re ji hizûra xwe diqewirîne. Lê Silêman Axayê tehemul nake û di bin vê heqareta Zeman Xanê de namîne. Dibêje ez êdî li vir namînim. Ji Îranê vedigere. Huseyn Axayê Zilî bi wî re venagere li wir dimîne.

Silêman Axa piştî vedigere bi qedereke li benda heyfihilanînê dimîne. Silêman Axa ji bo heyfa zen qehpetiyê ji Zeman Xanê hilîne, her dem wî dişopand. Berî şerê Îran û Osmaniyan biqewime dihere cem waliyê Wanê Sert Mehmûd Paşa dû re vedigere welatê xwe. Dema şerê Îran û Osmaniyan li deşta Eleşkîrê diqewime û artêşa Osmaniyan têk diçe¹⁸⁹ bi hefsed siwarên xwe êrîşê bir ser artêşa Zeman Xanê Ayromî bera wî dide û wî dil digre.

2.4. Pêwendiya Kurd û Osmaniyan

Di çîroka sî û duyê de dostaniya Paşayê Bazîdê Ishaq Paşa û xanê xwecih Huseyîn Qûlîxan hatiye vegotin. Ev ji aliyê ku tekîliya kurdan û rêvebirên Osmaniyan dide ber çavan, balkêş e. Çîrok bi çûna Elî Tebîb a Bazîdê dest pê dike.

Huseyîn Qûlîxan hekîmê xwe Elî Tebîb dişîne cem Ishaq Paşayî ku di bin emrê wî de bixebite. Elî Tebîb, qederê pênc mehan li Bazîdê li hinda Ishak Paşayî dimîne, lê kes ji bo êşekê, nexweşiyakê, yan jî derdekê nayên cem. Bûye havîn, jî hîn yek kes ji bo nexweşiyekê wî nedîtine. Tebîb aciz dibe û li wê derê, xwe wekî belasebe dibîne. Carekê Paşa û siwarên xwe diçin sedyê, tebîb jî bi wan re ye. Dibe wexta navrojê xwarin ji gundê Zengezorê tê nav rezekî. Wekî adet e, berê paşa, siwar û tebîb ji xwarina nav sênîyên sifir dixwin. Elî Tebîb ji bo jahrî nebe ji xwarinê naxwe. Ên dinê dixwin, radibin. Piştî nîv seetî xwarina li ber tavê mayî, xulam û gundî tîn dixwin. Elî

188 Jibo hîn bêtir agahî Bnr. Filiz Güney, XIX Yüzyılın İlk Yarısında Osmanlı İnan İlişkileri ve İnan'ın Giden Türk Elçileri, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Afyon Kocatepe Üniversitesi Afyonkarahisar, 2005, r. 42-59.

189 Jibo hîn bêtir agahiya vî şerî Bnr. Güney, 2005, r. 42-59.

Tebîb xwe bi xwe dibêje tew tune be çendên ji van, ji vê xwarinê jahrî bibin, ez ê jî wan derman bikim.

Dibe êvar dermanê xwe hazir dike guhê wî li gaziye ye. Lê deng ji kesî naye, dibe sibe dibîne ku herkes spîsaxlem e. Rojekê, du rojan, sê rojan sebir dike, le tişt bi kesî nehatiye. Biryarê dide ku vegere welatê xwe. Elî Tebîb piştî ku vedigere welatê xwe, sedema bi şûn de vegera xwe, weha ji mîrê xwe re vedibêje:

“Xan te ez virê kirime nêva tayfayekê ku wucûda wan bi xwe derd û bela ne, mirin û kuştin ji wan peyda dibitin, ew xelkê û ‘ibadullahê dikuşin û rencîde dikin, bedena wan bi xwe jehrî ye, nexweşî û jehr dê bi jeherê çî biketin, hal û hikeyeta Ishaq Paşayê û ehalêd Kurdîstanê eve ye û ez pênc mehan di nêva wan de sakin bûm, esla yek ji wan muhtacê ‘ilacê nebûn û axirê jî min dît ku ewan ew zadêd weko jehrê xwarin, dîsanê li wucûda wan tesîr nekirin, êdî min zanî ku betal e, ez hatim.”

Di çîroka çilî de eqil û cesareta Melîke Xatûnê hatiye vegotin. Belaya lewendan û mucadeleya xelasbûna ji lewendan wekî mijar hatiye hûnandin. Serketina şeran tenê bi hêzên eskerî naye bidestxistin, eqil jî hêmaneke girîng a şerî ye. Hetta meriv dikare bêje aqil çeka herî bi hêz e. Gelek şer hene ku ne bi zorê hatiye bi dest xistin û şerên bi aqil û qurnazî serfiraz bûne ne hindik in. Hinek ji van jî bûne mijarên destanan. Mînak wekî Destana Aeneas a Vergîlîs.¹⁹⁰ Şerê Troya deh salan dewam kiriye. Êdî leşkerên Argosê betilîne, hêviya wan şikestiye, nema dikarin êdî têbikoşin. Hîn jî Kela Troya’yê nakeve. Bi hîleyekê dikevin nava kelê û bajêr xera dikin. Wekî tê vegotin bajarê Troya ne bi lehengî û leşkerî bi aqil û qurnaziya Odeseus tê bidestxistin.

Ji bo baqilî û qurnazî mînaka herî xweş çîroka çilî ye. Ev çirok her wekî hikayeta sih û nehê rewşa civakê dide, lê vê carê hîn bêtir rewşa civaka gelên Osmanî ya dawîya sedsala XVIIan û rêxistin û rêveberiya mîrekiya Behdînan li ber çavan e. Lehengên sereke, Axayê lewendan¹⁹¹ û Mîr Şemdîn û Melîke Xatûn e. Lewend qismek ji artêşa hikumeta Osmanî ye. Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo Lewendan dibêje “tayfeyekê leşkerê Romîyan”

190 Jibo Destana Aeneas Bnr. Vergilius Destana Aeneas.

191 Di Camî’iya Risaleyan û Hikayetan de beşa çirokê kurdî de ji bo navê Siwarên London li A. Jaba wergera fransewî ya Camî’iya Risaleyan û Hikayetan ya bi navê “Receuil de Notices et recits kourdes” wekî siwarên Lewendan derbas dibe.

Kaos û aloziya ku Lewend li gel dikin sedema mijara vê çîroka Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Derheqê serpêhatiyên gelê Osmaniyan û Siwarên Lewendan ku wexta li Anadolê derbas dibin tenê wekî paragrafekî agahî dide. Derheqê bûyerên berê qewimiye wiha dibêje:

“ Li hemû welatên romê ew leşkerên Lewendan hebûn û qewî leşkerekî serbest û bêperwa bûyin. Gelek zilm û ta’da li gundan û reaye û feqîran dikirin. Zaf caran itaeta paşayêd welatan nedikirin. Her bi vê rojê cebr û zilma wan zêde bûyî, tuxyan û isyan dikirin û bi xweserî diçûne welatan û dibûne mêvan û dirav distandin û ‘ibadullah dişelandin.”

Sedema rabûna ferman û hatina wan a ber bi Diyarbekir, Bişêriyê û Akreyê herêma Behdînan ve Mela Mehmûdê Bazîdî bi van hevokan vedibêje:

“Lê dema piştî ev giliyên xelkê û ji xwe nerazîbûna xundkarên Osmanî fermana wan radibe.”

Cihê ku Lewend lê niştecih in, Amasya Toqat û Sîwas e. Piştî fermanê Lewend mecbûr dimînin ku birevin. Ji cihe jê direvin û ser riya xwe çî gund hebin dişelînin û kurên wan ji bo bikin kole direvînin.

Ji ber ku fermana Lewendan, a li ku derê bin bîn girtin û kuştin û çî eşya û hespên wan hebin ji xelkê re bin, rabibû. Êdî tu tirs û perwa wan nema bû. Li ku derê dadiwerin bi xerabî ji wir diborin. Bi vê terzê tîn û dixwazin ji cihe herêma kurdan biborin û tîn herêma Bêhdînanan.

Axayê Lewendan Hafîz Axa pêncî siwaran dişîne ba mîrê Akreyê. Dawa çend rojan li wir mayîne dikin. Mîr Şemdîn dikeve nava fikaran. Eger wan qebûl bike nabe, ji ber ku aqubeta ên qebûl kirine bihîstîye. Tiştê bi serê bajarê dinê hatiye dizane. Heger bi van pêncî siwaran re şer bike du hezar siwarên mayî wê du sed sêsed malên wan perîşan bikin. Hem ji bo xwe biparêzin û zirarê nebînin, hem jî ji bo malên Lewendan ji xwe re bihêlin planan çêdikin, ne Mîr Şemdîn ne jî gelên Akreyî kes xwe nade ber kuştina Axayê Lewendan. Melîke Xatûn berpirsiyara kuştina wî digire ser hustiyê xwe. Mîr Şemdîn û gelên Akreyê siwarên Lewendan; Melîke Xatûn jî Axayê Lewendan bi aqlê xwe û qûrnaziya xwe dikuje. Bi vî awayî ser dikevin û bi vê baqîlbûnê hem zaiyata wan çênabe hem jî vê belaya Lewendan ji serserê xwe diqewirînin. Di ser de jî ji ber ku

fermana wan rabûbû, laşên wan ji waliyê Musûlê re dişînin û siyaseta di navbera xwe û Osmanî de xurtir dikin.

2. 5. Lehengên File (Ermenî, Nastûrî), Frengî

Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî hem ji hêla wêjeyî hem jî ji hêla civaknasiyê ve girîng in. Dikare bê gotin ku, wî bi çîrokên xwe wêneyê civaka dema xwe kişandiye. Di fotografa ku kişandiye de her civak bi rengê xwe teyisiye ser wêneyê. Çi etnîsîte, çi bawermendên dînên cuda cuda, çi eşîr, çi malbat çi ermenî, nastûrî, frengî, ereb, tirk, faris, êzîdî, kizilbaş, sunnî, êris gişan renk dane van çîrokan.

Heta dawiya sedsala XIXan jî ermenî di bin rêvebiriya mîrekiyên kurdan de dijîyan. Tekiliya di navbera her du milletan bi gotina dîplomatek Ewropayî “Du birayên heman hewayê bi hev re dikşînin û heman avî bi hev re vedixwin” bû.¹⁹²Mela Mehmûdê Bazîdî di derheqê fileyan wiha dibêje:

*Li Kurdistanê degera 70 hezar malên re'ayên ermen, 15 hezar malên nestûriyan (asûriyan) û 200 malên cihûyan hene. Reiyê û ermen li Kurdistanê di her tiştî de mîna kurdan e, tu ferq di neqeba wan de nîn e. Piraniya wan bi kurdî dipeyîvin. Jin û zarok tenê bi kurdî dipeyîvin û tu zimanekî din nizanin. Adet û sincên wan mîna yên kurdan e. Berevajî welatên musulmanan yên mayî, jin ji civatên mêran narevin. Di cejn û dawetan de jinên re'yî yên musulmanan bi hev re destên mêran digrin û tev de govendê digerin. Kurd û ermen dibin kirvên hev. Ew bi hev re baş dijîn û zorê li hev nakin, mîna li hin êrdimên din diqewime...*¹⁹³

*Hêjayî gotinê ye, ku re'ayên Kurdistanê jî vexwarina araqê, qumarê û qehbetiyê nizanin. Re'aye çekdar in û gava diqewime bi musulmanan re şer dikin. Wan bi mêrxwasiya xwe gelekî deng dane. Nestorî bi mêrxwasiya xwe li pêş kurdan e jî. Zimanê pê dipeyivin, zimanekî cuda ye, serbixwe ye. Belê bi erebî dixwînin û dinivîsînin û alifbeya erebî bikar tînin.*¹⁹⁴

192 Bois, Th, V.Minorsky û y.d., Kürtler, Kürdistan, 2004, r. 102.

193 Neqila ji pêşgotina pirtûka Y. Y. Vasilîva ya “Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê”, Ziya Avcı, “Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, Kovara Bîr, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> 14 Mijdar 2012.

194 H.b. Ziya Avcı, 2012

Çîroka heştan li ser evîna Polo û Barnika Mexînî (Nastûrî) ¹⁹⁵ ye. Ji ber feqîriya Polo û xesîsiya bavê Barnikê her du evîndar nagihêjin hevdu. Bazîdî di vê çîrokê de adetên Nastûriyan û bandora adetên neyînî ya li ser jiyanan bi awayekî trajîk vegotiye.

Di çîroka dehê de Xelîl Beg ji ber ku pişt re bûye misliman bi helwesteke neyînî ya biçûkdîtîne rû bi rû dimîne. Lehengê çîrokê Leşkoyê Ermenî ye.¹⁹⁶ Ev Leşko diçe Stenbolê û li wir dibe musliman û navê Xelîl Begê distîne. Ji ber zîrekiya xwe dikeve çavê hukumeta wê demê, mîrekiya Eleşgîrê digre û tê welatê xwe. Xelîl Begê ji ber ku dû re bûye misulman di nav axa û derdorên de biçûk tê dîtî. Hesen Begê Mankî, Xelîl Begê wekî hakimê Eleşkîrê naxwaze qebûl bike û vê fikra xwe li cînan bilêv dike. Dema ev gotin dare guhê Xelîl Begê ji bo dersekî bidiyê, di nava rojekê de sê caran destê xwe dide ramûsandin.

Di çîroka dijminahiya Şêx Ehmedê Çıplaq (Seyîd Ehmed) û Selîm Paşa de motîfeke Mixoyê file heye.¹⁹⁷ Di pevçûna Seyîd Ehmed û Selîm Paşa de ji hêla xweha Selîm Paşa Sultan Xanimê tê peywirdarkirin. Warîleke barûdê dixê bin odeya Seyîd Ehmed û wî bi hewa dixê. Mixo peywira xwe bi cî de tîne Şêx Ahmed û zîlamên wî bi wê teqîna barûdê bi hewa dikevin û dimirin. Selîm Paşa ji belaya Şêx Ehmed xelas dibe.

Di çîroka bîstê de encama talanekê û tê vegotin. Eşîrên Heyderan û Sîpkan diçin talana qefîlebaşî ‘Ebdulqadir Axayê Bexdayî dikin. Malên talanê jî li xelkê belav dikin. Kî dizane belkî jî destana Koroxlî bi vî awayî hatiye vegotin û belav bûye.

Barên wê qafileyê yên hemû çox û qumaş û atlas û canefis û qirmizan (qimiz?) li feqîran li deşta Fazîkulê belav dikin. Wexta Ermeniyek xwecihê wê derê tê nêzîkî wan û dixwaze ku hinekî çox û kumaş bikire. Kurdên eşîrên Heyderan û Sîpkan tevî ku qederekê çox û qumaş bê pere didine, pênc bar qirmiz para Kurdekî ketiye ji ber ku nizane ew çî ye û bi kêrî çî tê, tevî qirmizî jî dide wî Ermeniyî û dibêje: “ *belê eve gaza Koroxlî ye, li çîyan hêlaye ji boyê jaran ku eger mirovek çend gez ji vê bigre mala xwe ava diketin.* ” Yê bar standî bi dilşadî çûye vegeyriyaya mala xwe. Ew barên bi xwe re anîbû firotiye, gelek dirav ji wê kar kiriye û bûye bazîrganekî bi nav û deng.

195 Di “ Recueil de Notices et recits kourdes ” (wergera pirtûka Camî’eya Risaleyan û Hikayetên ji hêla A. Jaba hatiye kirin) de navê netewên gayrimuslîm tîn nîşandan. Bnr. Bazîdî amd. Ziya Avcı, 2010, beşa Recueil de Notices et recits kourdes, r. 26.

196 H.b., r. 30-32.

197 Bnr. çîroka şanzdehê

Di çîroka bîst û duyê de mijara diziya dêra Yedi Kilîseya Ermeniyan tê vegotin. Şomo û çend hevalên xwe yên heramzade diçin diziya dêrê, lê ji hêla xwediyê dêrê ve hew maye bên zevtkirin û bi zorê xelas dibin. Tiştên wekî xac û şemdanên zîvîn dibin Diyarbekirê difroşin.

Di serê çîrokê de nivîskar wekî terza vegotinê bi kar tîne, piştî wê îcarê dikeve şûna Şomo û ji devî wî bûyerê vedibêje. Li hember fileyan feraseta kurdan di vir gelekî xweş hatiye ristin. Bi zimanekî rexneyî vê diziya dêran vedibêje:

“ Berê niha mela û feqayêd Kurdistanê gelek dizî ji dêrêd filan dikirin. Lewranê li nik wan malêd dêran beytûlmal e. Her çi kesê bibitin dirûst û guneh nînin. Di nêva Miksê da Hacî Şako hebû, kurekî feqe hebû navê Şomo bûyî. Bi rastî Şomo qewî nehs û şerîr û xweyê cesaret bû. Esla ji kuştin û girtinê xof nedikir çend feqehne dinê jî weko xwe heramza li xwe girêdabû, ekserêd şûlêd wan ew bûn ku diçûn û bi rojê dicisisandin û bişev dêrên filan neqeb dikirin û xac û şemdanêd zîvîn û pevalûn didizîn û dibirin û diçine welatekî dinê, ew mal telef dikirin.”

Gotina wî ya wekî “çend feqehne dinê jî weko xwe heramza li xwe girêdabû” teswîpnekirina xwe yî van hereketan diyar dike û rexneyê jê re tîne.

Di çîroka bîst û heştê de ya îroniya feraseta îdare û perwerdehiya çaxa Osmanî tê vegotin. Helwesta Şêxulîslam û muderrisên Osmanî ya li hember kesên misilman û nuh dibin misilman bi zimanekî mîzahî vegotiyê. Dema Mele Mihemmed wekî alimekî olî dare Stenbolê cem muderrîs û Şêxulîslamê Osmanî, daxwaza muderrisiyê dike, kesek wî wekî tiştêkî nahesibîne û kes guh nadin wî. Lê wexta wekî cilên Êrisan (Rûman) li xwe dike û diçe cem Şêxulîslam û dibêje ez dixwazim bibim misilman, wê çaxê qedrê wî digrin ji elîfbayê destpê dikin medreseyê pê didin qedandin û piştî wê daxwaza wî didinê. Bi mal û dirav û xelatan wî dişînin welatê wî.

Di çîroka sî û yekê de mijara sedema xerabûna baweriya misilmanan a li hember gayrîmuslîman tê vegotin. Berê emîr û begên kurdan gelekî bawerî bi xulamên Ermeniyan dianîn û her çi ku emrên malên wan û dayîn û standinên mala wan nawmalêtî hebû hemû di destên filan dibûn. Di wextê Mîr Izedîn Şêrê Hekarî de, fileyekî wî yê bi navê Kolu di nav mala wî de hebûye. Çil salan xulamî û navmaltî ji Mîr Izedîn re kiriye. Piştî ku xiyaneta wî fileyî ya di navmalê de eşkere dibe, cezayê

kuştinê lê tê birîn. Mîr Izedîn jî emir dike ku Koluyî bibin û bikijin. Mufreze jî Keloyî digrin û destan girê didin ku bînin bikujin.

Îcarê Kolu ji mufreziyan daxwaza ku wî bibine huzura Mîr Izedîn dike. Li huzûra Mîr Izedîn jê re dibêje ku

“ Çil salan e ku min xizmet dikir ku ava xusul û destmêja te min dianî, her çi qederê min înaye, berê min mîztiye nêva vê avê, ji boyî te paşî înaye. Ewe ez dibêjime te her çi xusul û destmêj û nimêjên ku te heta niha kirine, ev hemû jî dayîn û dînê te da betal in, tu evan nimêjên çil salan qeza bike û qenc bizane ku ez dijminê dînê te bûm, li ku mayî ku dijminê canê te? Min xem kuştinê jî nîne, me’lûmê te jî bibitin ku min ev îhaneta çil salan di gel te kiriye, min tu ji heddê mîran rûreş kiriye, ez jî tême qetil kirin xem nîne.”

Îcarê Mîr Izedîn pir zêde aciz dibe û lê tê xezebê û bi xwe radibe Koluyî dide ber xençeran û dîkuje.

Heta ev bûyer neqewimîbû, emîr û axayên Kurdên xwecihên Hekariyan zêde zêde itibar û bawerî bi gelên filan hebûn. Ew tayîfe ji boyê xwe emîn hesêb dikirin. Lakin piştî vê bûyerê êdî ew çend bawerî bi fileyan nayînin.

Mijara çîroka sî û heftê li ser defneyê ye. Çîrok di navbera du lehengên xeyrêmuslîm de derbas dibe, yek Şatirê Ermenî ye ê dinê derwêşê bi navê Sare Salte ye. Derwêş leşkerekî pîr ê artêşa xaçiyên e. Ji Frenkîstanê vegeyriyaye jibo kela xerabe ya li gundê Bêgiriye û Korzotê. Ev Keleyek ji kufaran mayî ye. Derwêş ji Frenkîstanê ji bo kevokeke zêrîn bibe hatiye. Şatir, wî Sare Salteyî¹⁹⁸ dike mêvanê xwe. Qederê du mehan li Sare Salteyê nexweş miqate dibe û mazûbaniyê dike.

Dema derwêş rehet dibe û ji Şatir re dibêje: Te gelek zehmeta min kişand, çewalekî û ben bîne ez û tu herin derekê, bi qasî tu dikarî ji xwe re zêran hilgire, rahijê. Dibe şev û wî dibe keleyeke xirbe. Sêhra tê de betal dike. Bi deng û zelzele bînayek derdikeve holê, piştî vê zelzeyê, deriyek çêdibe û vedibe. Dikevin nava defneyê, Şatir qedereke zêr, dirav, sîkkeyên ji Kufarê mayî radihêje. Lê Derwêş tenê peykereke kewê ya ji zêrên tokme hatiye çêkirin hildigre, dixê tûrê xwe. Çavên kewê ji elmasan perrên wê bi cewahîran xemilî ye. Şatir berê ji kevok hilgirtina Sare Salte re deng nake. Pê re

198 Di heman berhemî de A. Jaba têbiniyek ji bo navê Sare Salte daniye. Sare Salte leqabeke leşkerê por sor e. Jaba dibêje ku ew kes dibe ku leşkerekî xaçiyên e. Piştî xaçî di şer de têk çûne ew leşker bi cilên derwêşan ji Frenkîstanê hatiye vegeyriyaye cihê xezîneyê ku berê dizanîbû.

êdî hew dikare bi xwe û dibêje “Ez wê kewê dixwazim. Min van zêran navê, ka wê kewê.” Derwêş dixwaze Şatir qan’i bike ku ew ji Frenkîstanê ji bo vê kevokê hatiye. Ji ber ve xwestina wî red dike. Şatir piçekî diçe, dîsa şeytan li bendê dikeve ku, vegere zêran jî nedê kewê jî jê bistîne. Lê derwêş tiştekî davêje ber wî ji bêhnê Şatir ji dil diçe û Sare Salte di riya xwe de diçe.

Şatir piştî li ser hişê xwe ve tê, wê çewalê zêr radihêje û diçe mala xwe. Bi van zêran gelekî dewlemend dibe. Lê ji ber ku Şatir ji nişka ve ewqas dewlemend bûye xelk pê re dikevin şikê. Ev gûman heta dare guhê mîrê Bêgiriye. Mîrê Bêgiriye, wî digre û heps dike ji bo zêr û pereyên xezîneyê jê bistîne. Şatir qederek zêr û pere dide mîr pişt re azad dibe. Ev bûyer dare ber guhê paşayê Wanê jî, ew jî Şatir digre û heps dike, qederek pere û zêr jê distîne, paşê Şatir berdide. Ji ber van zêran û çîroka defîneyê serê wî ji belayê xelas nabe.

Di encamê de Mela Mehmûdê Bazîdî çîrokê weha diqedîne:

“Eve qîseya eger çî hindekî ji ‘eqlan dûr e, lakin li wan etrafan meşhûr e, gihaye heddê tewatirê. Niha jî mala wî Şatirî dîsanê li Bêgiriye heye û qewî me’ûr e. Ewladêd wan heyin. Xweyê emlak û aş û kotan û kerî. Lakin maleke qewî zêde bervekirî ye, hesebke tekye ye. Herçî bête wê malê, file misilman men’i naken dawerînin û ikram dikin. Mala Şatirê ji wî wextî heta niha jî di nêva Ekradan danê meşhur û me’rûf e. Ekserêd Ekradan dostî di gel wê malê heyin û pez û hediye ji boyî wê malê dibin. Iqtiza biketin ku Ekrad dijminaniya yê kirîvê biken û talanan û diziyê ji yê kirîvê biken, dîsanê nêzokê talan û mala wî Şatirî nabin. Dibêjin ku tekye ye û nane wan çavra dikin. Bi vê terzê qîseyêd xezîne û defîneyan li Kurdîstanê de zaf heyin. Ekrad zêde bawerî bi bûyina defîne xezîneyan heyin. Gelekan jî cezwe kelê rast hatiye, êdî heqîqetê Xwedê dizane.”

Çîroka sî û heşta ji aliyê nêrîna civakê ya li hemberî biyaniyan ve girîng e. Naveroka çîrokê li ser esîrgirtina gerokekî Frensî ye. Ev gerok li gorî Ziya Avci¹⁹⁹ Kurdnas; li gorî hin çavkaniyan jî casûsekî Napolyon e, ji bo peywirekê bi dizî diçe Îranê. Her çî dibe bila bibe ji bo me ya girîng lehengê çîrokê anglo A. Jaubert, ev serpehatiyên xwe piştî vegehiyaya welatê xwe kiriye pirtûk û weşandiye.²⁰⁰ Di seyahatnameya xwe ya bi navê “Voyage en Arménie et en Perse” de behsa serpehatiyên xwe yî rêwitiya Îranê û bûyerên li Bazîdê jiyaye jî dike.²⁰¹ Li gorî îfadeyên Jaubert,

199 Pîrbal 2000, r. 9-30; Bazîdî amd. Ziya Avci, 2010, r.21.

200 Pierre- Amedee Jaubert, Reise Durch Armenien und Persien, Leibzing, 1822.

201 H.b.14-51.

çîroka Bazîdî rasteqîn e, çîroka Bazîdî û serpêhatiya Jaubert ji aliyê naverokê de yeka yek e. Tenê ferqî ev e ku, serpêhatiya Jaubert bi nêrîna xwe; Bazîdî çîroka xwe bi nêrîna civaka kurdan vegotiye. Yüksel Bingöl²⁰² ji bo Jaubert dibêje

“Jaubert her çiqas navê gerokî li ser bû, di seyahatnameya xwe de ji agahiyên nasandana derdorê û Seraya Ishaq Paşayî bêtir cih daye macerayên xwe yî jiyaye. Ew jî zêde mubalaa kiriye. Di derheqê Çildirogullari Mahmûd Paşa û mîmariya Seraya Ishaq Paşayê zêde agahî nedaye.”

Wekî di çîrokê de jî tê vegotin Jaubert, di sala 1805an de dema diçe Îranê li ser riya Bazîdê tê girtin. Ji ber tevgera wî ya şikbar wekî sîxurê Napolyonê I. hate tewanbarkirin û di zindana Seraya Ishak Paşayê de şeş mehan ma. Ev çîrok her wekî Jaubert jî piştrast dike di sala 1219ê mişextî de (1804ê zayînî) di serdema padişahê Osmaniyan Siltan Evdilhamîd û waliyê Bazîdê Mahmûd Paşa de derbas dibe.

Di çîrokê de ji Ewropa gerokek bi navê Jubir (Pierre- Amedee JAUBERT)²⁰³ tê vî welatî. Jubir jî mirovekî qewî xweyî kemal, sahib idrak û dirayet û ji hemû ilman xwendî û xeberdar û kamil bûye. Nêta wî ji ser riya Bazîde bibihure û here Îranê. Lê hîn ku neçûye Îranê, gelek bûyer tê serê vî Jubirî. Nivîskar sedemê jî wiha îzah dike:

“Emma di wê zemanê da esla tayîfeyêd Efrancan²⁰⁴ li wan welatan danê peyda nedibûn û kesekî efrencî nedîtibûn. Qewî li wan ecêb xweya dikirin û ‘edaweta li tayfa Efrancan li nik wan hebû.”

Ji ber tiştên wî ên xweşik û biqiymet ên weke saetek meqbûle, tifingeke du lule û dûrbînek sipehî, hebû serê wî dikeve belayê. Dema dibe mêvanê Mahmûd Paşa, xulamên wî ew alav pê re dibînin û diçin ji paşayê xwe re dibêjin. Paşa jî hesabê şelandin, kuştin û wendakirina Jubir dike. Bi çend siwarên kurdan têkiliyê datîne ku wî Jubirî bişelînin û bikujin. Çi alavên wî hebin ji wî re bînin. Paşa wekî mêvanê xwe bi rê dike çend siwaran jî wekî eskort datîne cem Jubirî û li hêviya alavên wî dimîne. Lê bi ya dilê Mahmûd Paşa nabe her wekî nivîskar jî dibêje: “Ekraad Jubir digirin û dişelînin. Lakin ecel nehatiye ewî nakujin.” Îcarê wî Jubirî di gel tiştên wî tînin nik Mehmûd Paşayî, paşa ji kurdan dipirse ji bo çi we ew nekuşt. kurd jî dibêjin ku bi rastî destê me neçûyê, me înaye.

202 Yüksel Bingöl, Ishak Paşa Sarayı, Kültür Yayınları, Ankara, 2008, r. 17.

203 Bazîdî, amd. Ziya Avcı, 2010, r. 123-127.

204 Efrencî: Frengî ango Ewropayî

Jubir, piştî ji ber rehma kurdan ji mirinê xelas dibe, îcarê dikeve zindanê. Bi gotina nivîskar Jubir di vê zindana wehşet û tarî de qedere salekê dimîne. Qasim Axayê dizdar di wî wextî de carina bi dizî ji zindanê derdixîne dibe mala xwe ew û xanima wî Rehîme Xatûn xatirê wî digrin, li ber dilê wî diçin û tînen, xwarinê didinê, kincên wî dişon û şûn de dixin zindanê. Heta Mahmûd Paşa bi şewbekê dimire şensa wî vedigere. Birayê Mahmûd Paşa Îbrahîm Paşa dibê paşayê Bazîdê û ji vê bûyera Jubirî haydar dibe.

Sedema şelandin û xistina zindanê ne tenê ji frengbûna wî dihat, sedemek jî nivîskar bi devê Îbrahîm Paşa dide gotin ku ev ji nebaşiya Mahmûd Paşayî û xulamên wî yê dizdar e. Wexta Îbrahîm Paşa ku ehwalê birayê xwe Mahmûd Paşa dibihîze wiha dibêje:

“ Weko Îbrahîm Paşa evê ehwala Jubirê seh diketin, zêde te’ecub diketin ku eve şûla mezinan nînin û qewî bêmerwetiye. Filhal virê diketin Jubirê ji zindanê bidertîne û tînite nik xwe û qewî jê ‘uzirxwahî diketin ku ez te rica û hêvî dikim ku tu dê qusura me bibexşîn. Eve şûlekî ne munasib û bê terz qewimiye, ‘efû biken. Her çi pertal û eşyayêd hewe çûyî, defter biken ez dê berhev bikem û destûra hewe bidem û mu’ezez û mukerem we birê bikeme Îranê.”

Jaubert di pirtûka xwe de wanî qala berdana xwe dike:

“ Axayê zindanê bi awayê xemgîn hat û mirina Mahmûd Paşa xeber da. Bi vê xeberê kêfa me hat lê digel her ihtimalî em bi ihtiyad bûn. Ji ber ku qedera me di destê paşayê ku têkeve şûna Mahmûd Paşayî bû. Her çi çiqas hîlbijartina paşayan di destê niştêcihên heremê de bû, dîsa jî viyabû ji seraya Osmanî da jî bihata pejirandin. Piştî mirina paşa gel bibûn du partî. Partiyak a Îbrahîm Paşayê ku digot ezê tiştên baş bikim; ya din a Ehmed Paşayê kurê Mehmûd Paşayê bû. Ev itilaf bi serketina Ehmed Begê biencam bû û Ehmed bû Paşayê Bazîdê, Îbrahîm Begê jî bû waliyê Toprakkaleyê û bi vî awayî şerê biran bi dawî bû...”²⁰⁵

Di derheqa hepiskirina Joubert de Îsmail Mangaltepe û Semavî Eyîce her wekî di çîrokê de jî tê vegotin bingeha dîrokî datînin. Eyice dibêje ku Joubert ji hela paşayê

205 Bingöl, 2008, r. 60.

Bazîdê jibo dest dîne ser eşyayên wî tê hepiskirin û ancax dema paşa dimire azad dimîne.²⁰⁶

Piştî Jubir diçe Îranê û ji wir diçe welatê xwe heta dimire xatirê Qasim Axayê dizdar digire. Her sal jê re hezar quriş dişîne bi wî re karê bazirganî dike û her çend salan carekê ji wî re xilatan dişîne. Nivîskar ecêb dimîne ku yekî ne misilman ewqas xwedî insaniyet, insaf û merhemet be û weha pesnê wî Jubirê biyanî dide:

“Eger çi ew jî fewt bûye illa ku navê qencî û insaf û merweta wî hesêb ke anegora xwe wekî navê Nûşîrwan adil di nêva Kurdistanê mayî, herkes bi tehsîn û eferîn dikirin ku hinde salan bihitin û hinde qederê welatê wî dûr bibitin û derheqê misilmanan bi vê wechê ihsan û ikramê û qencyê biketin. Bi rastî ku şûlekî ecêbe ye û her hes sed aferîn dikin.”

Mijara çîroka sî û sisê bi ji hev cudabûna çanda kurd û ereban hatiye hûnandin. Lehengê çîrokê Şerîf Axa ku axayê eşîra Elîkan e. Her wekî eşîrên dinê, ên Botan zivistanan dadikevin beriyê navbera Cizîr û Musûlê. Li wir dibe cîranê yekî ereb ê bi navê Şêx Tarim. Ji ber cîrantiyê diçin û tèn cem hev. Di vê navberê de dostaniyak di navbera wan de çedibe. Lê dostaniya wan ji ber teyrekî şahîn xera dibe. Kêfa Şerîf Axa, ji Şebîb re tê, Şêx Tarim jî Şebîbî, wekî diyarî dide Şerîf Axa. Her carê, rojekê erê-rojekê na, Şêx Tarim digel bîst siwar dost û cîranên xwe tèn û dibin mêvanê Şerîf Axa. Şerîf Axa jî her carê wekî adetên kurdan mazûbaniyê ji wan re dike, pezan ji wan re serjê dike.

Piştî çendekê, Şerîf Axa êdî ji her du rojan carekê ji hatin û çûna Şêx Tarim aciz dibe. Ji ber wê hêrsbûnê jî, wî Şebîbî digire û dixeniqîne. Piştî Şebîb dimire jî ji wan ereban xelas nabe. Li gorî adetên wê heremê divê şûnê ji bo Şebîb li dar bixe. Êdî Şêx Tarim vê carê ji bo taziya Şebîbî dare û tê.

2. 6. Êzîdî

Mela Mehmûdê Bazîdî di berhemên xwe de êzidiyan wiha dide naskirin:

“Di nav kurdan de kurdên êzîdî jî hene. Şeytên diparêzin, ew rojiyê zanin, ne nimêjê, vexwarina areqiyê cem wan ne heram e, loma çi gava lê tê vedixwin. Lê sunet kirin cem wan heye, bi mêrxasiya xwe li pêş kurdên mayî ne. Zimanê wan kurdî ye, tu ferqa wî tune ye. Êzîdî tenê bi ola xwe ferq dikin. Cem êzîdiyan qewal û pîr û şêx hene, lê

206 Mangaltepe, İsmail, Seyyahların Gözüyle Van (XIX. Yüzyıl), Kitabevi, İstanbul, 2009, 28; Eyice, Semavi, “Bir Fransız Gizli Ajanı Amédée Joubert, Türk Yurdu, sayı, 256, İstanbul, Mayıs 1956, r. 831.

kesê ji wan nizane bixwîne, ne binivîsîne. Ne cara pirtûkên wan hebûne û ne jî nivîsandina wan hebûye, wesîteya wan a dan û sitanadinê tenê zimanê devkî ye. Dibêjin êzîdî ji reha Yezîd Îbn Merwan in, ewê ku nifira malbata Muhemmed -aştiya Xwedê lê be- ji ber kuştina Huseyin, lê ketiye. Kuştina mirovê êzîdî cem kurdan ne guneh e û her carê gava rê dikevê kurdên misilman, êzîdiyan dikujin û jinên wan ji xwe re dikin carî. Ew ji dikanên qesabî yên êzîdiyan goşt nakirin, çimkî êzîdiyan murted dihesibînin. Di nava êzîdî û melayên misilmanan de şerekî oldarî digere û her yek ji wan li fersendekê digere yê din bikuje.”²⁰⁷

Li ser êzîdiyan du çîrok hatine nivîsandin. Yek çîroka çarê a dinê ya heftê ye. Temaya çîroka çaran li ser îxanet, timayî û heyf hilanînê ye. Lehengê çîrokê, Mîrza mirovekî diz e. Di karê diziyê de bi şîrîkekê misilman bi navê Mihemed re bûye destbirak. Lê şîrîkê wî yê diziyê pê re xayîn derdikeve. Para wî nadê û bi wan malên diziyê gelekî dewlemend dibe. Dema Mîrza dawa para xwe dike, bi tifîngan bera wî dide, ji mala xwe diqewirîne. Mîrzo vê rewşê nahezimîne, bi çil siwaran digrin ser mala Mihemedî û wî dikujin malên wî talan dikin, malên wî yên talankirî jî di nav xwe û siwaran de par ve dike.

Dijminahiya hin feqî û êzîdiyan jî, bûye mijara çîroka heftê. Lehengê çîrokê Mele Mihemedê Qulpî di wexta rêwîtiya wî ya ber bi Bazîdê de diçe, komek êzîdî tên pêşyê û wî dişelînin. Ji xwe jî şûr û mertal û xucekî pirtûkan pêve zêde tiştêkî wî jî tune ye. Ji bo wî bikujin dest û nigê wî girê didin. Pîrek ji êzîdiyên rêbir ji Mele Mihemed re dibêje “Ji dîne xwe vegere û bibe êzîdî yan jî ez ê te bikujim.” Mele Mihemed vê yekê qebûl nake. Îcarê pîrê êzîdiyan dibêje “Nexwe ez destûrê didim sê cara gazî pêxemberê xwe bike, bila pêxemberê te were te xelas ke.” Mele Mihemed ji tîrsa wî pîrî sê caran ba Mihemed dike. Ji wir meger siwarên Heyderan derbas dibin navê yekî ji wan jî Mihemed e. Wexta dengê gaziyê tê wan, ew li şopê tên. Dibînin ku yekî girêdayî di nav komekê de ye. Tê bera êzîdiyan didin û wî Mihemedî ji nav lepên êzîdiyan xelas dikin.

Raîf Yaman li ser mijara motîfa êzîdiyên di çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî de wiha dibêje û çîrokên Bazîdî wiha dinirxîne:

“ Dema pîrê êzîdiyan dibêje: “ Ji bo te destûr e gazî Mihemedê xwe bike bilanê bêst û te ji destê me biderîne û xelas bike” peyxamberê Îslamê nerast û piçûk nîşan dide.

207 Neqil ji pêşgotina pirtûka Y. Y. Vasîlîva ya “Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê”, Ziya Avci, “ Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, Kovara Bîr, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> (14 Mijdar 2012).

Çîrokbêj, li vê derê di kesayetiya pîrê êzidiyan de êzidiyan bêwijdan û neyarê misilmanan nîşan dide. Wê gavê bi tesadufî di nêzikî wê derê ra derbasbûna Mihemedê Heyderî û deh siwarên wî mîna mûcîzekê tîne zimên. Dibe ku ev herdu serpêhatî bi rastî qewimî bin. Lê di nav Çel Hikayetî da tunebûna êzidiyekî baş meriv di derbarê niyeta vebêj da dixe nav gumanan. Ji ber ku vatoxê misilman di derbarê filan da hîn zêdetir dadperwer xwuya dibe.²⁰⁸

2. 7. Xwînî

Xwînî ango dijminantî diyardeyeke nexweş a civakan e. Ev rastiya ku zêde bandorê li civakê kiriye, bûye çîrok û herikiye nava gelek destan û çîrokan. Mela Mehmûdê Bazîdî dijminantiya kurdan de wiha vedibêje:

“ Wekî dinê ekrad zêde bi kîn û qudret û xweyî înad in. Eger dijmin digel yekî heyin daîm li dûra digerin û qesda kesera wî dikin û diçin riya yekûdu hevdu birîndar dikin weya dikujin. Eger qet nabe jî penî ve bişev ji dûr ve ji quleke veyaxu di xewê de razayî bi guley hevdu dikujin. Ev jî nebî bi dizî agir berê malêd yekûdu didin weyaxu bi qet rast hesp û devê (heştir) û dewarêd yekûdu bibin ewan heywan pedikin û eger mumkîn dibe belkî Jahre jî tevî zadêd yekûdu dikin. Xulase dijminahiya avam qewî bela ye.”²⁰⁹

Mela Mehmûdê Bazîdî çîroka bîst û heftê havîtiye ser mijara dijminiyê. Gorî çîrokê wexta Îbrahîm Xan Mîrê Hekariyan bû, di navbera Îsmâil Axayê Şikevtî û Terlan Axayê Herkî de dijminantî hebû. Çîrok li ser mêranî û lehengiya Îsmâil Axayê Şikeftî hatiye hûnan. Terlan Axa wekî adetê nayê bi Îsmâil Axa re şer nake bi dizî xulamê xwe dişîne û bi xefî dixwaze wî bide kuştin. Xulamê wî yê bi navê Domo dizekî şareza ye. Qadir dibe tê heya ber konê Îsmâil Axa. Dema agir bi şeşxaneyê dixîne arê wê nagihe barûdê. Ji şewqa pirîska êgir Îsmâil Axa jê hay dibe û xwe diparêze. Domo zeft dike û bi wî mikur tîne. Piştî ku bi rastiye dihesse Domo azad dike û pê re peyamekî dişîne.

“ Here ji axayê xwe yê Terlan Axa re bibêje, Îsmâil Axayê digot ku dijmin ewe ku ji dijminê bi destê xwe eşkere li meydanê heyfê bistînin. Wesanê bi xef û dizî mirov dane kuştin, ew ne karê mirovan e. Bilanê di wextê xwe da hazir bibe. Ew xulamêkê bi dizî vire dikete kuştina min. Lakîn ez dê bi xwe di gel koma biran û pismaman bême derê malê ji boyî kuştina wî êdî kanê Xwedê didete kî. Gelo kî dimiritin û kî dimînitin.”

208Raif Yaman, ” Di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî de File Misilman û Êzidî” [Http://www. Netkurd. Com/?Mod= Author&Option= View&Id= 762, \(08. 05. 2011\).](http://www.Netkurd.Com/?Mod= Author&Option= View&Id= 762, (08. 05. 2011).)
209 Bnr. Findî, 2006, r. 26.

Bi hefsed siwarên Şikeftiyan diçin êrîşa Terlan Axayî û wî dikujin lê dest bi êlê nadin û vedigerin. Îcar Herkiyan sê hezar siwar pev dikevin û didin pê Îsmaîl Axa û di şerê wan de dîsa Îsmaîl Axa bi ser dikeve. Leşkerên Herkiyan dişkên û direvin. Ji wê demê pêv de xwînî di navbera Şikevtî û Herkiyan de peyda dibe. Kî li ku derê rast werin ji hev dikujin.

2. 8. Şer, Talan û Şelandin

Bûyerên wekî şer, talan û şelandinê rastiyeke dîrokî ye. Bûyerên ku di nava civakê de diqewimin, bi xwezayî bandorê li ser jiyana kesan dikin. Her wiha ev bûyer dikeve nava wêje û folklorê jî.

Dîsa çîroka bîstî ya destana Koroxlî ku temaya bingehîn talan e. Malên ji talanê hatibin wergirtin li feqîran belav dikin. Yanî di vê talanê de mebest ji dewlemendan standin û dayîna feqîran e. Ev destan, di wêjeya Anadolê, Azerbaycanê, Altay û tirkî de jî cî digre. Têmûrê Xelîl, varyantên kurdî yê destana “ Koroxlî”, ya ku bi qasî 130 rûpel in ji alfabeya kirîlî zivirandiye alfabeya latînî û ji çapê re amade kiriye.

Mijara şer û pevçûnê di çîroka bîst û nehê de hatiye hûnandin. Vê mijara şerkirina kurdan, Mela Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe yî Adat û Rusûmetnamey Ekradan de jî vedibêje²¹⁰ Ehmê û Kerhê du birayên mêr, dilêr, reşîd û leheng in. Kerhê ciwanekî bîst, Ehmê nozde salî ye. Diçin aliyê ereban deweyên wan didin pêşya xwe û tînin û çî siwar werin pêşya wan, wan perîşan dikin. Ev qas rimbaz û siwarên zîrek in ku nivîskar dibêje: “Te digot evene herdu jî ‘eyne ecinî ne, wisanê fars û rimbaz û çapik siwar.” Sed siwarin millî perîşan dikin ev her du bira ewqas jîr û jêhatîne ku hem kurd hem jî ereb ji wan dihesidin û bela ku newêrin raste rast dijminahiyê bi wan re bikin wan gilî dikin. Eyub Axa û Namik Paşa digel top û leşkerên nîzamî tînin bi van birayan re şer bikin. Ehmê û Kerhê ji bo zerer neye gelên wan bi pêncî siwaran derdikevin çiyayên asê û bi wan re şer dikin. Kerhê bi guleya ku ji eyna xwe dixwe ji hespê dikeve. Ehmê jî xwe ji hespê çeng dike xwe davî ser Kerhê û bi vî awayî dikevin dest.

210 Bnr. Findî, 2006, r. 40.

3. ZANÎN Û PERWERDE

Di nava civaka kurdan di asta zanistiyê de, zana û muderrîs hebûn lê ne xwedî mal û milk bûn. Di nava çîrokan de lehangên mîna mele, feqî, û muderrîs pir in. Ev rewş ji alîkî ve jî nîşaneyê perwerdehiyê ye.

Perwerdehî di çîroka bîst û heştê de wekî mijara talî hatiye hunandin. Nivîskar di vê çîrokê de nêrîna pergala perwerdehiya Osmanî ya di zemanê Siltan Ehmed de, lê bi gelemperî feraseta zana û alimên osmaniyan a li hember milletên mayî piçekî bi mîzahî û piçekî bi rexneyî, vegotiyê. Lehengê çîrokê Mele Mihemmed alimekî têra xwe jîr û zîrek e. Ji derdora xwe ji ber zanebûna xwe zêde zêde îtîbarê dibîne. Ji ber xizaniya xwe demekê tê li Silêmaniyeyê muderrîsiyê dike. Derdora wî jê re dibêjin here Stenbolê cem xundkaran, belkî gund û tiştinan weqîfî te bike ku tu ji vê xizaniyê xelas bibî. Mele Mihemmed bi ya wan dike û diçe Stenbolê, rast diçe medreseyekê, xwe dide nasîn û daxwaza xwe ji wan re dibêje, lê kes guh nade wî û ne li ser bala tu kesî ye. Ew jî dide rê diçe cem şêxulîslam û ji wî re jî daxwaza xwe dibêje û ji bo xwe ispat bike, dawa ezmûnê dike. Lê şêxulîslam jî elaqayê rênadê. Du sê rojan diçe paletiyê dike, bi wî pereyî ji bo cil û bergên Xiristiyanan, perçe dikire, dirûtin dide û li xwe dike, rast diçe cem şêxulîslam û dibêje min bişev di xewna xwe de dîtiye ez dixwazim dîne we qebûl bikim. Kêfa şêxulîslamî tê û zû bi zû wî dikin misilman xilatan didinê. Didin ber meleyekî ji bo dersan bigire. Lê ji ber ku ji berê van dersan zane pir zû derbas dibe. Navê wî jî dikin Mihemmed Efendî. Di nava sê salan de wî dîsa dikin mele û mezûn dikin û îja wî dikin muderrîs. Sê gundan weqîfî wî dikin teva gelek pere û xilatan. Mele Mihemmed heta vedigere welatê xwe 5 sal dibore.

3. 1. Nezanî û Kêmaqilbûn

Mela Mehmûdê Bazîdî di mijara cehaletê de du çîrok nivîsiye. Çîroka bîst û çaremîn û bîst û pêncemîn, girêdayî vê mijarê ne. Di her duyan de jî leheng cahil in. Yek Mam Bapîr ku dewlemend e, yek jî Sîsoyê xizan ê ku şivanê ber pez e.

Mijara çîroka bîst û çaremîn ji alîkî ve bi mijara kêmaqilbûnê ve ji alîkî ve jî bi nezaniyê girêdayî ye. Di vir de Mam Bapîr yekî bi qasî ku cahil e, ewqas jî kêmaqil e. Mam Bapîr ixtiyarekî dewletî lê nexwendî e. Digel ku yekî dewletî li gor ên feqîr hîn hêsantir dikare bigihêje ilm û zanistê. Mam Bapîr vê nekiriye di encamê de jî ketiye rewşeke kêmaqiliyê. Çîrok li ser vê ehmeqbûn û cehaletê wî hatiye hûnan. Ji ber ku zêde naçe û naye bajêr û heta wî di temenê xwe de, xutbe nedîtiye dibe armanca

tinazkirinên der û dorê. Carekê dîsa wexta ku hatiye bajêr mazûbanê wî bela ku roja îne ye wî vedixwîne xutbeyê.

Di xutbeyê de dema mele navê Hezretên Ebbas, Hezretên Hemze, Hezretên Hesên û Hezretên Huseyîn dixwîne Mam Bapîr dibêje qey navê cîranên wî dibêje, û ji xwediyê malê re gazinên mele dike ku çima navê wî nexwendiyê. Xwediyê malê qerfê xwe pê dike û jê re dibêje cîranên te xilat dane mele ji ber wê ye navê te nehatiye xwendin. Mam Bapîr ji xwediyê malê re dibêje ez ê sî pezî bidim melê da ku navê min jî di xutbê de bixwîne. Hefta dinê xwediyê malê ji melê re vê rewşê û hediya Mam Bapîr dibêje. Mele jî qebûl dike û di vê xutbê de wê navê wî jî bê xwendin. Nivîskar çîrokê wiha vedibêje:

“ Îcarê îmam weko eve xebera seh kirî, dikenitin û dibêje bilanê wesana bitin ku ez eyna dinê navê Mam bapîrê jî di xutbey da zikir bikim. Xweyê malê cewabê ji boyê Mam Bapîr tînitin, ew jî şabûyî diçite mala xwe û eyna dinê filwaqî’i sî pezan ji boyê îmamê tînitin û tete hêşeta Berêspî û dîsanê li xweyê mala xwe dibitê mêwan, pezan ji boyê îmamê vîrediketin. Wextê selayê Mam Bapîr di gel xweyê malê, ew jî tene xutbeyê. Îmam diçite ser minerê. Îcarê Mam Bapîr jî ji pêşve rûniştîye û muntezir e ku îmam navê wî bixwonitin. Îcarê îmam dibêje ku “ eyyûha el- Mam Bapîr enteka el-kelb el-kebir”²¹¹ muezin difikire ku îmam berê xutbeyê ev kelama got, we zen dibetin ku belko îmam xeletîye, îşaret diketin. Îcarê îmam dibêjîtin ku lê “ min el-exnam ‘eşerûn welek’eşre”²¹²

Mam Bapîr piştî ku navê wî di xutbeyê de hate xwendin rehet bûyî li gundê xwe vedigere.

Çîroka bîst û pêncê li ser şivanekî bi navê Sîso ye. Sîso pezê xwe dibe Stenbolê li wir leqayî Siltan Miradê ku ketiye şeklê derwêşan û li nav gel digere tê. Siltan Mirad ji ber ku heta wê demê şivanekî kurd nedîtiye, cil û bergê Sîso bala wî dikişîne. Diçe cem Sîso û selayê dide. Sîso jî bi awayekî germ pêre dikeve sihnetê û bi îsrar şîr û nan îkramî wî dike. Siltan Mirad li hember vê dilovaniya Sîso, wî vedixwîne mala xwe. Sîso bêyî ku zanibe mala padişah e diçe dibe mêvanê wî. Jê re qehwe tê îkramkirin. Sîso ji ber ku şivanekî reben e û berê ne qehwe, ne jî çanda qehweyê dîtiye. Ji ber cehilya xwe berê fîncanên kehweyê biçûk dibîne dû re jî dibêje qey şîr e û ji çêja qahweyê hez nake.

211 Ey Mam Bapîr tu kuçikê mezin î..

212 Ji min re bîst pez hene ji te re jî deh.

Tevî ku tama “ vî şîrê tal û reş” nakeve serî jî dîsa bera wê tasê dide, nan diçînê û dixwe.²¹³

Lehengê çîroka şeşê Delî Îsmâîl Axa kalekî heftê salî ye. Tevî ku yekî pîr e, ne bîaqîlbûna xwe; bi asabiyet, nebîrbirî, oportinîstî û bêperwabûna xwe derdikeve pêş. Li gorî çîrokê, hîn bûye car caran diçe cem Îbrahîm Paşa hinek xercê jê distîne û tê. Her carê jî ew Îbrahîm Paşa xerciyê didiyê û dişîne. Rojekê çîma Îbrahîm Paşa wî vala vedigerîne hêrs dibe encama dahatûya xwe û zarok û xismê xwe nafikire û dixwaze wî bikuje.

Ji ber ku xatrê ku kurd didin şêx û ocaxan dizane, lawê xwe yî deh-donzde salî û jîna xwe dişîne cem şêx. Roja îne wexta nimêjê bi tebançe û xencerê êrîşî Îbrahîm Axa dike wî birîndar dike lê xulamê wî tîn alîkariya wî Îbrahîm Paşa xelas dikan. Delî îsmâîl Axa berdêla hêrsbûna xwe bi canê xwe dide. Malbata wî ji wirê tê sirgunkirin, pismamek wî li dawa xwînê tê kuştin, mal û xaniyên wan tîn xerakirin. Di dawiya çîrokê de Mela Mehmûdê Bazîdî wekî encamê ji bo kêmaqîlbûna Delî Îsmail Axa vê dibêje:

“Tayifeyêd Ekrad wehe bêaqîl in, dumahiya şûlê mulahaze nakin, her çi bête aqlê wan illa dikan. Mêr bin jin û zarok di aqlê wan da nînin.”

3.2. Wêje

Wêjeya kurdî hem bi awayê klasîk hem bi awayê geleri di nava çîrokên Bazîdî de derbas dibe. Bazîdî çîrokên terzê bi mesnewiyê hatibe nivîsandin an jî yên bi riya dengbêjan di nava gel de hatibin gotin eşkere kiriye. Hin çîrokên xwe yên ji mesnewiyên girtiye navê xwediyê berheman zikir kiriye. Berhem ji kê neqil kiribe navên wan jî nivîsandiye. Mînak di behsa çîroka Mem û Zînê de behsa berhema mesnewî ya Ehmedê Xanê dike û raste rast dibêje ku ev çîrok jî bi helbestî ji hêla Ehmedê Xanê ve hatiye nivîsîn.²¹⁴ Bazîdî di serê çîroka Mem û Zînê de bi vê hevokê girîzgehê dike:

213 Findî, 2006, r. 23. an de Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo çanda kahweyê di berhema xwe yî antropolojîk de weha bahs dike û dibêje, “ Axayêd wan maqûl û dewletluyêd wan hemû xwey qahwe û taxim in.” Ango di malên xizanan de ev vexwarin tune ye.

214 Bnr. çîroka Mem û Zînê.

“Ji şairê di kurmancan, bi zimanê kurmancî, di tarîxa hezar û şeş sedî da di qeseba Bayezîdê da, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telîf kiriye bi wezn bi navê Mem û Zînê, aşiq û maşuq, li wechê muxtesr beyana wan dike.”

Dîsa di paragrafa dawiya çîroka sî û çaran a destana Kela Dimdimê de navê Melayê Bateyî bilêv dike û behsa berhema wî ya mesnewî ya Melayê Bateyî dike.²¹⁵ Bazîdî wêjeya gelerî ya bi şeklê dengbêjî jî ji bîr nake. Bi vî awayî qala vê berhema ku wekî destan û helbesta gelerî di nava meclîsan de tê xwendin jî dike:

“ Êdî ji wê rojê heta niha jî kela Dimdimê wesanê xalite el-xaliye xerabe dimîne. Êdî ava nebûyî, eve qezya şerê Kela Dimdimê qewî meşhûr û me’rûf e di Kurdistanê danê. Melayê Bateyî li vê qîseyê muezun destanek înşa kiriye, ekserê Ekradan wê destanê di meclîsan danê dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û du’ayê dîkin.”

Çîroka sêzdemîn pêwendî bi çîrokbêjan re (dengbêjan ?) heye. Ev çîrok li civatan de gelekî tê xwendin û guhdarîkirin. Di vê çîrokê de jî bala mirov dikişîne ku nivîskar hestên xwe veneşartîye û dema behsa stranên ku xweha Siyahmed avêtîye ser birayê xwe ji hikayêdxwanên di meclîsan da neqil dikin dibîhîze dibêje: “... qewî zêde hezîn e û giriyên mirovan têtin. Gelek bi jarî û bazarî fewt bûyine.”

Her wekî li jor jî gotinê, M.B. Rudenko hatibû dayîn, gelek bûyerên dîrokî ketine nav cimaetê bûne beytên zargotinê. Ji dengbêj, çîrokbêjên kurdî gelek caran hatiye îstîfadekirin. Mînak beyta “ Dimdimê”, serhatiya “Siyabend û Xecê”, “Mem û Eysê”, “Sêva Hecî”, beyta “Elî Şêr”, serhatiyên “Şerê Sîsebanê”, “Mem û Zîn” yan jî serhatiya “Zembîlfiroş” û gelek tiştên din hem bi zargotinî hene, hem jî bi şaxê lîteraturî. Mela Mehmûdê Bazîdî çîroka Mem û Zînê ji mesnewiya Mem û Zîna Ehmedê Xanî girtiye. Ehmedê Xanî, “Mem û Zîn” a xwe ji varyanta zargotinî jî ya “Memê Alan” wergirtiye û nivîsiye. Harisê Bîtlîsî “Leyl û Mecnûn” a xwe ji “Leyl û Mecnûn” a zargotinî wergirtiye. Feqiyê Teyra beyta xwe “Şêxê Senan” ji beyta zargotina “Şerê Sîsebanê” yan jî ji beyta “Doda Gurca” wergirtiye. Eva yeka nîşan dike ku gelek bûyer û çîrokên dîrokî ketiye nava çanda gelerî. Bi alîkariya hostatiya nivîskar, helbestvan û çîroknivîsan tevî çîrok û serhatiyên nivîsandî bûne.²¹⁶ Ev şaxên nivîsandî bi tertîba xwe, bi sazmaniya xwe, bi rengê nivîsara xwe û bi xemla xwe li gelek ciyan guherîne.

215 Bnr. çîroka sî û çaremin.

216 Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata kurdî, 1992, r. 21.

Ne mîna şaxên zargotinî ne. Lê naveroka wan nêt û meremê wan, navên lehengên wan kêr û zêde mîna hev in. Eva yeka jî dîsa nîşan dike ku edebiyat û zargotina kurdî bi hev re girêdayîne ku hevbendiya wan bi hev re heye.²¹⁷

Çavkaniya çîroka dozdehan ya di derbarê bûyera Hesên (Hesem) Axa û Lalîxana Goveyî de ye jî çîrokeke dengbêjî ye. Ziya Avci²¹⁸ ji bo vê çîrokê dibêje:

“ Ev serpêhatiya evîna wan her du kesên navên wan derbas dibin, li seranserê Kurdistanê belav e û tê zanîn. Bi taybetî li heremên Serhedê ew wekî payîzok tê gotin. Malîkek ji vê ku di bîra min de ye bi van rêzikan dest pê dike:

Deştika Hopê xunav e wa xunav e

Jê derdikevin cotek qazên stûzirav e

Yekê wî Hesem Axayê min e

Ya dinê Lalîxana bejinzirav e.”

3. 3. Unsûrên Dînî

Wekî mijareke bingeşîn jiyana olî di çîrokan de nehatiye hûnan. Lê wekî mijarên talî û yêr ku bingeş çîrokan bihêz dikin henin. Di çîroka sî û yekê de motîfa jiyana olî û îbadetên Mîr Izedîn xuya dike. Xulamê Mîr Izedîn yê bi navê Koluyê Ermenî li dora çil salî ye di xizmeta wî de ye. Kolû meger bi dijminantî li cem wî maye ewqas sal. Ew dijminantiya wî bi îxaneteka wî eşkere dibe. Dema mîr emir dike ku Kolûyî bibin û bikujin pêdihese ku Kolu dijminê dînê wî ye jî. Kolu berî bê kuştin ji mîr Izedîn re nêta xwe ya rastîn dibêje. Sîr jîbo dijminahî dînê wî bike çil salî xulamtiyê kiriye. Ava xusul û destmêja wî her dem heram kiriye ku îbadeta wî betal bibe.

Piştî Kolû were dibêje Mîr Izedîn wî dike lê ew mijara talûkeya betalbûna îbadeta çil salan, di serê wî de wekî pîrsgirêkê dimîne. Ji vî bûyerê zêde zêde mehzûn bûyî. Diçe cem meleyan çareyekê dixwaze. Mele pêşniyara medrese bînakirinê dikin. Mîr Izedîn sîr jî bo vê sepêhatiyê medreseyekî bîna dike. Hîn jî medreseya ku Mîr Izedîn bîna kiriye heye û jê re dibêjin “Medreseya ‘Izye”.

217 Kurdo, 1992, r. 22.

218 Bazîdî, amd. Ziya Avci, 2010, r.11-14.

2. DI ÇÎROKÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DE MIJARÊN ŞEXSÎ

2.1. Hîle û Durûtî

Di çîroka panzdehê de em hem lehengên wekî Şêx Ehmedê Çiplaq ne durist û durû û hem jî wekî Îsmâil Begê qewî cesur, bîaqil, ehl ihsan û ehalî jê xoşnud û memleket abad nasdikin. Şêx Ehmedê Çiplaq ji durutiya xwe di nava kurdan de wekî camêr tê naskirin. Ji alîkî ve ihsan û kereman dike ji aliyê din ve xwînxwarî û zilme dike. Bi vê terzî qeza ango Mîritiya Xelatê zebt dike. Dused sêsed xulam û siwarên dilêr û hespên qenc ji xwe re peyda dike. Ji aliyekî mirovan dikuşt û cerîme digirt û ji aliyekî jî dida xelkê û kerem dikir. Bi wî re hemdem ji mîren qedîm qeza Elcewazê Îsmâil Beg hebû. Xelkê wê herêmê ji wî re Kuçik Şahîn digotin. Ew herdu qeza qedere çar saetan dûrî yekûdu ne. Her çî kes ku ji zilma Şex Ehmedê çiplaq bireviyan, dihatin ba Ismail Begê disekinîn û xelas dibûn. Şex Ehmed êdî nedikarî tiştêkî bi wan bikira. Lewranê tewecuha nasan hemûyan li Îsmâil Begê de hebû û xelk ji edla wî razî bûn. Îcarê Şêx înyaye, bi hîle dostiyek di nêva xwe û Îsmâil Begê daniye.

Êdî herdu dibine birayê axretê, destebirak û dost, zêde bi yekûdu bawerî dikin. Lê biratiya Îsmâil Begê sadiq bûyê, lakin dostiya Şêx Ehmed bi heramzayî bûyê. Ji bo wî karibe bikuje dostanî di navbera xwe û wî de danîbû. Rojekê diçe kela Îsmâil Begê û wî di mala wî de dikuje. Bi vê terzê Şêx, kela Elcewazê yanî kela Îsmâil Begê zebt dike. Îsmâil Beg bi vê hêleyê tê kuştin û sibeyê cenazeya wî defîn dikin. Dest datîne ser emwal û eşyayên wî, zarok û malbata Îsmâil begê ji kelê derdixîne û ehlên Adilcewazê yeko yeko cerîme dike.

Di Çîroka bîst û yekemîn de jî dîsa heman motif hatiya bikaranîn. Di vir de Îbrahîm Xan Begê ku mîrê ‘umûmê Hekariyan bûye, rista durûtîyê dilîze. Ji tayfa Hertuşîyan ji mala axayên Girawyan mirovek Hekariyan hebûye û mirovekî zêde zêde reşîd û camêr bi navê Şekir Axayê Şeng hebû. Di wext û zemanê xwe de gelek nav û deng peyda kiribû û zav di nava kurdan de xwedî rêz bûye. Di etrafan da dihate gotin, heta paşayên Wanê jî leşker birê kirine ser Şekir Axayî ku belkî bi dest bixînin lê mumkun nebûye. Mîrê Hekariyan jî leşker kirî çûye ser Şekir Axayî, dîsan cihê wan keleyî Îbrahîm Xan Beg bi ser neket, mayûs vegeriya. Mîr û paşayên wan kenaran hemû ketine qesda Şekir Axayî lê bi ser neketin.

Heta wexta ku çetecî Ebdullah Paşa ser eskerê Erziromê bû, emîr dike ji bo paşayê Wanê ku fermana Şekir Axayî rabûye, ji paşayê Wanê dixwaze ku cewabê ji boyê Mîrê

Hekariyan Îbrahîm Xan Begê bişîne ku ehwal ev e, fermana Şekir Axayî rabûye, bila çareyekê lê bike. Îcarê Îbrahîm Xan Beg dinivîse ji boyê paşayê Wanê ku eve şûla bi zorê nabe. Bila paşa mudreyekê sebrê bike, belkî bi hîle û terzekê em Şekir Axayê bi dest bixînin.

Mudreyekê bi ser wê borî Îbrahîm Xan Begê dostanî xiste nava xwe û Şekir Axayî, kaxez û qasîd diçin û tèn. Paş mudreyekê Îbrahîm Xan Beg, Şekir Axayî gazî mala xwe dike, dibêje bilanê were em yekûdu bibînin û tifaqa me bibe yek. Her çend Îbrahîm Xan Begê vê teklîfê li Şekir Axayê dikir, lakin Şekir Axa bawerî nekir, qebûl nekir. Îcarê Îbrahîm Xan Beg cabekî dişîne ku ez mêvanê Şekir Axayê me, ez dê di gel deh pêşyekaran bême silaviya Şekir Axayê em yekûdu bibînin, xeber bidin. Piştî ev cewab gihayê, Şekir Axayê got bilanê Îbrahîm Xan Beg kerem bike û bê, li ser seran û li ser çavan. Îcarê Îbrahîm Xan Beg kaşo bi dostanî, lê bi nêta xerab diçe mala Şekir Axa û wî li mala wî de dikuje. Bi hîle û dirûtî yê Şekir Axa tê kuştin.

2.2. Sextekarî

Çîroka sî û çaran de meseleya Berê Miradan vedibêje, mijara sextekariyê û cehalet û ehmeqiyê hatiye hûnan. Berek hebûye, rêwiyekî hejar, feqîr, tazî û perîşan, lê ewqas jî qurnaz li kêleka wî berî rûniştiye. Dixwaze siwarê ku ji dûr ve dibîne bişelîne. Lê ne hesp, ne çek, ne jî xencerek pê re heye. Hema wê gavê difikire, di nava xwe de dide û distîne û diçe serê ber. Wan pertolên xwe, ji xwe dike berê xwe dide qiblê, wekî ku duayê bike destê xwe ber bi ezmanan vedike û li benda siwarê tê, dimîne.

Ew mirovê şût î tazî ê li serê ber. Bala siwar dikişe. Nêzî wî dibe û gazî dikê, lê dema bersivê nastîne miraqa wî zêde dibe. Dikeve şikê ku ev mirov cin e, an welî ye an Hz Xidir e. Ew qasî bi duayê mijûl bûye deng naçiyê.

Rêwiyê hejar qaşo duaya xwe diqedîne û dadikeve jêr, îja bersiva siwarî didê. Dibêje ku vira ziyaret e, mirada kê hebe, kî xwe tazî bike û derkeve serê vî berî û duayê ji Xwedê re bike, Xwedê jî duaya wan qebûl dike. Siwarî dema vê seh dike ji rewî dixwaze ku hinekî li ber hesp û eşyayên min bisekine heta ew jî duayê bike. Rêwî dibêje na ji ber ku divê ez bi lez vegerim lê siwarî zêde zêde israr dike û rêwî qebûl dike. Heta siwarî diçe serê ber û xwe dişelîne, rêwî li hespa wî siwar dibe û bi dûr dikeve. Mêrikê serê berî heta têgihêje rêwî dûr ketiye gazî dike tu çima wan dibe. Rêwî dibêje “Tu

duayê terk meke. Xwedê mirazê min daye, ez darim riya xwe. Tu jî duayê bike, Xwedê mîrê miraza ye. Dibe ku miraza te ji biqebilîne”.

2.3. Fesadî, Derewkerî, Hesûdî ve Buhtan

Di çîroka siyê de mijar yeka yek, hesûdî, derew û buhtan e. Huseyîn Axayê Zîlî, axayê tayîfeya Zîlan e. Ji xwe re mirovekî qewî camêr, dilêr û zana yê bi navê Ehmedê Feqî kiribûye kehya û her çi amor û xisûsa Huseyîn Axayê hebû, hemû di dest wî Ehmedê Feqî de bûye. Gelek li nik Huseyîn Axayî meqbûl û merxûb bûye. Lê Huseyîn Axa, xweyê heft bira û ji panzdehan zêde pismam û torin hebûye. Meger ewan bira û torinên axê, kela ji vî Ehmedê Feqî kirine. Bi çavreşî, derew û iftiran ketine qesda kuştina Ehmedê Feqî. Birayên Huseyîn Axa û torinên wî hemû bûne yek qesda û ilhaka Ehmedê Feqiyê û ji boyê vî şûlî gelek caran xemeza Ehmedî ji boyê Huseyîn Axayê kirine. Lakin Huseyîn Axa guhdarî wan nedikir. Huseyîn Axa ji Ehmedê Feqî neborî û qet guh nedida biran û torinan.

Mudeyekê weha çûye, bira û torinên axê fikirîne ku bi van derew û iftirayên wan, Huseyîn Axa ji Ehmedê Feqî nabore û telef nabe. Îcarê jibo wê li çarayeke din geriyan. Çar jinên Huseyîn Axa hebûn du jê navserî û du jî ciwan. Ewan bira û torinên axayî, dadên xwe birine nik wan herdu jinên Huseyîn Axayî ku ciwan bûn, ku “eman çare maye bi we, hûn iftirayekê derheqê vî Ehmedê Feqî de bikin û evî bidene telef kirin. Huseyîn Axa bawerî bi xeberên me nake. Lakin ew ê ji xeberên we bawer bike.”

Îcarê bi çi terzê be ewan herdu jinên ciwan ên Huseyîn Axayê, derew li Ehmedê Feqî kirin. Her çawa dibe Huseyîn Axa ji jinên xwe bawer dike. Ehmedê Feqî digire teva kurê wî Bêlo tîne herduyan jî hepis dike, dixê zincîrê, malên wan talan dike. Muderekê ew bav û kur di hebsê de dimînin. Lakin her rojê dîsan bira û torinên Huseyîn Axa zorê lê dikin ku çima Ehmedê Feqî dihêle û nakuje.

Huseyîn Axa izin dide ku bi destê fileyê Mêtir Mado bê kuştin. Îcarê ew bira û torin nivê şevê tîne piştê derê pacê û gaziyê Madoyî dikin û dibêjine fileyî ku axayî emir kiriye ku bilanê niha Ehmedê Feqî bixeniqîne, zû here Ehmedî bixeniqîne, em ê jî li wir li wî seyr bikin. Madoyê Mêtir vedigere û tê odayê nik Ehmedê Feqî. Îcarê Ehmed ji Madoyê dipirse ku weha bêwext ew kî ne ku deriyê pacê dikutin û gazî te dikin. Mado digrî û dibêje ku, Ehmed axa ez jî nizanim ku çi belayê bira û torinên axê û hatine piştê derî, dibêjin ku axê emir kiriye ku bila Ehmed axayî Mado bixeniqîne, ez çawa bikim?

Mado cewabê dibêje û digirî. Îcarê Ehmed dibêje kuro Mado, ez ê bimirim tu ji boyê çi digirî?

Bi buxtanekê Ehmedê Feqî wê şevê tê kuştin. Piştî wê şevê ew xelkê ku di zincîrê debûn sê çarîk jê bizdiyan, du mehan zêde nexweş man. Madoyê file jî, her çiqas Ehmedê Feqî xenîqandibû, heta subehê nîvruhî dibe, ew jî, nexweş dibe, paş heftê ew file jî dimire. Paş mudeyekê êdî Huseyîn Axay, kurê Ehmedê Feqî Bêlo jî ji zincîrê derdixê û azad dike.

Mijara çîroka çardehê jî, li ser hesûdî, fitne û fesadiyê ye. Ebdirrezaq Begê mîrê Xoşabê ji Îbrahîm Axa diheside. Sedem jî ew fesadên ku diçin mala Îbrahîm Axa û Ebdirrezaq Beg in. Îbrahîm Axa camêrekî di demeke kin de bi talanê dewlemend bûye. Piştî wê jî “Xwedê jê re gotiye erê” her çûye hîn dewlemendtir bûye. Wekî Mela Mahmûdê Bazîdî di vir de dibêje “ Te hesêb dikir ji boyî wî mal û eqbal dem bi dem ji esmanan dibarî” Îbrahîm Axa êdî li ser zimanê her kesî ye, her kes qala wî dike. Îbrahîm Axa çi bike, çi bixwe, çi li xwe bike û çi bibêje dibe mijara sohbeta xelkê. Ên dibin mêvanên wî paşî diçin cem Ebdirrezaq Begê fitne û fesadiyê dikin. Ebdirrezaq Begê êdî hew debar dike wî li hemamê dike kemînê û dikuje.

2.4. Çavbirçîtî

Lehengê çîroka ewilî melayeke temakar, çavbirçî û yekî têr nabe ye. Ev çavbiçitiya wî di nava çîrokê de bi awayekî eşkere xuya ye. Li qiraxa çem çar pîstikê rûn dibîne. Dixwaze her çaran jî bigire lê mixabin qeweta wî têr nake, bi her du destan û bi diranan tenê dikare sê pîstikan bigire. Herdu oldaşên (rêhevalên) wî pîsta mayî digrin. Lê bele bêdilê mele ye. Çav bera pîsta mayî jî dide û ji rêhevalên xwe dawa hissa xwe ji wê pîstê dike.

Temaya çîroka çaremîn li ser îxanet, timayî û heyfihilanî ye. Lehengê çîrokê Mîrza mirovekî diz e. Di karê diziyê de bi şîrîkekê xwe re bûye destbirak. Lê şîrîkê wî yê diziyê pê re xayîn derdikeve. Para wî nadê û bi wan malên diziyê gelekî dewlemend dibe. Dema Mîrzo dawa para xwe dike bi tîfingan bera wî dide, ji mala xwe diqewirîne. Mîrzo vê rewşê nahezimîne bi çil siwaran digre ser mala Memedî û dikujin malên wî talan dikin, malên wî yên talankirî jî di nava xwe û siwaran de par ve dike.

Çîroka sî û heftê, çavbirçîbûna Şatir li serê wî dibe bela.. Şatir û Sare Salte li gundê Bêgiriye û Korzotê di Keleyek ji kufarê mayî de defîne derdixin. Di wê defîneyê

Şatir qederekî zêr, dirav, sîkkeyên ji Kufarê mayî radihêje. Lê Derwêş tenê peykereke kewê ya ji zêrên tokme hatiye çêkirin hildigre dixwe tûrê xwe. Çavê kewê ji elmanan perê wê bi cewahîran xwemilî ye. Şatir Bi wê çewalê zêr gelekî dewlemend dibe. Lê ji ber ku Şatir ji nişkave ewqasa dewlemend bûyî xelk jê dikevin şikê ku defîne dîtiye. Ev gûman heta dare guhê mîrê Bêgiriye. Wî digre û heps dike lê Şatir bi qederekî zêr û pere dide mîr pişt re azad dibe. Ev bûyer dare paşayê Wanê jî ew jî Şatir digre û heps dike qederekî pere û zêr dide wî jî Şatir û ji wir jî tê berdan. Ji ber van zêran çîroka defîneyê serê wî ji belayê xelas nabe.

2.5. NebûnaTirsa Mirinê

Lehengên Bazîdî her wekî ji wan tê hêvî kirin, ji mirinê natirsin û bi taybetî mirina di şer de wekî şeref be qebûl dikin. Bazîdî berhema xwe ya bi navê Adat û Rumetnameya Ekradiye de wexta ku kurdan dide naskirin û dibêje:

*“... eksered wan mirina di muharebê û şêrê da temenna dikin. Eger mirovek bi ecela xwe fewt bibe dibêjin mixabin xweziya di şerî da fewt bibûya...”*²¹⁹ û wiha didomîne *“Yanî birastî jî kuştinê wekî milletêd mayî ji kuştinê natirsin dilêr in.”*²²⁰

Lehengê çîroka siyê Feqî Ehmed kehyayê Huseyîn Axa ye û bi buhtanê torin û pismamên Huseyîn Axa bê sûc wê bê xeniqandin. Celladê wî ji tirsan diricife lê helwesta wî gelek sakîn e. Çend fîncan qehwê vedixwe, qelûnê dikişîne gazî torin û birayên Huseyîn Axayê dike werin hun min bikujin lê deng ji wan nayê îja nivîskar ji devê yekî ku li zindanê mirina wî vedibêje:

“Lakin kurê wî Bêlo û ew heps hemû digirîn, ... boyê çi hûn digirîn, ne şerm e, elbete bexê nêr ji boyê kêrê ye, xeman nekin.... Îcarê Ehmed ber bi kiblê rûnişt, gote Madoyê were min bixeniqîne. Mado dest diricifî û digiriya. Ehmed bi xwe ben avête ûstûyê xwe û serêd benê daye destê Madoyê, go kuro, zû bikêje û bi xwe jî digot ku laîlahe îlallah Mihemmed resûlallah, bi vê terzê can dayê. Qet mirin li nîk wî xem nebûyî.... We şevê ew xelkê di zincîrê danê sê çarîk jê bizdiyan, du mehan zêde nexweş bûn û Madoyê file jî, eger çi Ehmedê Feqî xenîqand, lakin nîvruhî bûyî, ew jî subehê bizdiyabû, çûyî û nexweş bûyî, paş heftêkê ew file jî mir. “

Lehengê çîroka sî û yekê Kolu fileyekî çil sal in xulamî ji mîr re kiriye. Kolu jî tevî ku sûcdar e û dizane wê bê kuştin jî peyva xwe rast e rast dibêje. Wexta wî digrin û dibin

219 Findî, 2006, r.30.

220 Findî, 2006, r. 34-40.

bikujin ji mufrezeyan dixwaze ku wî bibin cem mîr Wêrebûna wî nivîskar bi van gotinan tîne ziman:

“ Esseh tu yê min bikujî? Mîr dibêje, rast e, çare nîne. Îcarê kolu dibêje: ... Min xem kuştinê jî nîne, me’lûmê te jî bibitin ku min ev îhaneta çil salan di gel te kiriye, min tu ji heddê mîran rûreş kiriye, ez jî tême qetil kirin xem nîne.”

Lehengê çîroka heftemîn, Mele Mihemedê Qulpî, di rêwîtiya wî ya ber bi Bazîdê de, ji aliyê komek êzîdî ve hatibû şelandin. Ji xwe ji şûr û mertal û xucekî pirtûkan pêve zêde tiştêkî wî jî tunebû. Ji bo wî bikujin dest û nigê wî girê didin. Pîrekî ji êzîdiyên rêbir ji Mele Mihemed re dibêje ji dînê xwe vegere û bibe êzîdî yan na ezê te bikujim. Lê bibe sebeba canê wî jî, Mele Mihemed qebûl nake.

Di çîroka Hejdehê de Mele Osman rêwiyekî diçe Cizîrê. Heta digihêje gundê Kohê dibe nîvê şevê. Ji bo ku kesî aciz neke deriyê kesî naxe dare mizgeftê. Li kuncikekê xwe davêje erdê û radizê li miriyê li kêleka xwe nahese. Meger yekî gundî derengê şevê miriye. Ji bo sibê mirî veşêrin hanîne mizgeftê. Mele Osman teyşa xewê hisa yekî dike lê dibêje qey ew jî rêwiyek e. Xwe bi wî ve dizeliqîne û radizê. Dibe sibe meleyê mizgeftê dema tê Mele Osman jî radibe ser xwe û serê xwe radike. Mele mizgeftê wexta çav li Mele Osman dikeve dibêje qey ew mirovê mirî ye û ruh hatiye û ji tirsan jidil diçe.

Mela Mehmûdê Bazîdî li ser lehengiyê, zêde zêde sekiniye. Li ser cesaretê û lehengiyê qet ferqî nexistiye navbera jin û mêran. Her wekî lehengiya Guher Xanim û Asmê Xanim, Melîke Xatûn jî ji bo welatê xwe ji dijminan xelas bike berxwedide. Bi vê ferasetê di hikayeta çilî de lehengiya Melîke Xatûnê dipesinîne dibêje²²¹

“ Lakin eve şûle bi cesarete Melîke Xatûnê bûyî meşhur e kirine. Mîr Şemdîn hinde tedbîr cerg nebûye ji boyê vê cesaretê.... Niha jî ji wê silsileyê dîsanê begzade li Akreyê heyin. Lakin hikumet gihaye destê Romê, biyanî hakim bûyne. Çerxa felekê bi kesekê ra nedomandiye.”

2.6. Zexelî û Timahiya Melayan

Ji bo berjewendiyê bikaranîna dînê ji hêla nivîskar ve bi awayê mîzahî hatiye hûnan. Li gorî Mela Mehmûdê Bazîdî Bazîdî divê berê alim û zana li gorî rêç û normên exlaqê tevbigerin. Bi sedema ku civak vê yekê ji zana û aliman hêvî dike, Mela Mehmûdê Bazîdî di vê çîrokê de ji hêviya civakê re bûye ziman.

221 Bnr. Bazîdî, Hikayeta Çilî.

Piraniya civaka Mela Mehmûdê Bazîdî bawermendên ola Îslamê ne. Tevger û helwestên bawermendan bi ayet û hedîsan hatine diyarkirin. Li gorî ola Îslamê, mele be, şêx be, zarok be, jin be, wexta li gor Qur'ân²²² û sunetê²²³ hereket kirin rast e, nekirin ne rast e. Pîvana dîn Qur'ân û sunet e. Di gelek ayetên Qur'ânê de jî tê gotin ku divê meriv li gorî emrê Xwedê û Pêxember hereket bikin. Her wiha tiştên li gor Qur'ân û Pêxember asayî û meqbûl bin, tiştên ne li gorî Qur'ân û sunetê bin jî li gorî ola Îslamê ne munasib in. Ji ber ku mele û feqî vî dînî çêtir fam dikin divê li gorî normên dînî tevbigerin.

Mela Mehmûdê Bazîdî van çîrokên di civata feqehan de ji bo qerfê tên gotin ji bo rexneyê li civakê bike wekî fîrsetekê dihesibîne. Mîzah, ji bo rexnekirin û vegotina tiştên ne li rê de riyêke bîra bîra ye. Ji ber ku pîşeya nivîskêr jî melatî ye hîn rehetir di xwe de dibîne qerfan bike. Bi qerf, ev hêlên xwendeyan ên ne li rê derdixe holê û bi zimanekî mîzahî hem ji aliyê exlaqî û hem ji aliyê olî rexne dike.

Her çiqas di perwerdeya li medreseyan de qaîdeyên Quran û sunnetê fer bûbin jî di çîroka yek, du û sêyan de lehengên mele li gorî vê hereket nakin. Lehengê çîroka ewilî melayeke temakar û çavbirçî ye. Ev çavbirçîtiya wî di nava çîrokê de bi awayekî eşkere xuya ye. Dixwaze çar pîstikê rûn ên ser ava çem ketine jî bigire lê qeweta wî têrê nake, bi her du destan û bi diranan tenê dikare sê pîstikan bigire. Herdu oldaşên wî yên rêhevalên wî pîsta mayî digrin. Lê bê dilê mele ye. Çav bera pîsta dinê jî dide.

Çîroka duduyan bi temayeke komîk û surrealist hatiye hunandin û dîsa li ser timakariya qîsmê xwendeyan e. Li jor mijara hikayeta yekê bi eşkere çikûsiya qîsmê meleyan bû lê di vir de eynî mijar bi qerfî hatiye pêşkeşkirin. Nivîskar mijara xwe dibe ser mihracê wekî tê zanîn di ola Îslamiyetê de mîrac bûyereke pîroz e. Hezretê Mihemmed di wê demê de hildikişe cem Xwedê li wê alemê dibe şahid û gelek tiştên ku mirov ne mimkînê bibîne dibîne. Gelek melaîketan yên ku li ser karên xwe ne dibîne.²²⁴

Lehengê çîrokê Melaîket û Hezretê Muhemmed in. Melaîketek defek û çomaxekî di destan de ye, bi dema yekî xwende xêrekê bike li doholê xîne hatiye peywirdarkirin.

222 Muhammed Husên ez-Zehebî, et-Tefsîr vel-Mufesîrûn, Darul Erqan, Beyrûd, Bêdîrok, I, 32. Sunnet tiştên ku Pêxember gotiye, tevgerên ku kiriye û peyv helwestên ecibandîye. Sunetên Pêxember ji tevsîra Qur'ânê tên hesabandin.

223 Di berhema Ebu Davûd, Menâsîk, 56; îBnr.î Mâce, i84; Muvetta, Kader, 3; îBnr. Hanbel, III, 26; Muhammed Abdurleuf el-Menâwî, Feyzulqedîr Şerhul- Câmiis- Sexîr, Mektebetul Mustefa Muhammed, Misir, 1938, 240. de hedîsên Hz. Mihemmed gotiye tê neqîlkin, “ Min ji we re du tişt hiştiye, wexta hun li gor her du tiştan bimeşin hun tucarî nakevin riyê xwa Ev her du tiştan Qur'ân û sunnet e.

224 Di Qurana pîroz de yekemîn ayeta sureya Isra.

Bi vî awayî hemû ehlê semawatê wê pê bihesin ku qismê xwendeyan xêrek kiriye. Lê qismê xwendeyan ne ji nezanî, ji xesîsya xwe ji çirka dunya ava bûye heta Mîhracê tu xêr nekirine. Piştî pêxember aleyhisselam, ji wî melekî sewal kirin ku hindê ku tu hatî mamûr kirin te qet çend caran li vê dahulê daye? Melaîket bihêvî dibêje “ *heta niha ez muntezer im, lakin min qet li dehulê nedaye paşê niha jî êdî Xwedê bizanê.*”

Mijara çîroka siyê li ser konetiya (qurnaziya) melayekî ye. Mele di mizgeftê da di waazên xwe de ji gel re dibêje, çî cil û nanên we yên zêde hebin bidin jaran. Wê rojê jina mele jî hatiye vaazê û li mêrê xwe guhdarî kiriye. Bandora vaazê ewqasan li ser wê çêbûye ku çûye malê û di vaazê de çî hatibû gotin kiriye. Lê nêta meleyî ya rastîn, dema jina wî, li şîretê wî guhdarî dîke û bi ya wî dîke derdikeve holê. Sedema vê waazdana wî ev e ku xelk tiştên xwe yên zêde bidin wî. Di çîrokê de nivîskar lehengî wiha dide peyivandin:

“ keçê min şîret li xelkê dikirin li nefsa xwe nedikirin. Min wesanê we’ez kirin ku xelk cilêd xwe yê zêde û nanê bidene min, ne webû ku tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideyî xelkê. Mirada min dayna nasan bû, te înyayê ev şîreta ji boyê xelkê derhekê min îcra kiriye.”

BEŞA ÇAREMÎN

JI HÊLA ZIMAN Û WÊJEYÊ VE DAHÛRÎNA ÇÎROKAN

Bêgûman ziman û şêwe ye, ya zindîtiyê dide berhemê. Başbûna berhemeke hunerî bi ahenk tevîhevkirina zanistê, peyvê û wateyê tê pîvan. Bi taybetî berhema hunerî bi evên ku hatin jimartin û bi sîstemeke awayeke rind û bi teşeyeke herikbar bê nivîsandin, diafire. Ev harmonî ye, ya ku xwendevan ji dinya rastîn digre dixê nava dinya berhemê. Ger berhem dikare vê bike, em dikarin bêjin berhem û nivîskarê berhemê serkeftî ye.

Shakely li ser şêweya çîroka kurdî wiha dibêje: “Di çîroka kurdî de li hemberî pêşveçûn û dewlemendbûna naverokê, şêwe tune ye. Piştî 1970yî cûdabûn çêdibin. Di pirtûka Ferhad Shakely de gotinên Huseyin Arif wiha tê neqil kirin: “Stîla vegotinê 1925an heta 1960î hakim e. Ev mijar bû wateya dewlemendiya teferuatê lê çareseriyên di rû de. Kes û bûyer tenê ji rû de û pîrî caran bi edebî dihate vegotin.” dibêje û dewam dike, mijara şêweyên nuh û guhertî di destpêka 1970yî hate rojevê. Wê deme wêje ji awayê şêweyî bi teknîkên nuh pêşket û ji berhemên bere veqetiya.”²²⁵

Zimanê çîrokan, bi peyvên erebî, farisî û tirkî dagirtiye, lê zimanekî herikbar e. Li gorî pergala perwerdeya dema Bazîdî tê de gihaştîye ev rewş gelekî asayî ye. Li gorî me ji alîkî bi van peyvên biyanî hebanoka peyvên çîrokê dewlementir kiriye, ji aliyê din jî ji kapasîteya famkirinê dûr neketiye. Seîd Dêreşî²²⁶ di pirtûka xwe de behsa zimanê Mehmûdê Bazîdî wanî dike:

“Tişteke girîng heye min divêt bêjim Mela Mehmûdê Bazîdî li bin kartêkirina farisî û tirkî da hatiye tîfandin. Wesanê di herdu ezmana da şehreza bûye ku ezmanê wî yê makê pê şeperze bibît. Ne xasme şehrezaya wî di ezmanê farisî da ku wî kitêb jî her ji wî zimanî wergêraye. Evca hîvîdarim xundekan û vekolînevan wextê dixwînî neveciniqin. Lê dîsanê jî ew zimanê wî pê nivîsiyê sert û xoş û rewan e. Bazîdî jî wekî hemî helbestvan û nivîsvanên kurd yê kevî zimanê wî gelekî dagirtiye ji peyvên erebî, farisî û hindek cara jî tirkî. Lê eve ne kêmasî ye bo wî. Ji ber ku zimanê wî serdemî bi vî rengî bûye.”

225 Shakely, 1998, r.77.

226 Dêreşî, 2007, r. 11.

Alimên wê demê di medreseyan de perwerde didîtin. Pergala perwerdeya wê demê giranî bi erebî bû, encama vê jî bandora zimanê erebî ya li ser berheman dikir. Ji xwe wê deme li dewletên ola îslamê desthilatdar bû, zimanê zanistê erebî bû. Li herêma Mela Mehmûdê Bazîdî dijiya di bin hukmê Osmaniyan de bû. Ji ber vê rastiye, di nava berheman de hindik be jî bandora peyvên tirkî hene. Di zimanê farisî de ji xwe bi qasî Şerefnameyê wergerîne kurmancî biserketî bû.

Cihê ku perwerdeya medreseyan dihat dayîn heman bandora zimanê erebî li wir jî xuya bûye. Mînak Dr. Zebîhullâh-i Safâ²²⁷ li ser mijara peyvên erebî ya di nava berhemên wê demê de dibêje:

“ Helbestvanên faris di medreseyan de perwerde didîtin û digihîştin. Di encamê de zimanê erebî ji nêz ve nasdikirin. Di medreseyan de tevî ilmên olî, ilmên wêjeyî jî hîn dibûn. Berhemên wan ên ilmî û wêjeyî jî bi zimanê erebî bûn. Ji ber wê jî peyvên erebî zêde zêde tê de hene.”

Zimanê Mela Mehmûdê Bazîdî û hemçaxê wî yên nivîskarên tirkî meriv muqayese bike, uslûba zimanê Çaxa Servetî Fînûn gelekî giran e. Zimanê çîrokên wan de zêde zêde peyvên farisî û erebî heye. Çend istisnayên wekî Halit Ziya û Mehmet Rauf derketiye, lê ew jî li gora Huseyîn Cahit, ji hindikbûna hebonoka wan a peyvên dihat. Di bîranînên xwe de weha dibêje Huseyîn Cahit:

“ İsmail Habib Beg bi wesileya wêjeya Servetî Fînûn dema qala min kiriye, xwerûbûna zimanê min ji bo min wekî wêfêkî gotiye. Lê belê zanîbûya sebeba xwerûbûna Rauf û min... Hun a rastî bixwazin xwerûbûna zimanê me ji cahilbûna me dihat. Erebiya Cenab û gencineya peyvên Fikret we bidaya min, me yê çî binivîsanda! Ez ne bawer im erebiya Halit Ziya zêde kûr e lê ez dibêim qey têra hevokên xwe bi erebî û farisî bixemilîne dike. Ên herî cahil ez û Rauf bûn, ji ber wê me bi tirkî dinivîsand.” ²²⁸

Ji bo peyvên tirkî û tesîra çanda Osmanî ya li ser berhemên kurdî, fikra Ferhat Shakely²²⁹ were ye:

“Ji ketina Mîrektiya Baban heta şerê cihanê ê yekemîn û rabûna Qiraltiya Kurdistana serbixwe, Kurdîstan perçeyek ji erdê Imparatoriya Osmanî de bû. Ziman û

227 Zebîhullâh-i Safâ, 2002, r.156.

228 H. Cahit, 1999, r. 145.

229 Shakely, 1998, r. 25.

wêjeya tirkî di jiyana çandî de serdest bû. Hindik mektebên ku di wir de hebûn de perwerde bi zimanê tirkî bûn.”

Ev çil çîrokên han ên ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdîê Bazîdî ve hatine nivîsandin, xwediyê hinek taybetmendiyên in û hinek ji wan wekî ew çîrokên gelerî, hinek jî nîn in. Hinek ji bûyerên rasteqînî yên di nav xelkê Kurdistanê de qewimîne pêk hatine bûye çîrok û herikiye nava berhemê. Mela Mehmûdê Bazîdîê Bazîdî ew bi wersiyona di nav xelkê de tê gotin nivîsandine û ew kirine çîrok û bi awayekî xweş û hêja pêşkêş kirine. Ew navên kesan, gundan, ciyan û heta tarîxên tê de hatine bikaranîn, tev yên rasteqînî ne. Hinek ji wan li ser serpehatî û bûyerekê ye. Rasteqîniya çîroka Pierre A. Joubert bi berhema wî ya 1861 de li Parîsê de çapkirî de ispat e.²³⁰

Di hin çîrokan de vebêjer fikrên xwe, feraseta xwe ji ber ku dixwazin bi xwendevanan ve par ve bikin, helwesta xwe ya li hember bûyeran bi eşkere bellî dikin. Hin jî qet nakevin vê riyê li asoyekî bilind li meselê dinerin û dixwazin çavdêriyên xwe bidin herkesî. Ne tenê li lehengên çîrokê li bûyeran jî bi çavekî bêalî dinêrin. Dixwazin bibin şahidên dema xwe. Mela Mehmûdê Bazîdî bi terzekî wekî ku çîrok jê re hatiye gotin û ew jî neqil dike vedibêje. Li derveyî çîrokê ye. Wexta çîrokê vedibêje carinan xwe vedişêre carinan jî eyan beyan xwe derdixe rastê. Fikrên xwe jî carinan lê direşîne²³¹

Nivîskar ji xêndî çîroka çarê bi piranî devê kesê sêyemîn dipeyive. Di çîroka Mem û Zînê de jî her wisa ji ber ku nivîskar vê çîrokê ji terzê wezn kiriye pexşan û teva bûyerê ji ber destana Memê Alan ku bi saya dengbêjan jî bihîstiye zêde hakimî bûyerê ye. Ji ber vê hinkî qels be jî bêhna vebêjeriya hakimî jê tê. Carinan diçe cem Zînê û Sitî carinan li cem Bekirê mufsîd û mîr Zeyneddîn e; carinan li ba Mem û Tacdîn e; carinan jî li cem gelê Cizîrê ye.

*“ Ev xeber û ev şûla di nêv Cizîrê da wekî mizgînî belev bû û her kes keyfxoş û şad bûn ku hazreta mîr li Memo hate rehmê û ji Zindanê bideranî û xuha xo Zînê digel mal û xelatan dê bidêtin û çirax biketin. ”*²³²

Çîroka yanzdehan de nivîskar bi destpêkeke şeweya gelerî û çîrokbêjî dikeve çîrokê: *“Careke ji caran rehmê li bab û dayêd guhdaran”* û her weha dewam dike.

230 Pierre- Amedee Jaubert, Reise Durch Armenien und Persien, 1822.

231 Duhokî, Mem û Zîn, 2002, r. 73-84.

232 Duhokî, 2002, r. 81.

Çîrok tam li gorî terza çîroka geleri ji peyama dayînê hatiye nivîsandin. Ew qasa girîngî daye mesaja ku bide, qiymet nedayê ku navên lehengan ên taybet jî bide. Lehengên sereke paşayê Bazîdê û xanima wî ye.²³³

Nivîskar hakimî fikr û hêstên lehengan e. Ga diçe cem Zînê hêst û rewşa wê vedibêje ga dare ba lehengên din. Tiştê ku di dilê wan de derbas dibe nîşanî xwendavanan dike. Terza vegotina vebêj bêtir vegotinî ye, ji teswîrkirinê bêtir girîngiyê daye bûyerê.

Sedema terza vegotina çîroka Mem û Zînê û Guzel Xatûnê ne yek e elbette. Carinan di heman demî de diçe du-sê cihan. Mînak çîroka Guzel Xatûnê vedibêje di heman demî de tê îja çîroka mêrê wê Cergo vedibêje.

Mekan, di çîroka Mem û Zînê de bajarê Cizîrê; dem jî sala hezar û şeş sedî ye. Carinan heta roj diyar dibe mînak roja Newrozê 21ê Adarê ye; carinan dahnên rojê diyar e. Dem û mekan jî derûniya lehengan nîşanî mirov didin. Dilşadî û mekana vekirî; xemgînî û mekanê girtî bi hev re tekîldar in. Mem û Zîn di dema biharê, -di dema xweza xwe nuh dike gul û kulîlk vedibin- de hevdu dibînin û evîndarê hev du dibin. Bi gotineke dinê guhertina xwezayê re guherîna derûniya mirovan jî raxistiye ber çavan. Balkêşe ku roja Newrozê ye û li geştê mekanekî vekirî û dilşad in. Wexta Mem û Zînê li baxçeyê mîr de hev du dibînin de jî dilşad in. Mekanên girtî ji aliyê derûnî de xerabiyê simbolîze dikin. Dema Mem dikeve zindanê, Zînê jî xwe li heremserayê hepis dike. Ezaya Mem di zindanê de dikşîne Zîn jî di seraya de xwe dikişîne. Her wekî tê xuya mekanên girtî û vekirî simbolên cuda nin. Geşt her çiqasî dilşadbûn û azadiyê simbol dike zindan jî ewqasa tenêbûn, bêçarebûn û xemgîniyê nîşan dike.

Di çîroka Guzel Xatûnê de ew xana xewle sembola tirsê û xeternakiyê şeva reş jî sembola tenêbûnê ye. Roja Mem û Zînê li baxçeyê civatê dikin wext roj e û her du dilşad in. Lê bi tarîbûnê re ew dilşadbûna Mem û Zînê jî diqede. Ji ber ku mîr ji nêçîrê tê, û ew bî zevtkirin ewê dawiya wan be. Mînaka sahneya mîr Zeyneddîn ji nêçîrê vedigere dem ber êvarî ye.

Mem di zindanê de şeş mehan dimîne. Ew mekana ku Mem tê de ye, derûniya Memî jî rê dide; Ya ji Memî re dijwar tê ne şerdê zindanê ye, ji dûrbûna Zînê ye. Bi wateya rastîn Mem girtî ye ne azad e, lê ji aliyê derûnî bê Zînê ye. Êşa evîna Zînê ye, ya

233 Bnr. çîroka yanzdehan.

wî dihelîne. Sembola serayê ji bo Zînê heman tişt e. Her çiqasî di nava serayê de be jî, ferqa wê ji zindanê tune ye.

Sahneya ku çîrok lê diqewime li gorî bûyerê tên guhertin. Geh li deşt û seyranê ye geh li baxçeya seraya mîr Zeyneddîn; carina li zindanê, carina li emlaka Tacdîn in... li gelek meknan bûyer diqewime. Mekanên hundirîn, mal û emlakê Tacdîn, heremsera (an jî heremxanê), qesr (an sera), dîwanxane, zindan (an hepisxane) e. Mekanên derveyîn bax, baxçe deşt û sehrayê, sûk e. Di vegotina çîrokê de bûyer bi dema borî tên vegotin.

Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî meriv dikare bibêje tasvîr kê mîr in. Teswîra derdorê ne ji bo berhemê bixemilîne bes ji bo vegotina bûyerê hewceye tên dayîn.

“ Mem cuda û Zîn cuda her yek bi derdê eşqe dişewitin weha pêleke çû baxçeyekî mîr Zeyneddîn qewî dilguşa û cihekî keyf û sefayê hebû ku di nêv wê da otax û diwanxane û qulatin û bixeyr ji wan her çi lazimî di ibra xundkarane hemû mewcûd bû û mureteb û muzeyen amade her lewazimatê ku diva dayima hebû carnan digel nedîm û muqereb û eyana diçûne wî cihê keyfê li wê derê eys û uşret dikirin.”

Taybetmendiye lehengên Mela Mehmûdê Bazîdî ên ji hêla fîzîkî û ji hêla ruhî ve bi hêla şêweya tevgera wan, axaftina wan û fikrên wan li nava çîrokê reşandiye. Wek mînak dema Stî û Zînê ji alî fîzîkî teswîr dike wiha dibêje. “ Ev her du kiçêd pak, spî gehane dereca kemalê. Di nêv heremsereyê da xudam û cewarî di xizmeta wan de, be naz û nîmet, perwerde, bi keyf û sefayê, di eysi û zewqê de bûn.” Di çîroka Lalîxan û Hesên Axa de nivîskar Lalîxanê wiha teswîr dike: “ Bi emrê xwedê, ba rûpekê ji rûyê Lalîxanê direvîne û rûyê Lalîxanê vekirî dimîne. Hesên Axa rûyê Lalîxanê dibîne ku weko hîvê bi dera bi çardehê da. Êdî mehbubêd wekê wê belko kê mîr heyîn.” Di çîroka heştê de Barnîk weha nasandî:

“ Nêzokê Kela Xoşabê du gundêd Mexînan heyn, nave yekê Qesr û navê yekê Pagan. Di gundê Paganê da qîzeke qewî zêde rind navê Barnîk hebûye.” Di çîroka Siyahmed û Şemsê de “ Keçeke Tîmûr Paşa ji hebûye şanzde-hefdeh salî, navê Şems. Qewî zêde xweyê husn û rind û sipehî. Halê ciwanîyê me'lûm, wisa...”

Çîrokên wî wekî qada şer e. Di çîrokên wî de leheng, leşkerên ku li hember ehmeqiyê, barbariyê, bêahlakîyê, neheqiyê, diziyê, fesadiyê, derewkariyê şer dikin û carina hene, ew leşker carina têk diçin carina jî bi ser dikevin.

Nivîskar ne di nava çîrokê de ye, karê vebêjtiyê dike. Kesayeta xwe carinan nikare veşêre bi çend hevokan be jî xwe derdixe rastê. Mînaka wekî çîroka Siyahmed û Şemsê de dibêje

“ Paşê xuha Siyahmedê Silivî hebûye, zaf istiran li wan girêdaye û el an ew istiran û qezaya wan di nêva Ekradan da meşûr e, hikayêdxwanêd di meclîsan da neqil dikin, lakîn istiranêd wan jî di gel dibêjin, qewî zêde hezîn e û giriyên mirovan têtin. Gelek bi jarî û bizarî fewt bûyine.”

Mela Mehmûdê Bazîdî dema çîrok dinivîsîn, gelo xwestibû bi awayekî modern binivîsîne an na? Ew der naye zanîn, lê eşkere ye ku ew zêde zêde di bin bandora çand û wêjeya gelerî de ye. Ev jî ne tiştekî dijxwezayî ye. Lewre ji zarokatiya xwe heta serdema nivîsandina wan çîrokan, ev çanda wêjeya gelerî bihîstiyê û jê sûd wergirtiye. Her çiqas nivîskarên hemçaxê wî ên tirk Ehmed Mithat, Namik Kemal û Samî Paşazade Sezaî mînakên rojava ji xwe re kirine mistere lê çîrokên xwe ji bandora çanda gel nedikarîbûn biqetînin.²³⁴ Ji alîkî din belkî ev cure wejeyê ji bo bi gel bide qebûlkin Mela Mehmûdê Bazîdî her wekî Ahmêd Mîthat ji bo bigihêje kitleyek fîreh bi terzê çîrokbêjan bûyer vegotiye û peyiviye wekî wan tevgeriyaye, ji qisseyan hisse derxistiye. Elbette ev qaîde ji bo Bazîdî jî derbasdar e. Jan Dost jî çîrokên Bazîdî wiha dinirxîne:²³⁵

“Hin ji wan serpêhatî ne û nêzîktirî tarîxê ne, yanî ne çîrokên xeyalî ne, belê bûyerê rasteqîn yên dîroka kurdan in. Mîna hikayeta pêncan, şeşan û nehan. Lê mixabin sal û dem di wan de ne diyar in. Hema behsa kesên naskirî yên di dîrokê de û bûyerên dîrokî dike. hin ji wan çîrokan jî pêkenok in û çivanokên kurt in ku bi texmîna min di şevbuhêrkan de li odeyan û di dîwanên began û civatên feqîyan de dihatin gotin.”

Mela Mehmûdê Bazîdî di vegotina çîrokan de carinan hêrs dibe ji lehengên ne baş re sifetan nebaş bi kar tîne. Ji bo xulamê di çîroka Cergo û Guzel Xatûnê dibêje ciwan û heramzade. Ev sifeta “heramzade” ji bo hindik kesan bikar aniye: Ji xêndî vî Kirêtî ji Bekoyê namdar ê ku bi fesadiya xwe bû felaketa Mem û Zînê; û ji Şomoyê ku dizîya dêran dike re bikaraniye.

234 Berna Moran, Türk Romanina Eleştirel Bir Bakış I, İletişim Yayınları, 20. baskı, İstanbul, 2008, r. 25.

235 Dost, 2010, r. 14.

ENCAM

Di vê xebatê de me di derbarê jiyana û berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî de agahî da. Dû re em li ser girîngiya berhemên Mele Mahmûdê Bazîdî ya di nava lîteratura kurdan de sekînin. Piştî me çavekî li destpêka çîroka rojhilatî da û li ser dahûrîn. Me xwest ku di nava wêjeyê rojhilatî li cihê çîroka kurdî binerîn û em hinek agahî di derbarê hemdemê Mela Mehmûdê Bazîdî bidin. Bi vî awayî weke wêneyeke fotografîkî, em dikaribin di nava wejeya rojhilatî de girîngiya berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî hîn eşkere derxin holê.

Bazîdî di çîrokên xwe de wêneyeke rengîn a zemanê xwe kişandiye. Bi gelemperî ne tenê, qala mirovên kurd ên ku li ser erdnigariya Serhed, Botan, Behdînan û Anadolê dike. Ji her neteweyên ku li ser erdnîgariyê dijîn di çîrokê de mevcûd e. Lehengên Bazîdî li gorî neteweyan meriv bibêje ereb, fîleyên li heremê dijîn, Kurdên Musilman û Êzîdî, Frengî (Ewropayî), Osmanî nin. Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî digel qiymeta wan a wêjeyî, ji aliye antropolojîk, sosyolojîk, folklorî kurdan, dîroka wêjeya kurdan û siyaseta heremê, de jî hêjayî gotinê ye. Êşa ji evîne û hêviya dinyayeke mişt bi aqil û dad tîne ziman. Rastiyên tahl ên civaka kurdan, pîrsgirêkên aborî û civakî tekîliyên civakî û şexsî carinan bi zîmaneke mîzahî lê her dem bi wêrekî hûnaye, di çîrokên xwe de.

Zîmanê Mela Mehmûdê Bazîdî li gorî hemçaxê wî yê nivîskarên tirkî meriv muqayese bike, ne giran e lê. Di serdema Bazîdî berhem dida li cepheya tirkî de serdema Servet-î Funun hebû. Uslûba zîmanê çaxa servetî funun gelekî giran e. Zîmanê çîrokên wan de zêde zêde peyvên farisî û erebî tije ye. Zîmanê Bazîdî tevî ku peyvên erebî, farisî û tirkî tevlî çîrokên xwe kiriye, li gorî pergala perwerdeya dema Bazîdî tê de gihastîye ev rewş gelekî asayî be jî, dîsa jî meriv nikare bêje zîmanekî giran e ku gel jê tenegehê. Hem ji alîkî bi van peyvên biyanî hebanoka peyvên dewlementir kiriye, ji aliyê din jî ji kapasîteya famkirina gel dûr neketiye.

Em bîna ser feraseta çandî ya Bazîdî, ew hebanoka xweyî zanistî şiyaye ku her qada bi alaqaqî mirovan bikar bîne. Her wêjeyan dizane ku ji bo berhemeke yegane bide dive ew ji rehê xwe veneqete. Wêje û çand wekî goşt û hestî ji hev naqetin. Bazîdî berhemên xwe li ser çand û dîrokê bîna kiriye û di navbera xwe û xwendevanan pîreke saxlem çêkiriye. Mîrata çand û dîrokî jî baş bi kar aniye.

Di naverokên çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî de jiyana mirovên sed û pêncî sal berê tê ber çavên mirov. Di nava çîrokan de em rastî evînen wan tên. Rastî hezkirin û hevdujirtina xism û merivan, aliman, cahilan, kêmaqilan jî tên. Lehengî, berxwedan, şer, talan, rev, dijminahî û macera tije ye. Durûtî. Sextekarî, fesadî, derewkarî, hesûdî, buxtan û çavbirçîtî arizayên şexsî nin. Bûyerên qewimîne rewşa civakê jî derdixe pêş. Ji ber vê sedemê ev çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî hem ji hela wan a wêjeyî biqîmet e hem jî ji gelek hêlan malzemeyan dide zanistên civakî. Xalên wekî, mucadeleya desthilatdarî ya di navbera mîrekiyên kurdan, îdareya dewletê, pêwendiya kurdan û Îraniyan û Osmaniyan li gorî me ne tenê ji aliyê hêla wêjeyî ji aliyê aborî, siyasî û civakî jî divê bê analîzkirin. Gelek malzeme ji Sosyolojî, psikolojî, dîrok, dîroka wêjeyê, zanista siyasetê, antropolojî re heye divê di van hêlan jî bê vekolan.

Çîrokên ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, xwediyê hinek taybetmendiyên in. Hin ji wan çîrokan jî pêkenok in û çivanokên kurt in. Jibo di şevbuhêrkan de li odeyan û di dîwanên began û civatên feqîyan de dihatin gotin. Hin jî ji bûyerên rasteqînî yên di nav xelkê Kurdistanê de qewimîne pêk hatine. Mela Mehmûdê Bazîdî ew bi wersiyona di nav xelkê de tê gotin nivîsandine û ew kirine çîrok û bi awayekî xweş û hêja pêşkêş kirine. Di hin çîrokan de navên kesan, gundan, ciyan û heta tarîxên ku qewimîne hatine dayîn. Bi vî alî nêzîktirî tarîxê ye. Yanî ne çîrokên xeyalî ne, belê bûyerê rasteqînî yên dîroka kurdan in. Çîrokên dîrokî, yên wekî hikayeta pêncan, şeşan û nehan, mixabin sal yan jî dem di wan de ne diyar in. Hema behsa kesên naskirî yên di dîrokê de û bûyerên dîrokî dike. Destana Dimdimê, Destana Mem û Zînê, Destana Koroxlî, Destana Siyahmed û Xecê hin destanên ji berhemê ne.

ÇAVKANÎ

Ahmedzade, Haşîm: Romana Kurdî û Nasname, Wer. Fahriye Adsay, Avesta, Stenbol, 2001.

Akyol, Hilmî: Antolojiya Dengbêjan 1-II, Edît: Azad Zal, weş. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, 2011.

Alakom, Rohat: Kûrdolojî Biliminin 200 yıllık geçmişi (1787-1987), Deng Yayınları, İstanbul 1991.

Alakom, Rohat: Efsaneyaya Qanadê Kurdo, Lêkolînek li ser Qanadê Kurdo <http://netkurd.com/? mod=news&option=view&id=8494>, (01.03.2013).

Aslan, Hanifi: Halit Ziya Usaklıgil'in Hikâyelerinin Tematik İncelenmesi, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Gazi Üniversitesi, Ankara, 2008.

Avcı, Ziya: "Mela Mehmûdê Bazîdî Bazîdî (1799-1867)", Kovara Bîr, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> (14 Mijdar 2012).

Bahar, Muhammed Takî: Meliküşşueral, Sebqşinas Bâhar, C. I. – III, Tehran, 1354.

Barnas, Rojen: "Termên Edebî". Nûdem, j. I, 1992, r.29-36.

Bazîdî, Mela Mehmûd: Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye, amd. Ziya Avcı, Weşanxaneyaya Lîs, Diyarbekir, 2010.

Bazîdî, Mela Mehmûd: Camî'eya Risaleyan û Hikayetan, amd. Ziya Avcı, Weşanxaneyaya Lîs, Diyarbekir, 2010.

Belge, Murat: Edebiyat Üzerine Yazılar, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2009.

Berzencî, Omer Marûf: Lêkonînewe û Biblografyay Çîrokî Kurdî (1925-1969) Korri Zanyarî kurd, Baxda, 1978.

Beyter, Önder: "Zanista Edebiyata Rûberhevî/Muqayese û Rûberhevkirina Çîrokên `Ewilîn ên Kurdî (Mem û Zîn) û Tirkî (Ta` Aşşuk- i Talat û Fîtnat)(10.04.2012).

Bingöl, Yüksel: İshak Paşa Sarayı, Kültür Yayınları, Ankara, 2008.

Bois, Th, V.Minorsky, Dn Mac Kenzie: " Kürtlerde Toplumsal Yaşam", Kürtler, Kürdistan, wer. Kamuran Fıratlı, weş. Doz, Çapa 2., Stenbol, 2004.

Boratav, Pertev Naili: 100 Soruda Türk Halk Edebiyatı, Gerçek Yayınevi, İstanbul, 1969.

Boratav, Pertev Naili: Folklor ve Edebiyat, Cilt I, Adam Yayınları, 1982.

Boratav, Pertev Naili: Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 2002.

- Can, Ehmed Hamdi: Zekeriyâ Tâmir ve ‘İbâdullâh Adlı Eserinin Teknik ve Tematik İncelenmesi, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Atatürk Üniversitesi Erzurum-2006.
- Celâlî, Murad: “Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye û Çend Gotin”, 2010, Nûbihar 112, r. 50-54.
- Cewerî, Firat: Antolojiya Çîrokên Kurdî, Cilt I(1958-2003), Nudem, Stenbol, 2003, r.37-58.
- Dêreşî, Se’id: Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Amadekar: Seîd Dêreşî, Spîrêz Pres, Duhok, 2007.
- Dost, Jan: Adat û Rusûmetnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bazîdî, Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2010.
- Dost, Jan: Kela Dimdimê, Avesta, Stenbol, 2011.
- Duhokî, Xelîl: “ Mela Mehmûdê Bazîdî” Gulîstan, Hejmar I. 2002.
- Ebu Davûd, Suleyman b. Eş’as, Sunen, Stenbol, 1981.
- Eliade, Mircae: Dinsel Düşünceler ve İnançlar Tarihi Gotama Budha’dan Hıristiyanlığın doğuşuna, Kabalcı, 2003.
- Emin Nihat Bey: Emin Nihat Bey, Musameretneme, Cuz II.
- Ereb Şemo: Dimdim, Evrensel, 2005.
- Eyice, Semavî: “ Bir Fransız Gizli Ajanı Amédée joubert II, Türk Yurdu 256, İstanbul, Mayıs 1956, r. 831.
- Ezîzan, Herekol (Celadet Alî Bedirxan): “ Klasîkên Me, An Şahir û Edîben Me yên Kevin”, Kovara Hawar, j. 33, Çiriya Pêşin, Şam, 1941.
- Ezîzan, Herekol (Celadet Alî Bedirxan):” Siyabendê Silîvî”, Hawar j. 13, 1932.
- Findî, Reşîd: Pirtûka Adad û Rumetnameya Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bazîdî, Spîrêz, Çapa I, Hewlêr, 2006.
- Findî, Reşîd: Elî Teremaxî Yekemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e, Bexdad, 1985.
- Finn, Robert: Türk Romanı (İlk Dönem: 1872-1900), wer. Tomris Uyar, Cilt I, Ankara, 1984.
- Geverî, Ayhan: “Ji Koleksiyona Basile Nikitin Sê Çîrokên Kurdî”, 2009, Nûbihar 108, r. 37-41.
- Giw Mukriani: Zembilfiroş (Sepetçi), Hewler, 1967.
- Gökalp, Gonca: “ Osmanlı Dönemi Türk Romanının Başlangıcında Beş Eser”, Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi, Osmanlı’nın 700. yılı Özel Sayısı, Ekim, Ankara, 1999, r.185-202.

Güneş, Fatime, “Aile, Evlilik, Akrabalık ve Hane”, Aile Sosyolojisi, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 28-48.

Güney, Filiz: XIX Yüzyılın İlk Yarısında Osmanlı İnan İlişkileri ve İrana Giden Türk Elçileri, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Afyon Kocatepe Üniversitesi Afyonkarahisar, 2005, r.42-59.

Hasan-i Mir Âbidînî: İnan Öykü ve Romanının Yüz Yılı I. Nüsha Yayınları, Ankara, 2002.

Işın, Ekrem: “ Emin Nihat ve XIX.Yüzyılın Büyük Sorusu” Oluşum, j. 44, Haziran, 1981, r.13-22.

İbn Hanbel, Ehmed b. Muhammed (m. 241/885): İbn Hanbel, Ehmed b. Muhammed (m. 241/885), el-Musned, Beyrûd, 1969.

İbnî Mâce, Muhammed b. Yezîd el Kazwînî (M. 273- 886): İbnî Mâce, Muhammed b. Yezîd el Kazwînî (M. 273- 886):, Sunenü İbn Mace, İsa el-Babî el-Halebî ve Şûrekâuh, Mısır, Bêdfrok.

Jaba, Aleksander: Çirokên Kurmancî, Weşana Çanda Nûjen, Stocholm, 2000.

Jan Reyhman: Lêkolînavên Polonî yên Ziman û Folklorê Kurdan, Ji Rûpelên Nenaskirî yên Rojhilatnasya Polonî ya Sedsala Nozdehan, Wer.Sidqî Hîrorî, <http://www.kulturname.com/?p=749>, (14 Mijdar 2012).

Jaubert, Pierre- Amedee: Reise Durch Armenien und Persien, wer. Ji frensiwî: G.W. Becker, Industrie-Comptoir Leibzing, 1822.

Kanar, Mehmet: Çağdaş İnan Öyküleri, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 1999.

Kanar, Mehmet: Modern İnan ve Afgan Öyküleri Antolojisi, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1995.

Kaplan, Mehmet: Hikaye Tahlilleri, Dergah Yayınları, İstanbul, 2009.

Kerim, Mustafa Salih: Şehîdanî Qelay Dimdim, Suleymaniye, 1960.

Kılıç, Ali: <http://www.pen-kurd.org/kurdi/ali-kilic/bo-biranina-zanyare-nemir-prof-dr-qanate-kurdo.html> (21.02.2013).

Kudret, Cevdet: Türk Edebiyatında Hikaye ve Roman I:Varlık Yayınları, İstanbul,1979.

Kut, M. Ali: “ Mela Mehmûdê Bazîdî – Çil Çîrok û Aleksander Jaba” [http:// www.nefel.com/ articles/article_print.asp?ArticleNr=4430](http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=4430)(21.02.2013).

Külahlıoğlu, Ayşenur İslam: “Modern Türk Hikâyesinin Kısa Tarihi”,Türkler (Ansiklopedisi), Cilt 21. Ankara, Yeni Türkiye Yayınları, 2002.

Landav Jacob M.: Modern Arap Edebiyatı Tarihi, T.C. Kültür Bakanlığı Dünya Edebiyatı, Ankara, 2002.

Lerch, Peter: Recherches sur les Kurdes inaniens et sur leurs ancêtres, les Chaldeens septentrionaux, St. Petersburg 1856.

M. Said Ramazan el Bûtî 2001: M. Said Ramazan el Bûtî, Siyamend û Xecê, Kent Işıkları, Stenbol, 2011.

Makî, Tahir Ahmad: Al- Kişşa Al- Kasîra, Dâr Al- Macarif, Çapa 5., Kahire, 1988.

Malîk Ebû Ebdillah b. Enes, el-Muvetta: Malîk Ebû Ebdillah b. Enes, el-Muvetta, Darû İhyai't Tûrasil erebî, Beyrûd, Bêdîrok.

Malmisanlı, Mehmet (Malmisanij): “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine-II”, 1988, *Tarih ve Toplum*. sayı: 55, r. 58-63.

Mamoste Qedri: “ Eliyê Teremaxî û dîtinên wî yên li ser rêçikên rêzimana kurdî li gor pirtûka wî ya bi navê ‘Destûra Zimanê erebî bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî’”, BÎR, hejmar: Bihar 2005.

Mangaltepe, İsmail: Seyyahların Gözüyle Van (XIX. Yüzyıl), Kitabevi, İstanbul, 2009.

Mann, Oskar: Kurdische-Persische Forschungen. IV. Die Mundart der Mukri Kurden, G. Reimer Verlag: Berlin: I. 1906-1909.

Moran, Berna: Türk Romanına Eleştirel Bir Bakış I, İletişim Yayınları, 20. Baskı, İstanbul, 2008.

Muhemad-i İsti'lâmî: Bugünkü İran Edebiyatı Hakkında Bir İnceleme, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1981.

Muhemed Merdoxî: Tarîxa Kurd û Kurdistan, cild I.

Muhemmed Ebdulreuf el-Menâwî, Feyzulqedîr Şerhul- Câmîis- Sexîr: Muhemmed Ebdulreuf el-Menâwî, Feyzulqedîr Şerhul- Câmîis- Sexîr, Mektebetul Mustefa Muhemmed, Misir, 1938.

Nebez, Cemal: Lalo Kerîm, Hewlêr, 1956.

Ordîxanê Celîl: Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım, Awesta, 2001.

Özmen, Fevzi: “Pêşgotin” Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo lêkolîn û zanistî, Köln Hejmar 16-Payîz 2010, r. 5-24.

Pîrbal, Ferhad: Mela Mehmûdê Bazîdî 1799-1867 Yekemîn Çîroknûs û Pexşanûsî Kurd, Weşanxaneyê Aras, Hewlêr, 2000.

Prym, Eugenne û Albert Socin: Kurdische Sammlungen. Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tur Abdin und von Bohtan, St. Petersburg 1887-1890.

Qalembiy: Adige Xhibarxer Elbrus Txilhtedzap'e, Nalçık, 1978, wer. İbrahim Abaze, Kafdav Yayınları, Ankara, 2010.

Qanatê Kurdo: Tarîxa Edebiyata Kurdî, Weşanên Öz- Ge, Enqere, 1992.

- Qanatê Kurdo: Tarîxa Edebyeta Kurdî, cild 1, Stockholm, Weşanên Roja Nû, 1983.
- Resûl, Izeddîn Mustafa: Ara' fi'l- qissatil Kurdiyye, Al Aqlam, 19 (1984) 113.
- Sağnıç, Feqî Huseyn: Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002.
- Saîb, Cemîl: Di Xew De, Çapxana Awesta, Stenbol, 2002.
- Seccadî, Aladdin: Hemîşe Behar, Bexda, 1960.
- Shakely, Ferhat: Moden Kürt Öykü Sanatı, Avesta, İstanbul, 1998.
- Tanpınar, Ehmed Hamdi: “ Muhayyelat”, İslam Ansiklopedisi II, Milli Eğitim Yayınları, İstanbul 1949, 355-356.; XIX. Asır Türk Edebiyatı Tarihi, Çağlayan Yayınevi, İstanbul, 1985.
- Tanpınar, Ehmed Hamdi: Edebiyat Dersleri, Hazırlayan: Abdullah Vaman, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2004.
- Tek, Ayhan (Geverî), Mem û Zîn ve Hüsn ü Aşk Karşılaştırması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar, http://www.academia.edu/891642/Mem_u_Zin_ve_Husn_u_Ask_Karsilastirmasi_Baglaminda_Klasik_Kurt_ve_Turk_Edebiyatı_Uzerine_Notlar, (17.03.2013).
- Temo, Fuad: Çîrok, Rojî kurd, Çapa I: 1913, Hejmar I., Weşanên War, Stenbol, 2002.
- Temûrê Xelîl (Hamlet) Muradov: Jînenîgariya Temûrê Xelîl, <http://www.niviskar.com/node/601> (21.07.12).
- Uzun, Mehmet: Kürt Edebiyatına Giriş, İthaki, İstanbul, 2006.
- Vergilius: Aeneas, Latinceden Türkçeye Çeviri: İsmet Zekî Eyüboğlu, Payel Yayınları, İstanbul, 1995.
- Wikande, Stig: Berhevoka Kurdî, Koral j. 34, İstanbul, 1992.
- Xeznedar, Maruf: Destûrê Zimanê Erebî bi Kurdî: Eliyê Teremaxî, çapxana Daru'z-Zeman, Bexdad, 1971.
- Xeznedar, Maruf: Mêjûyî Edebî Kurdî, Çapa I., Dezgeyê çap û belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001.
- Yalçın, Hüseyin Cahit: Edebiyat Anıları, Haz: Rauf Mutluay, III Baskı, Türkiye İş Bankası Yayınları, İstanbul, 1999.
- Yaman, Raif: “Di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî Da File Misilman û Êzidî” <http://www.netkurd.com/?mod=author&option=view&Id=762>, (08. 05. 2011).
- Yazgan, İlhami: Eski Kürt Öyküleri, Belge Yayınları, İstanbul, 1996.
- Yazıcı, Hüseyin: Çağdaş Arap Öyküleri, Kaknüs Yayınları, İstanbul, 1999.

Yıldırım, İbrahim: Müşteki Aşklar Kitabı Müsameretname'nin Muharriri Emin Nihad Bey Kimdir?, Altıkitap Yayınları, 2003.

Yıldız, Musa: Nacib Mahfuz Hayatı ve Eserleri, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Gazi Üniversitesi, Ankara, 1992.

Yıldız, Musa: "Arap Edebiyatında İlk Modern Kısa Öykü: Muhammed Teymûr'un Fî'l-Kitâr'ı" Nusha, Yıl: II, Sayı 4, Kış, 2002.

Yusuf, Abdulreşîb: Şâîrên Klasîk ên Kurd, JN Weşanên Jîna Nû, Uppsala/Sweden, 1988.

Zagrosî, Aso: "Mela Mehmûdê Bazîdî" <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-mella-mehmude-beyazidi-1797-1870-50904238.html> (10.01.2012).

Zaza, Nûrettîn: Gulê, Hawar j. 29, Haziran 1941, r. 8-9.

Zebîhullâh-I Safâ: Dr. Zebîhullâh-ı Safâ, İran Edebiyatı Tarîhî, Cilt I., Nusha Yayınları, Ankara, 2002.

Zehebî: Muhammed Husên ez-Zehebî, et-Tefsîr vel-Mufesîrûn, Darul Erqan, Beyrûd, Bêdîrok.

Zernof-Veliaminof, V. (ed.): Scheref-nameh ou Histoire des Kourdes, par Scheref, prince de Bidlis, St. Petersburg: Eggers, 1860.